# *Zerdeştê kal*

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

.
.
.
.

*Zerdeştê kal*
Weşanên SORAN e
.
Berlin 2013
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-940997-09-8

. ZERDEŞTÊ KAL

Li azmana ku hata ku roj hebû, wê Ahûra Mazda jî li dunyê wê hebe. Li dunyê heta ku jîyan hebû, wê Aqilîya wî jî bijî. Ew mazinê wê gerdûnê ya. Bi aqilê wî hemû tişt di rê de dimeşê. Li dunyê, jîyane heya. Di jiyanê de mirov heya ku jîyanê dijî. Lê ne tenê mirov hena. Gelek ajal û sawal, benat û şênî, Senat û hênî hena. Hemû jî, di jîyanê de dijîn. Lê Ahûra Mazda, xwest û kifş kir ku li wê dunyê serwerîyek bi afirê û di rêya ku wî daye kifşkirin de bimeşê. Mirov, bi aqilê wî bûn. Wî aqil di serê mirov de bicih kir. Aqil, hiş a. Hiş beşa ji me û laşê me ya. beşa duyamin ya laşê me jî goşt û hastûyên laşê me na. Beşa sêyemin jî, gîyane me ya. Gîyan, sermed a. Nemir a. Ew, piştî ku mirov mirov, wê jê derkeve û xwe bijî. Laş, goşt û hastûyên wê, diçîna axê. Xwûn û av jî diçina avê. Bi wê yekê, her tişt li rastîya xwe divegerihê. Dema ku goşt û hastû bû ax, wê li axê û ankû li rastîya xwe vegerihê. Dema ku xwûn, herîkî wê çê û gihijê avê û li rastîya xwe vegerihê. Gîyan jî, li rastîya xwe digerihê. Berê wê li afrînerê wê ya. Gîyane herî mazin Ahûra Mazda ya. Ew li ser hemû gîyanen re ya. Hemû bi wî ve girêdayî na. Weke ku çawa ku dema ku li jîyane mirov bûn û piştre ji mirovan kom afirîn û piştre jî ji koman xalk afirîn û piştre jî ji xalkan gel afirîn. ..

Li jîyane, hemû jî di wê yekê de, di rastiyekê de dijî, hertişt, bi rastiyekê û li gor rastiyekê dijî. Zerdest, digot, ya qanc ku mirov hizir kir û gotin bi qancî got, êdî wê kirina qanc û baş wê ji wê biafirê û derkeve. Bi wê re jî, emê di rêya rast de bimeş in û herin. Ya ku wê me di jîyanê de bi ser bixe jî ev a. Li Jîyanê, piştî ku jîyan afirî, di wê de qancî jî û bi wê re xirabî jî afirî û pêşket. Herdû jî, bi hevdû ve girêdayî na. Lê herdû jî, bûyîna wan, ji bo wan sedemek heya. Ew jî, dema ku em li Ahûra Mazda li ´aqilê herî mazin´ ku binerîn, emê wê aliyê wê jîyanê ê qanc bibînin. Ew kurê Zerwan a. Lê Ahrîman jî kurê Zerwan a. Lê ew vajî Ahûra Mazda ye. Ew, Xirabî û neqancîya di jîyanê de diafirêne. Lê çendî ku ew neqancîyê diafirêne û pêşdixe jî, bi wê re em qancî û gîranî û mazinatîya qanciyê jî baştir û qanctir dibînin û fahm dikin. Qancî, bi vî rengî, hinekî jî, dema ku ya vajî wê hat dîtin û salixkirin, û ku hat dîtin ku ew çendî û çawa ya, wê hingî, ya beremberê wê jî, were dîtin. Hertişt, bi ya vajî xwe re heya. Ev jî, dûîtîya jîyanê diafirêne. Duîtîya jîyanê, wê tevger û livînê di jîyanê de bide afirandin. Bi wê re jî, wê bi wtevger û livînê re, wê pêketin û pêşveçûn di jîyanê de biafirê. Lê ku dem kengî jî

bê bila bibe, wê di nava wê tevgerî û livînê de tekoşîna wê ´qancî´ û ´xirabiyê´ wê bi hevdû re hebe û bidomê. Wê dawî lê neyê.

Duîtî, hinekî jî, bi Ahûra Mazda û Ahrîman re tên dîtin û ser ziman. Herdû jî, bira na ji hevdû re. Lê herdû jî, bi kirin û teybetmendiyên xwe re vajî hevdû na. Li dijî hevdû na. Tekoşîna wan jî, bi hevdû re heya. Ew tekoşîna wan, wê heta ku jîyan hebe wê bidomê. Lê hertimî jî, wê ahang(balans)ek di nava wan û wê têkoşîna wan ya bi hevdû re hebe. Wê, heta dawîya jîyanê wê ew ahange bidomê. Bi wê ahangekê re, wê ahangekê di jîyanê de jî biafirê. Lê bi tekoşîna wan re, wê tekoşîn di jîyanê de jî xwe bide domandin. Ew tekoşîna wan, wê hertimî, mînaqa wê, weke dîmenê wê yê dûyemin wê di jîyanê de xwe bide domandin di nava mirovan de jî. Lê di wê tekoşîna di nava Ahûra Mazda û Ahrîman de, ku kengî, alîyê xwe kifş bi aliyekî de wê hingî ew ahange wê xira bibe. Lê di baxtê wî de, wî bixwe kifşkiriya ku wê bi aliyê Ahûra Mazda de wê aliyê xwe bide kifşkirin. Bi wê re jî, wê êdî wê ew bi serbikeve. Ahûra Mazda, Roj, bi wî heya. Agir, pîroz a. Têkiliyê bi wî re didêne. Têkiliya di nava wî û mirovan de, bi rêya agir re ya. Agir, rêya têkildanîna di nava Ahûra Mazda û Xwûdanan û mirovan de ya. Ji ber vê yekê jî, pîroz a. Agir û ankû "tar"(ku bahse agirê pirr gûrr dike), ti tişt nikarê xwe li ber wê bigrê. Agir bişawat a.

Zerwan, ku dem hat ku wê aliyê kifş bike, wê berî hingî wê gelek tişt biqawimin û biafir in. Wê hingî, piştre jî, wê dunya bê, cihê qanciyê yê. Aşîtî wê li dunyê(telûs), wê serdest bê. Dunya û jîyan, ji şeş gavan pêk tê. Gava pêşî ya ku wê di wê de qancî û xirabî bi hevdû re di wê de biafirin a. Gava dûyem, a ku wê dunya li reşî û tarî´yê de bimêne ya. Gava sêyem; a ku wê qancî û xirabî bi hevdû re dikevina tekoşînê de ya. Gava Çaremin, a ku wê di wê tekoşîna di nava qancî û xirabîyê de ku wê qancî bi serkeve û serkevtinê qizinc bike ya. Gava pêncem, ew a ku piştî wê serkevtina qanciyê re ku wê dunya êdî bê cihê aramî û aşîtîyê û bi buhişta Ahûra Mazda re bê yek ard a. Di gava dawiyê de jî, wê dunya êdî ji wê bi tememî ne qancî û xirabê ji wê winda bibe û wê aşîtî û bi hev re bûn wê biafirê. Ev gava dawiyê ku di wê de bi hev re bûn diafirê, ew bi hev re bûn bi nav û gotina "‘Astuat-erata’" dihê ser ziman.

Lê ev pêvajoya pêvajoyên ku dihên jîyîn wê di ancama tekoşînaka mazin ya di nava qancî û xirabiyê de wê were û bibe. Piştî ku Zerwan, aliyê kifşkir, wê piştî wê re, wê hingî, jinek bi wê xweşîkatî û bedewîya xwe herê û xwe di gola ´qansava´ de xwe bişoyê û wê ji wê şiştan wê êdî wê ‘Saoşyant’ ji wê bibe. Her ‘Saoşyant’, pêxemberek a ku demekê bi

xwe re dide dest pêkirin. Yê pêşî, destpêkekê bi jîyanê re pêşî dihêne. Yê duyemin aqil û rastiyê dihêne. Yê sêyemin jî, wa dişopêne û pêxemberîya wan difahmêne û diolêne(dike ol). 'Saoşyant'ê pêşî Mahabad´ a. Wî, piştî ku tûfan li jîyanê bû, wî ji nû ve destpêk da destpê kirin. Piştî wî re 'Saoşyant'ê duyem jî, Hoşeng a. Ew jî, destpêka aqil, hiş û ol a. Yê sêyem jî, Zerdeştê Aspantaman´ a. ..

----- ----

Zerdeşt, di wê demê de, hê ku zaroya, destpêkeka wî ya mazin heya li Jîyanê heya. Bavê wî Poruşaşpa, aligirê ola Mîtra ya. Ew yekî pirr mazin bi bandûr bûya. Hertimî, ew li pêş bûya. De ne, li gorî kevneşopîya wan, mirovê pîr û kal, hertimî gotina wan, li pêş a û ti gotin li ber gotina wan jî nayê gotin. Bavê Zerdeşt Porûşaşpa jî, yekî wûsa bûya. Bandûra wî, tê gotin ku weke ya Mîtra Mazin hebûya. Gotina wî mazin hebûya. Hiş û zanîna di serê wî de pirr bûya. Bi wê jî, bawerî û ewlatiya li gotina wî mazin bûya. Ew, di nava rêmildaran de jî, weke oldarekî mazin ku hertimî serî lê dihat dayîn û gotina wî bi şêwîrîn dihat pirr pirsîn bû.
Xatûna wî Dugdova(daxo) jî, jinaka ku heta ku tu bêje xweşîk û sipahî bû. Ew navê wê jî Bêrîwanê jî ya. Piştî ku Zerdeşt ji wê re bûbû, wê hemû dema xwe ji wî re vaqatandibû û bi wî re dibuhurand. Zerdeşt, hê ku piçûk bû, dayika wî, ji wî re bûya weke mamosteyeka mazin jî. Wî, temenê xwe yê mazin ê bingihîn ji wê girtîya û bi wê re mazin bûya. Heta ku Zerdeşt tê û digihijê dem û serdema xwe ya heftsalîya xwe piştî bûyîna xwe re, wê tevî wê piçûkatî û zaroktîya xwe jî, hema bêja weke yekî mazin wî karîya aqiltiyekê bide nîşandin. Wî aqilê xwe, di wê demê de jî mazin kiriya.

Dugdova, weke jinaka hemû sipahî û hem jî bizane û biaqil, divê ku mirov bahse wê bike. De ne, divê ku mirov bibêje ji xweşikatîya jinê re gotina ´sipahî´ dihat bikarhanîn. Lê ji bo xweşikatîya mêr jî gotinaka ´levhatî´ û xweşik dihat bikarhanîn. Dugdova, dema ku pova serê xwe şe dikir, hingî, heta noqa xwe dihanî û gurr dikir. Pova jî dirêj bû. Povaka wê ya pirr xweşik û sipahî hebû. Di dema ku dimeşî, ew pova wê ya ku dirêj û gurr ku li ber ba dide, dikir ku hey û heyîdarîya herkesekê herê ser wê. Ew jinaka wusa xweşîk û şipahî bû. Dema ku li wê xweşîkatîya wê xweşikatîya wê girbûn û dirîjbûna wê dihat nerin, xweşikatîya li berçav diket. De ne, jin, ji du aliyên wê ve pîrozîyeka wê heya. Yek mûyên pova wê û ya jî, xweşîkatîya wê. Jin û mêr weke hevdûna û xwûdê ew weke hevdû bi hevdû re ku bi hevdû re bibina heval û rêheval afirandina. Yek, ne li ser ya din re hebû. Ji ber ku erdû xwûdê, çêkiribûn. Bi wê yekê, mêr

çawa dikarî tevbigerîya, jinê jî dikarî weke wî tebigerîya û biçûya herderî weke wî. Jin û mîr, bi hevdû re li ba û hevdû dirûniştin û berg dikirin.

Dema ku Poruşaşpa, dihat li parastgehê dirûnişt û dhizirî û ya di aqilê xwe de dihanî ser ziman, pirr caran dugdova jî li cem wî bû û bi hevdû re dihanîn ser ziman. Kurkê wan ê piçûk Zerdeşt jî li cem wan bû. Carna di nava wan herdûyan de dihat rûnandin û wî jî bi wan re dihisand û carna jî li ser dawa dayika xwe dihat rûnandin û bi wî rengî wî jî dihisand. Zaroyekî weke Zerdeşt, ku hê wusa piçûk û zaro ku demeka dirêj bi wî rengî di cihê xwe de rûniştiba û li mirovên ku diaxiftin ku bihsanda, pirr asayî jî ne dihat dîtin. Ew kirina Zerdeşt ya bi dê û bavê wî re, pirr jî asayî ne dihat dîtin. Ji ber vê yekê, pirr bale mirovên li dora wan jî dikişand. Zarok, an li derve bi hevdû re lîstik di leyistin û yan jî li malê diman û xwarin dixwarin. Lê wî, re ne dikir. Ew, dihizirî. Yekî piçûk di wê temenê de, hizirkirina wê, ma wê çi jê derketiba? Zaroyek, di wê temenê xwe de çî dikarî bihizirê? Ev pirs, weke pirseke ku di dema ku lê dihat nerin de di serê mirov de diafirî.

Zerdeşt, di wê demê de, bi wê rengê wê balekê pirr bi hey bikişêne li ser xwe. Piştî wê re jî, ku demek li ser wî re di buhurt û hinekî din jî mazin bû, êdî hin bi hin gotin ji devê wî derdikevin. Gotinên bi aqil û hiş ji devê wî ji nava lêvên wî derdikevin. Her gotina ku wî bilêv dikir jî, ji ya yekî mazin ne kêm bizanetir bû. Pirsna wusa dupirsîn di wê dema xwe de ya piçûkatiyê de, dikir ku mirov hayîrmayî bimêne. Zaroyekî wusa piçûk û ku hê zaroya, çawa dikarê hizir bike ku pirsên wusa bike ku bale mazinên xwe bikişêne li ser xwe. Lê Zerdeşt ew dikir. Zerdeşt dikir ku bale herkesekî herê li ser wî.

Bi wê yekê û rengê, Zerdeşt, wê di wan salên xwe yên zaroktiyê de, wê bê mirovekî ku li berçav bi heya ku li ser wî ya. Zerdeşt, ma çawa bê ku mirov wî bêne ser ziman. Di wê demê de, bi rastî jî, gotinên ku zaroyên di temenê wî de ku bi wan ew dihatin ser ziman, Zerdeşt ne dihanîn ser ziman. Ew gotin, ji bo fahmkirina Zerdeşt û bi wan hanîna li ser ziman Zerdeşt, wê têr nekiriban. Ji ber vê yekê, divê ku mirov bibêje ku Zerdeşt divê ku mirov gotinên teybet bêne ser ziman bo ku wî bêne ser ziman.

Dayika wî Dugdova jî, jinaka ku bi sipahîbûn û xweşikbûna xwe re li berçav bû û ti xweşikatî ne dibû weke ya wê. Ew jina wusa xweşik, bale herkesekê li ser wê bû. Dugdova, bi axiftin û gotin gotina xwe jî, navê wê hebû. Zanîna wê, ne bin ya ti kesekî re bû. Ew jî, bi zanînaka mazin ya di serê xwe de bû.

Te digot ku qay wê jinê xwe di nava gola Qansavê de xwe şîştîya. Wilqasî, xweşîk bû û sîpahî bû. Di wê demê de gelek gotinên bi wî rengî ji bo wê hatina gotin jî hena di nava xalkê de. Hatîya gotin ku ´wê jina sipahî û xweşik, ti dibe qay wê xwe di gola qansavê de şîştîya." De ne, gola qansavê, pîroz a. Ava wê jî, tê bawer kirin ku ji bihûştê diharikê. Bi wê re jî, ew gol, ava wê, ti carî, ne kêm dibe û ne jî zêde dibe. Ti kesek jî, nikarê wê bilawitêne. Ew hertimî paqij û sipahî dimênêt.

Ava qansavê, mirov hem xweşik dike û hem jî pîroz dike. Bo vê yekê jî, bawerîyeka mazin ji wê avê heya. Li ser wê avê jî, pirr vegotin hena. Li ser afirîna wê û derketina wê ya ji bihûştê jî vegotin hena. Di nava xalkê de jî, ew vegotin hertimê li ser lêv in û bilêv in.

De ne, tê gotin ku her serê sê hezar salî, wê jinek xwe di wê ava qansavê de bişoyê û wê bi haml bibe. Bi wê re jî, wê zaroyek ji wê re çê bibe. Ew zaro, wê pêxemberek bê û wê pişt wî bixwe re jî gelek pêxember werin ku di xate wî de. Di wê demê de, navê **Mahabad û hoşeng**, hebû. Ev herdû, hatibûbûn û çûbû bûn. Piştî wan re jî, gelek pêxemberên ku hatibûbûn û çûbûbûn hebûn. Pêxember, gotinaka ku ji kurdî ya û temenê wê ji ´peyam´ û ´ber´ diafirêne ya. ´Yê ku wê peyamê bênê´ bahse wî dike. ..

"Xweşikatîyeka bi xwe re hem qanciyê jî têne û hem jî xirabiyê jî dikarê werêne". Bi du alîyan jî, xweşîkatî dikarê weyn bileyizê. Medî, di wê demê de bi rêmildarên xwe ve jî ev hizir û têgihiştin di serê wan de hebûya. Ya rastî, bi vê gotinê, ne tenê hişek û zanînek, her wusa bawerîyek jî hebû. Ew bawerî, dibîra herkesekî de jî bû. Xweşikatîya Dugdova, wê bike ku ev nîqaş û bawerî, hin bi hin di serê mirovan de pirr zêde bibîr bibin û werina hizirkirin. Ev jî, wê êdî bi xweşikatîya wê re, êdî giringiyeka bi bawerî wê ji wê re di jîyane wê de bêne.

Dem, ku hin bi hin di buhurê, êdî hin bi hin, wê hizirkirinên û zanîn û hişên ku bi hizirkirinan di serê mirovan de diafir in, wê zêdetir bibin. Wê, bi wan hizirkirin, zanîn û hişan re, hem bawerî û pîrozîyekê bi wê baxş bikin û hem jî wê êdî hin bi hin, hizirkirin bi ka wê çi bikin. Di serê rêmildaran de, hizrên wusa êdî diafirin ku mirov hayîrmayî dihêlin. ..

Poruşaşpa, bavê Zerdeşt, di wê demê de, ew jî, weke yekî zane û ku bawerîya li wî û li hişê wî pirr mazin heya û ew jî, gelek çav li ser wî na. Lê ew, ti gotinên bi bîryarî ji devê xwe dernexê. Ew, her gotina ku dihê gotin û ew dibihîzê, pêşî dike serê xwe de û demên dirêj li ser wê dihizirê. Ew bawermendekî Mîtra ku biqasî Mîtra bawerî lê heya û bandûra wî heya. Li Cihê ku Mîtra lê Rûniştîya, ew nûha lê rûniştîya.

Vêca, li gorî vê, dema ku mirov dihizirê, êdî mirov tê digihijê ku ew çendî mazin û bi zanîn û astbilind a. Ew, di nava rêmildar û bawermende û aqilmendan de jî, ew yekî li pêş a.

Poruşaşpa, mirovekî ku bi aqil bû. Ew, weke mirovekî ku diasta peyamnêrekî mazin ku peyam ji xwûdan digirt û digihand mirovan mirov dihat dîtin. Ew, bawermendekî Mîtra ê ji dil û dilzelal bû. Bi dilê xwe, wî pirr xweşik dixwest û dihizirî. De ne, ku bahse dil û zanînê hat kiribi hevdû re, wê gotina ´wijdan´ di cih de werê bîra mirov. Wijdan, weke rengê aqilê mirov ku nebê nabê dihat dîtin. Bi wê rengê jî, hizirkirin, ya ku ji dil û rast dihat dîtin. Poruşaşpa, yekî ku bi aqil û wusa mazin dihizirî bû.

Roj li dûv hevdû yek bi yek dihat û diçû. Her roja ku dihat û diçû jî, tiştek bi xwe re dihanî û dikira serê mirovan de. Ew jî hiş bû. Hiş diafirî û pêş diket. Hiş, weke aliyekî laşê mirov a. Ji sê beşên laşê mirov, beşek ji wê jî hiş a. Yên din, yek goşt û hastûyên laşê me na û ya sêyem jî, ya gîyane me ya.

De ne, li vir, divê ku em bibêjin ku gîyane û hiş, weke du aliyên ji hevdû cuda divêt ku li vir em bi têgihiştin bikin û bênina ser ziman. Li gorî Porusşaşpa û wî aqilê ku wî di serê kurê xwe Zerdeşt jî bi cih kiriya, gîyan bixwe jî dikarê hiş di xwe de pêş bixe. Lê di aslê xwe de, ya ku hiş di xwe de mayînda bike gîyan a. Lê wekî din, hiş ne mayînda ya. Mirov mir û laşê mirov mir, wê hiş jî ji holê winda bibe.

Bi wê re, di çerçoveya vê bawerîyê de ev dibû. Dihat bawerkirin ku "hertişt, li rastî û aslê xwe divegerihê." Yanî ku çiqasî dûr û kûr herê jî, wê dîsa li aslê xwe vegerihê. Di laş de goşt û hastû hebû, ew jî, dema ku mirov mir, wê li aslê xwe û rastîya xwe vegerihê û herê axê û bibe ax. Xwûn jî, wê li aslê xwe vegerihê. Ew jî, wê herê avê. Deng û bêhn jî, wê li heawayê û ba vegerihin. Ji ber ku ew jî, ji wê na. Deng û têhn(tîn), dema ku laşê mirov şax e, ew jî hena. Lê ku laşê mirov mir, wê ew jî, herina hewayê. bi vê yekê, her tiştek ku li jîyane heya û afirîya, wê di dawîya jîyane xwe de ji wê rastî û aslê ku jê afirîya wê herê û bigihijê wê. Her tişt, li rastîya xwe divegerihê.

Poruşaşpa, ev yek dizanî. Ew, di serê xwe de, dem bi dem kêlîkên dirêj dihzirî û gelek hizir û zanîn mazin hiş dikir. Piştre jî, hertimî ew hişkirinên wî dibîra wî de diman. Wî, ji bîr nedikir. Ew xwediyê xêv û hişmendiyeka pirr xort bû.

Weke wî, her civate ku ew lê dirûnişt ji jin û mêrên ku li dora wî li hevdû û bi hevdû re rûniştibûn, wî ji wan re dihanî ser ziman. Çi di serê

xwe de, ew gihiştibûbûyê de, wî ji wan re dihanî ser ziman. Di civatên wan de, jin û mêr, ti farq û cudabûn di nava wan de tûna bû. Bi hevdû re yekbûn û heval bûn. Bo vê yekê, bêdestûr, dugdova dîya Zerdeşt jî, li wan civatan gotinên xwe yên zane gotina. Dayika Sînê, Aqilekî mazin kiribû serê wê de. Mirovê pîroz, Gotina wan û rêz û hûrmet li wan, ti carî li ser gotin ne dihat gotin. Jina pîr, gotina wê mazin bû. Mêrê pîr gotina wî mazin bû. Herdû jî, bi hevdû re, di nava civatê de mazin bûn. ..

Zerdeşt, di wê demê de hê zaro bû. Lê aqilekî wî yê mazin hebû. Gotineka xalkê hebû. Ew jî weha bû. Dihat gotin ku "mirov di hêka xwe de kifş a." Ew jî, yekî wusa bû. Wî, rastî baş fahm dikir. Zû fahm dikir. Bo vê yekê jî, bal diçûna ser wî. Lê Zerdeşt, tevî ku di nava civate de, hê piçûk bû, dem bi dem bi wê piçûkatiya xwe re, di nava civate ku dê û bavê wî lê rûniştîna û gotin dibêjin de, ew jî rûniştîya û ji wî gotin hatîya pirsin. Dema ku ji wî gotin hatîya pirsin jî, ji wî hatîya hêvî kirin ku ew bersiveka zaroyên di wê temenê de bide. Lê wî, ew bersiva zaroyên di wê temenê de nedaye û bersiva mazinan daye mirovên li hewîdora xwe.

Rojekê, ku di wê temenê xwe yê piçûk de bû, li nava dayika xwe û bavê xwe rûniştîya û gelek mirov li dora wan rûniştîna û diaxivin bi hevdû re. Bavê wî û dîya wî jî bi wan re diaxivê. Ew jî, dema ku gotin hat û gihişt wan, wan jî gotina xwe digot. Hingî, rêmildarekî pirr mazin û kal bû, li ber bavê wî, ji wî zaroyê piçûk pirsî ku ma tu çawa dunyê dibîne. Hingî ne wî û ne jî dê û bavê wî û ne jî mirovên li dora wî ku li bendê bûn, wî bersivek mazin da wan ku ti carî ew bersiva wî êdî ne hat ji bîr kirin. Hingî, li ber wê pirsa ku tu dunya çawa dibînê, wê bersiva û got ku "dunya weke hêkekê ya. Zerika hêkê ard a. Sipîka hêkê jî hewa ya. Qalika hêkê jî, mirtalê parastina wê ya." Ji vê pirsa, ku herkesekê li dora xwe acêpmayî hişt û piştre, baleka herkesekî bi carekê çû bi ser wî de. Deng û his, di wê demê de ji ti kesekê li wir derneket. Piştre rêmildar, li dûv pirsa xwe ya ku kirî pirsaka din jî kir û pirsî ku "ma Stêrk jî weke dunyê na?". Zerdeşt, bersiva wî ji vê pirsê re jî hebû û weha bersiva rêmildar, bav û dîya xwe û mirovên li dora xwe.

"Rast e, ew jî, weke dûnya me na. Lê ew, weke xwûdayê ku me çê kiriya ew jî çê kiriya. Temenekî wan jî heya û ku ew dijîn. Weke ku çawa dema ku em mirov mirin, emê çina axê û bina ax û hastûyên me jî wê bina ax, wê stêrk jî wusa bin. Lê her mirinek wê bê sedemek yeke din. Piştî her stêrê re wê stêreka din jî bibe. ..."

Ev bersiva Zerdeşt, wî bi tememî kira çavê herkesekî de. Ew, yekî ku êdî ji hişan ne diçû bû. Wusa lê hatibû. Piştî wê bersivê re jî, êdî li dûv

wê pirsaka din li ser gerdûn(feza)ê hat pirsîn ji wî. Dema ku bahse gerdûnê ji wî hat kirin, Zerdeşt, weha bersiv da; "Gerdûn, ji du hêzan ku dayimî bi hevdû re di tekoşînê de û bi hevdû re li dijî hevdû disekin in hena. Lê pergaleka wê jî heya ku ew bi wê re dijîn. Tevlîhevî, ku heya jî, pergala ku wê tevlî hevlîheviyê rast dike jî heya. Lê ew tekoşîna di nava wan herdû hêzan de, wê rast kirinê bi demê re dide kirin. Ji ber ku ew tekoşîn, afrînerîya wê ya bo wê re heya. Ew tekoşîna di nava Sipanta Maînyu û Angra maînyu de, wê gerdûnê jî bi awa û şekl bikin. Bi wê re Sipanta maînyu û ankû Ahûra Mazda, laşê wê gerdûnê wê biafirêne û wê hemû tişt, lebat, zîndî, ajal û sawal, gerwêrk û stêrk û hwd, hemû tişt wê jê biafir in." Bi wê rengê Zerdeşt bersivek da. Bersiva ku Zerdeşt a ku wî da, weke ku ti kesek di wê demê de ne li bendê bû. Gelek ji mirovên li dora wî, ji wan re zor hat ku gotinên Zerdeşt ên ku wî bi hevdû re hanîna ser ziman fahm bikin.

Zerdeşt, hingî, bahse çi kir û çi û çawa hanî ser ziman, weke ku ji aliyê gelekan ve jî ne hatibû fahm kirin. Hinekî jî, ew bêdengîya ku bi wan re di wê kêlîkê de afirî, ev jî bi wan re dide li rû. Bavê Zerdeşt jî, hem heya wî pirr li ser kurê wî bû û hem jî, li dora xwe dinerî. Bavê Zerdeşt, mirovekî bi zane bû. Wî, dema ku li mirovekî dinerî, hê ku wî mirovî gotina xwe ne digotî, wê çawa bigota û bihanîya ser ziman, weke ku ji rûdêna wî dixwand. Ew, yekî wusa bû. Li rûyê mirovan dinerî û ew nas dikir. Li Tevgerîya wan dinerî û ew nas dikir. Ew yekî wusa bû.

Bavê Zerdeşt, di wê demê ne dizanî ku wê çi bikira û bigota. Bi rastî, ew mirovê bi zane weke wan mirovên li dora xwe li ber gotinên kurê xwe bêdeng mabû bû. Ahûra Mazda mazinatî û zanîn jî bû. Wî zanîn jî dide mirov û dikira serê mirov de. Bavê wî, hizraka bi vî rengî, di wê demê de, di serê wî de weke ku şaq dabê li navê çavên mirovên li dora xwe û li yên kurê xwe û jina xwe nerî. Lê wî ew gotina xwe ne got. Gotina xwe bi xwe re hişt. Lê ew di rewşeka wusa de ma, ku herkesekê li dorê dît û fahm kir ku weke ku tiştek di serê wî de hebû. Wan jî, ew fahm kir.

Zerdeşt, ne zaroyekî ji rêzê bû. Di nava zaroyên di temenî wî de ne dileyist. Ew, di nava mazinan de dirûnişt û li wan dihisand. Gotinên ku di nava wan de di civatên wan de dihatina axiftin ku Zerdeşt dihîstin, di cih de wî ew di serê xwe de di girt. Xêveka wî ya xort hebû. Ku çarekê tiştek didît û dibihîst û ankû his dikir, êdî wî ew jibîr nedikir. Wî, ew bi xwe re di serê xwe de qayd dikir.

Zerdeşt, gavên ji temenê xwe maztir diavêt. Gotinên ji yên ku di temenê wî de na, ji wan maztir digot. Ew, yekî ku cuda bû. Ew cûdabûna

wî, ne zaroyên di temenî wî de, mazinên ku di temenê bavê wî de farq dikir.

Bi vî rengî, derketina wî ya li pêş, wê bandûra wî li dora wî bike. Dayika wî bixwe jî, heya wê hertimî li ser kurê wê bû. Dayika wî, jinaka ku wusa xweşik bû ku mirov guneh dikir ku lê bineriya.

Dayika Zerdeşt, jineka pov dirêj bû. Çav kilî bû. Gerdanî(gerwanî)yaka mazin hertimî ku xamilandî di sûkra wê de bû. Li ser gûzekên lingê wê xalekên ku wê çêkiribûn bi xaml bûn hebûn. Guhar di guhê wê de hebû. Pova wê, li noqa wê disekinê û di buhurt jî.

De ne, divê ku mirov li vir, vê jî bibêjê ku ji mûyên serê jinê re hertimî "pov" tê gotin. Gotina ´pov´ê, têgihiştin û kirdeya dirêjbûnê jî di xwe de di hawêne. Dema ku em bahse poveka dirêj bikin, emê gotina pov bikar bênin. Gotina ´pov,´, hinekî jî ji ber ku dirêjîya povê heya ev gotin tê bikarhanîn. Lê ku pov hat qûsandin û hat kortkirin, hingî jî wê jê re newê gotin pov. Wê jê re were gotin "por". Por, bahse mûyên serî ku kin dike.

Dayika Zerdeşt Dugdova, jinaka pirr xweşik û sipahî bû. Di nava civatê de bahse xweşikatîya wê dihat kirin. Te digot ku qay wê xwe di ava Qansavê de şiştîya. Ava qansavê, avaka pîroz bû. Ew av, avaka ku ji bihuştê diharikê li dunyê bû. Jinên ku bi zaroyên wan çênedibûn ku diketina wê avê de êdî bi haml diman û zaroyên wan çê dibûn. Jin û mêrên ku nexweşîyên wan heban ku diketinê de, wê baş bûban. Kî çi derdê wan heba, dema ku ew ketina wê avê de, wê derman ji derdê wan re bûba. Ew avaka wusa ya qanc û pîroz dihat dîtin. Di xewnê de dîtina wê jî, bi qancî dihat şîrove kirin.

Dugdova, ew demek bû ku bûbû jinaka ku li ser wê dihat axiftin. Ya rastî, ew bû ku divê ku mirov bibêje ku ew di dema ciwanîya xwe de jî wusa bû. Bi xweşikatîya xwe, hertimî ji xwe da bahskirin. Piştî ku balix bû û jineka wusa xweşik jê derket, piştre jî, bi heman rengî ew bahskirin ji wê bû.

Piştî ku mirov di serê xwe de bi zanîn û têgihiştin bû û hişê mirov pêşket, êdî du tişt bi teybetî hertimî di roja mirov de ku li ser diaxivê bûn. Yek xweşîkatî û ya din jî zanîn û têgihiştina wê û bi demê re afirandinên wê ên ku bûn êdî bûn. Xweşikatî, hertimî ast û radayaka zanîn û têgihiştinê jî, bi xwe re dihawêne. Dema ku em bahse xweşikatîyê dikin, ma gelo em di farqê de na ku em bahse hişekî bizanînî jî ku em ketina farqê de jî dikin? Xweşikatî û têgihiştin, têgihiştin û zanîn, zanîn û hiş, li dûv hevdû û bi hevdû re mirov dikarê wan fahm bike. Lê her yekê ku

zanîn û ankû têgihiştin jî bê, weke dîmenekî dikarê xwe hertimî serwer bike.

Aqil, weke Zerdeşt, di têgihiştina xwe de kir ku çeçroveya wê bibêje, hişê hewirdor, tişt, xweza û hwd, a dora me ya. Bi hevdû re, divê ku mirov wan fahm bike. hertiştî ji xwezeyê dest pê kir bi aqil. Dema ku her tişt weke ku Zerdeşt di farqê û têgihiştina wê de ku digot ku "hertişt li rastîya xwe divegerihê", hingî, divê ku mirov xwezayê baş fahm bike. Li vir, gotina ".. li rastîyê vegerînê", gotina "rast(res)iyê" a têde, di wate "kok", "şûnpê", "rastî" û "rastteqîniyê" de ya. Bi wê re, em dikarin ku bibêjin ku di wateya ku Zerdeşt bikar dihêne de, hinek wate û kirde´yên din jî bi ser ve bikin.

Xweşikatî û aqil, du gotinên ku em car bi car divê ku bi teybetî li ser wan bisekin in. Lê dema ku em bi hevdû re li ser bisekinin, ku ji aliyê xweşikatiyê ve mirov lê binerê, em ji wê herina têgihiştin û zanîna xweşikatîyê. Lê ku em ji gotina aqil pêde herin, em divê ku bibêjin ku ew aqilê ku me girtî ku koka wê çi ya û ji çi û çawa ya, wê ew çerçoveyekê bide me. Bi wê re jî, emê karibin êdî xwe bigihênina wê çerçoveya wê xweşîkatîyê. Xweşikatî, di destpêkê de hişkirin a. Piştre ku ew hişkirin bû, êdî piştre zanîn ku têgihiştina wê ya. Piştre jî, êdî aqil a. ..

Di jîyanê de li lêgerîna li xweşikatiyê a bi aqil, bûya. Çîroka pêşketina aqil, ku em di çerçoveya kirde, wate û her wusa navaroka gotina zanîn û têgihiştinê de hildina li dest, em divê ku bibêjin ku li wê lêgerîn a. Ya baş û ya qanc çî ya li wê lêgerîn a. Aqil û zanîna wê, hinekî jî, hewldane xwe gihandina ya xweşik û ya qanc a. Dema ku em bahse gotina ´qanc´ dikin, em dizanîn ku weke Zerdeşt gotiya, pêşî em xwe digihênina tiştekî û wê fahm dikin, piştre jî, em rengê wê dibînin bi gotina qanciyê û ankû xirabiyê û hwd. Her wusa, têgihiştina qanciyê, hinekî, piştî bûyîna aqil û zanîn û têgihiştinê re ya. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî, li vir kifş bike. ..

Aqil, çerçoveya zanîna wê, divê ku mirov pêşî li wê bihizirê. Zerdeşt li wê hizirî ya. Ew jî, wê bi gotina "hiş" hanîya ser ziman. Ji ber vê yekê wê mirov kirîya şê beş û beşek ji wan jê beşan jî ´hiş´ a. Mirov laşê mirov ji goşt û hastû ya. Gîyane mirov jî heya. Ew jî, bi bêhn(tîn) heya. Tîn, di kurdîya î ro de jî, tê wateya "têhnê, bêhnê, dînê û ankû heyînê û hwd. Ev gotina "tîn" ya Zerdeşt a ku wî xwestîya ku bi wê gîyanê bixwe jî bêne ser ziman. Zerdeşt dibêje ku "dema ku mirov mir, wê êdî bêhn nestêne." Ev jî, tê wê wateyê ku êdî gîyane wî jê çûya. Li gorî Zerdeşt, nîşanaka heyîna gîyane, bêhn(tîn) standin a.

Rastîya jîyane, dema ku em lê bihzir in, divê ku mirov fahm bike ku di çerçoveya wê heyîna gerdûnî de xwediyê wateyekê ya. Di jîyane de nîşanakên gerdûnî û heyînîya wê heya. ..

Li vir, gotina "rastîyê", "rastteqînîyê" û "heyînê", Zerdeşt bi hevdû re di temenekî ku dikarê wate û kirdeya wan li hevdû bike û ankû bi hevdû re û bi hevdû ve bêne ser ziman a. Wan jev dûr nayêne ser ziman. Rastteqînî û jîyanê jî, mirov divê ku di vê çerçoveyê de lê bihizirê û hewl bide ku wê fahm bike. Rasttqînî, xaleka ku destûra pêşî bi kifşkirineka pêşî re ku li ser wê hatîya çê kirin a.

Zerdeşt, di van waran de, hê di dema xwe ya zaroktiyê de digihijê têgihiştinekê. Hizra, Zerdeşt, ya "dunya weke hêkekê ya", çend ku gelek rêmildarên ku ji wê re nedigotin na û herê dikirin û hebûn jî lê divê ku mirov bibêje ku yên ku jê re ne digotin herê jî hebûn. Ji demên Gûtî, hûtî û Mîtannîyan ve jî, û berî wan jî bi hezaran salan hatîya têgihiştin kirin û pê bawer kirin ku "dunya weke tepsîyekê rast a, ku mirov dikarê êdî li ser bijî". Yanî dihat bawer kirin ku dunya ne gilover a. Dema ku bihata gotin ku dunya gilover a, wê bihata gotin û bi bersivkirin ku wê çaxê mirov wê nikaribê li ser bijî. Ji ber ku mirov wê bixişiqê û bike valahîya fezeyê de. Bi wê re jî, bi bawerî hebû ku hemû dunya û stêr, bi "tayê xwe ve dalaqandî na." Di vê temenê de dihat gotin. Lê di dema Hûrî mîtannîyan de, hizirna de pêşketibûn. Lê divê ku mirov bibêje ku berê wan jî ev hebû. Minaq, "ga´ di nava bawerîyê de pîroz û weke dagerîya hêzbûnê jî hatîya dîtin û şîrove kirin." Car bi car, hatîya gotin ku "dunya li ser herdû stirh(qiloç)ên ga di ahangekê de sekinî ya."

Divê temenê de divê ku mirov bibêje ku Zerdeşt, ev rastî hemû dizanîn. Lê Zerdeşt ji kûderê gihiştibû wê zanîna di serê xwe de ya bi navê ku "dûnya weke hêkekê gilovar a?" Zerdeşt, dema ku ew pirs, jê hatibûkirin û wî ew berisv dabûbûyê de, hingî jî, wî ev bersiv dabûbû. Lê ew bersiva wî, di serê hemû mirovên ku li dora wî ku lê hisandibûn de cihgirtibû û ti kesekî jî ti bersiv nedabûbûyê de. ..

Zerdeşt, piştî ku di wê demê de bi dê û bavê xwe re li civatê ma û demeka dirêj axiftin li wir li civate wan di nava zane û pîr û aqilmendên li wir de bûbû û piştre, êdî ew karkiribûn ku rabin û herin. Ma wê çûbûban kûderê? wê Çûban Malê. Li malê wan jî, rayixistineka pirr xweşik hebû. Xamilandina malê, weke kevneşopîyeka ku ti carî li ser ne dihat nîqaşkirin jî bû.

Di wê demê de, piştî ku civate wan bi dawî bû bû û piştî ku hatibûbûna malê, dîya Zerdeşt Dugdova pirr bihizir bû. Ew hizirîya wê, dikir ku

carna heya wê bi tememî ji dunya ku ew lê dijî ji wê herê. Lê ka ew çi di serê xwe de, lê dihizirî. Ku tiştna ku pirr ew dide hizirandin ku di serê wê de tûnaba, wê ew jî wusa û wilqasî ne bihizir û mizir ba. Mihaqaq di serê wê de tiştna ku wê pirr mazin didan hizirandin hebûn. Lê wê ya di serê xwe de, di serê xwe de girtibû. Di wê demê de wê ya di serê xwe de, ji Poruşaşpa re ne hanîbû ser ziman. Lê Poruşaşpa jî, dibêt ku farq dikir ku Dugdova wusa û wilqasî bihizir bû.

Ji wê dema ku axiftinê ya di nava rêmilda û oldaran û pêde, ew pirr bûbû bi hizir. Piştre jî, wê hizirkirinê bi wê re xwe domandibû. Piştre jî, ew wusa bi hizir mabûbû. Heta ku hatibû male xwe jî, wusa bi hizir bû. Lê wê ya di serê xwe de, di serê xwe de hiştibû.

Piştî ku hatina malê, Bi wê hizirkirinê, li malê dimênin û Ji xwe re xwarin(şîv)a amede dikin û piştre jî, êdî xwarina xwe dixwûn û piştre jî êdî li hevdû dirûnihin. Dugdova, ne jinaka nezan û ku wusa demdirêj bêdeng bimêne bû. Ew diaxift û axiftinaka wê hebû ku dema ku mirov lê dihisand, dilê mirov xweş dikir. dengê wê xweş bû. Dengê, bi her dengdayîna xwe re weke ku deng li dilê mirov bixe li mirov dihat. Ew jina wusa deng xweş û xweşik, di wê demê û şevê de deng jê ne dihat. Ma gelo çi bû bû? Ji ber çi bû? ..

Wê şevê, heta ku dem hat û gihişt dema razanan jî Dugdova, wusa ew zêde ne axiftina xwe domand. Car bi car, dema ku diaxift jî, tenê gotinek ji devê wê derdikeve. Lê zêde ne dirêj. ..

Ku dem hat ber dema razana û hinekî derengî ket ardê, êdî piştre, Poruşaşpa jî ew bêdengîya wê fahm kir û êdî wî jî xwe negirt û ji wê pirsî ku ka çi wê heya ku wusa wê bîdeng kirîya. Dema ku wî jî wusa ji wê pirsî, êdî wê jî xwe negirt û bi çend gotinan bersiva Poruşaşpa da û bahse civatê û axiftin û pirs pirsîna li Zerdeşt kir. Ku Dugdova, bi wê rengê bersiv da û ya di serê xwe de ji wî re hanî ser ziman. Êdî piştre, ew jî ne bi gelekî re, di serê xwe de ket hizirkirinan de. Lê ya dugdova, ji hizirkirinekê zêdetir weke haznakê bû. Weke ku dihazinî. Hizirkirin, di serê xwe de li ser mijarekê aqil û zanîn meşandin bû. Lê hazinandin jî, çend ku ew jî hizirkirin jî hebû, bi teybetî di rewşeka bi mitalekirinê de hizirkirin bû. Lê mitalekirinê di haznê de zêdetir heya. Ya ku haznê û hizirkirinê ji hevdû cuda dike jî ev bû.

Bi wê rengê, êdî piştre ne bi gelekî re ketina xewê de. Piştî ku ketina xewê de, Dugdova, di xewa xwe de ket xewnê de. Wê êdî, di xewnê de, weke ku ji xwe re ew êdî ne di xewê de ya lê hat û wê di xewê de bûyîna xwe jibîr kir di xewnê de. Bi wê re jî, di xewna xwe de wê Zerdeşt dît. Di

gelek rewşan de wî Zerdeşt dît. Wê, carna didît ku Zerdeşt wê biqasî nîvê dûnya, wê mazin a. Carna didît ku wa Zerdeşt wusa mazina ku dikarê dunyê bike kefamista destê xwe de. Piştre, li cihenkî wê dît ku wa Zerdeşt wê li ser avekê re dimeşê. Li cihekî dît ku wê ji weke ku ji gola Qansavê derdikeve. Di rewşeka din de, wê dît ku wa Zerdeşt ava Qansavê herikand li welêt û li hemû deverên din. Gelek rewş di nava hevdû de di serê  Dugdova de bi carekê weke ku di temenekî pirr-dîmenî de werin û bibin dibû. .

Dugdova, heta Sibekê, di rewşeka ku mirov dikarê bêje ku ew ´xilobatan´ dibîne de ma di xewê de. Piştre ku ew ji xewnê rabû, dît ku wa rohnî ketîya ardê de. Dema ku ew ji xewnê rabû, weke ku ew ji dunyeyekê were dunyeyeke din lê hat. Lê dilê wê li ser hevdû dikira kutakut. Li ser Hevdû, dilê wê lê dixist. Dema ku li Dora xwe dimeyîzend jî, weke ku acêbmayî mabê, dimeyîzend. Bi wê rengî, weke demekê weke ku ne li xwe bê lê hat û di wê rewşê de ma. Piştre ku ew hat xwe êdî piştre rabû ser xwe û çû bi karûbarê xwe yê ku wê di wê dema sibehê de bikira ve çû. Wê rojê, piştî ku hinekî karê xwe kir û piştre dugdova, taştêya sibehê jî amede kir ku ew bi hevdû re li ser wê rûnihin bixwûn. De ne, weke kevneşopîyekê bû ku hertimî bi hevdû re li ser sofra sibehê rûnihin û taştêya xwe bikin. Ku herkesek ji xewê di rabû û amede dibû, piştre sofra dihat danîn û taştê dihat kirin. Dugdova, wê rojê, ji xewnê xwe baş nekir. Heta ku dem hatibû berêvarî, weke ku hinekî hatibû xwe lê hatibû. Êdî weke ku ew bandûra xewnê û heya wê ya li ser wê nemabû. Ew jî, wusa tevdigerîya. Lê di wê roja duyemin de jî, dema ku êdî ketina xewê û rahazan de, Dugdova, cardin heman xewn dît. Dîsa di heman rewşê û awayê de.

Di roja duyemin de ku dugdova ji xewnê rabû û piştre êdî wê rojê weke ku heybeteka wê xewnê li ser wê çêbû bû. Çawa dibe ku mirov xewnekê du caran li ser hevdû dibîne. Di wê rojê de, heta ku roj bû êvar, çend ku Dugdova, karê xwe dikir jî, weke ku di wê heyema ku kar dikir de ew ne li wir tevdigerîya di serê xwe de. Heya wê, ji dunya li dora wê nebû. Ji xwe, di wê nava rojê de, weke ku xewnê bibîne lê hatibû. Dibêt ku ew ne diwê rewşê de ba, wê ji poruşaşpa re jî bi hanîya ser ziman. Lê ji hizirkirin û hazkirinan, ew di wê demê de, tenê wusa bixwe re û bi serê xwe bi xwe ve mabû bû. Bi wê rengê û awayê dugdova, roja xwe li xwe kir êvar. Piştî ku bû êvar û piştre êdî bêdeng û his, wê şîv hanî û danî û bi hevdû re li ser rûniştin û bidest xwarinê kirin. Poruşaşpa didît ku Dogdova pirr bi hizir û hazna. Lê wî hizirkir ku dibê ku ew pirr watîya bê

ji ber wê êdî ew wusa bêdeng a. Ji ber vê yekê, êdî ew jî neçû bi ser wê de û ji wê ne pirsî. Ji xwe, Dugdova, jinaka wusa bû ku tiştekî giring heba di cih de digot. Poruşaşpa jî ew alîyê wê dizanî. Ji ber ku wî ew aliyê wê dizanî, êdî wî hizirkir dibê ku ji wastandinê ya.

Bi wê awayê Wan şeva xwe li xwe kir dereng û buhurand. Piştre bi wê rengî ketina nava nivîsênin xwe de. Dugdova, bi hizirkirin û haznkirinê, wusa ket nava cihan de û ne dizanî ku ew kengî ket xewê de. De ne, dema ku mejî, ji hizirkirinê bê ku ket rewşa xwe berdanê ya xewê de, êdî di cih de dikeve xewê de. Wusa li Dugdova jî hatibû bû.

Wê şeva sêyemin jî, dema ku dugdova, çavê xwe miç kir û kev xewê û razaha, heman xewn dît. Heta ku bû sibeh, ew wusa bi xewna xwe re bû. Dîsa, dema ku çavê xwe vekir, dît ku wa rohnî ketîya ardê. Dugdova, dema ku çavê xwe vekir, dîsa heman dilberî dilavêtina wê hebû. Bi çavna acêbmayî li dora xwe meyîzend. Wê demê, dema ku ew rabû ser xwe ku hinekî zû bû û lê rohnî ketibû ardê de, Poruşaşpa jî Rabû ser xwe bi wê re. Poruşaşpa ew rewşa wî dît ku mereq kir û berê xwe da wê jê pirsî ku ka çî wê heya. Di wê heyemê de, Dugdova, xewna xwe ji wî re hanî ser ziman û piştre di dawiyê de jê re got ku ev sê şev a li ser hevdû heman xewnê dibîne. ..

Piştî ku Dugdova, xewna xwe got, êdî Poruşaşpa, ket nava hizran de. Pirr hizirî, Ew jî, aqilemendek bû. Wî jî, weke rêmildarekî xewn şîrove dikir. Lê wî, wê carê, weke ku di watekirina xewna jina xwe de xwe bêçare hîs dikir. Bi wê re jî, êdî wî ku demekê hizirî û piştre, êdî hat cem ser rêmildarê wan ê herî mazin ku xewna dugdova şîrove bike. Di wê demê de, piştî ku ew hat cem mirov herî kal û xwena wê ji wî re hanî ser ziman û jê xwest ku şîrove bike ku ka peyam û wate wê ya ku tê de çîya ji wî re bêne ser ziman. Lê ew jî pirr di zorê de ma. Piştre wî jî, bakira çend rêmildarên din jî ku werina cem wî. Ku ew jî, hatin, wî ji wan re jî xewn got û piştre jî, ji wan xwest ku tişta ku jê fahmkirina werênina ser ziman ji wî re. Bi wê rengî, xewna Dugdova heta ku diçêe guhê key jî.

Piştre ku demek têve çû, êdî herkesekê ku çi ji xewnê fahm kiriya hanî ser ziman, Hineka bi awayekî qanc şîrove kir û hinekan jî bi awayekî ne beş şîrove kir. Lê hinek şêwirmendên şîrove kirin "ku ev kur mazin bû, wê xirabiyê bêne ser serê me û wê male bi viritêne." Ji ber vê yekê, gelek rêmildarên ku wusa dihizirîn jî hebûn. Wan jî, hizrên xwe hanîn ser ziman ku Sipîtama ku nêzî gola wûrmê(ûrmîye) û bajarê wûrmê bûya dûr bikin.Li ser vê jî, pirr kêf û şahîya dê û bavê wî hat. Lê hinekan jî xewn şîrove kirin ku "dema ku Zerdeşt mazin bû wê bê serok û serkêşekî

mazin bi civate û hemû civatên din."Lê hinekan jî gotin ku ev ne çareyeka. Piştre jî, şêwirmend û rêmildar û oldar li hevdû civîyan û xwestin ku ya ku rast çîya wê bikin. Hi Metran(ên ku oldarîya mîtratîyê dikin) û ankû bawermendên Mîtra û oldarên wî yên bi navê ´karapana´, ku bawerîya wan bi Daeva, wê rewşê derv olê dibînin. Bi wê yekê, êdî dibêjin ku em wî bi agirê pîroz ê Ahûra mazda paqij bikin.

Li ser wê, bawermendên Daeva, ku xirabiyê û qanciyê bi hevdû re dihêne ser ziman, biryara avêtina Zerdeşt li nava êgir didin. Di wê demê de, êdî piştre agirekî ku pirr mazin ku pirr tarîya, pêdixin. De ne, agirê, pirr dijwar jê re "tarî" tê gotin. Agirekî wusa pêdixin. Lê di wê demê de, dema ku biryara avêtina nava êgir ya Zerdeşt didin, êdî dilê dê û bavê wî digirî. Weke ku dest û lingê wan were girêdan li wan tê. Bavê wî bixwe jî bawermendekî Mîtra ya. Lê nizanê wê çi bike. Piştre, Ew diçê parastgehê û berg ji Mîtra dike ku rêyekê û nîşanaka qanciyê şanî wî bide. Ji mîtra dixwezê ku kurê wî yê ku di Rêya Mîtra de ya Zerdeşt Xilas bike û wî biparêzê. ..

Bavê Zerdeşt, dilê wî pirr kurê wî ve ya. Nizanê ku wê çi bike. Ew, wilqasî hij kurê xwe dike nayê gotina. Lê wê çi bike. Biryar hatîya dayin. Lê di wê demê de, ew xwe bixwe jî di serê xwe de berpirsîyar dibîne. Ku wî û xewna jina xwe neçûba û ji wan re negotiba, wê ev tişt ne dihatiba serê wan. Ew li vê jî, hizirî. Wî, di wê dema ku li wê hizirî de, ji xwe re got ku "min bidestê xwe male xwe viritand". Poruşaşpa, ev gotin, ne tenê carekê gelek caran di serê xwe dubara kir. Lê ma êdî fêde dikir? Çend ku wî dubara jî kiriba, wê êdî ev rewş ne guharandiba. biryar ku ji aliyê Metran û karapana ve ku hat dayîn, êdî ew biryar wê hatiba li cih. Ev yek, bi sadsalan jî wusa bûya. ..

Dem di buhurt. Piştî ku Bavê Zerdeşt ket parastgehê de û berg ji Mîtra re kir, bi kêlîkan li wir ma sekinî û jê xwest ku kurê wî xilas bike. Piştre ku ro çû ava, êdî ew jî bi hizir û hazn, ku lingên wî bi kotekî wî dihilgirin û dimeşîn, bi rewşeka bi vî rengî, ew ket rê de û hat ku were malê. Lê pirr bihazn bû. Dema ku ew hat malê. li ber devê dêrîya malê, wî dît ku Wa Zerdeşt li ber kaboka dayika xwe ya û herdû bi hevdû re rûniştîna û deng ji wan dernekeve.Weke ku dengê Dugdova jî, ne diçû tiştekî ku bike. Ku Poruşaşpa, ket hawşa malê de û wan jî ew dît, weke ku werina xwe li wan hat. Lê herdûyan jî weke dê û bav bi hazn li hevdû û li nava çavên hevdû meyîzendin. Zerdeşt, li wir, weke ku heya wî ji tiştekî tûneyî li ber sekinî bû. Lê ku heya wî hebê jî, weke ku ew ne di wê derûnîya ku dê û bavê wî di wê de bû bû. Lê Bi çavekî ku weke ku ji dê û

bavê xwe re bibêje ku mereq û mitale nekin li wan û li nava çavên wan nerî. Ew awîra Zerdeşt, weke ku dê û bavê wî jî fahm kir û farq kir. Piştre, herdûyan jî, berê awirên xwe dane ser Zerdeşt û bi hazn lê nerîn. Ew zaroya wan bû. Kezeba wan bû. Dilê wan bi wî ve bû.

Poruşaşpa, di serê xwe de dihizirî ku ka ew nikarê çareyekê bibîne. Wî, xwe di wê de bêçare hîs dikir. Ji Mîtra û pêve, ma kê dikarî wan ji wê xilas bike?

Roj hatibû kifşkirin ku wê kîjan rojê Zerdeşt biavêjina nava êgir. Ji xwe dê û bavê wî, ne dixwest ku wê bibîr jî bikin. Heta wê demê, hertimî xwûdayên wan yazdanê(êzda) mazîn alî wan kirîya. Divê ku î ro jî, alî wa bike. Divê ku wan bi tenê ne hêlê. Ji xwe, heta nûha jî, wî ew bi tenê ne hiştîya. Ma wê î ro ew bi tenê bihişta(n)?

Zerdeşt, di wê demê de hê ne wusa mazin bû. Derketibû ser heftsalîya xwe. Di nava civatê de, derketina li ser heftsalîyê, weke ast û sînoerekî jî dihat dîtin û nirxandin. Yekî ku derket ser wê astê, êdî aqilê wî dikişand. Wusa dihat hasibadin û dîtin.

Zerdeşt, derketibû ser wê temenê. Êdî ew weke yekî ku aqilê wî dikişand dihat dîtin. Zerdeşt, ji destpêka xwe ve, weke zaroyekê asayî ne hat dîtin. Zerdeşt, zaroktîya wî, bigotinên wî ên bi aqilî re derket li pêş. Bi wê re jî, êdî piştre domîya. Piştre jî, ya ku bandûra wê li jîyane wî û jîyane dê û bavê wî bû jî ev bû. Heta ku hemû êla ku ew jê ya Spîtamîdan bixwe jî, ew bandûra wî li wê bû. Navê wî derketibû.

Dem, hin bi hin têve diçû. Hêr kêlîka ku têve diçû, hinekî din wan bi ber dema ku we Zerdeşt biavêtan nava êgir dibir û nêzî dikir. Ku ji destê dê û bavê wî biheta wê dem bisekinanda. Lê Mîtra û yazdanê mazin dikarî wê bike. Ew tenê, wan dikarî bike. Yê ku baxt kifş kirî jî ew a.

Zerdeşt, bi hênceta dij- olê û ku wê olê ji holê ra bike, dihê avêtin nava êgir. Bi wê hêncetê, biryar hatîya dayîn ji aliyê rêmildar, oldar û şêwirmendan ve. ..

---- -----

Dem êdî nema bû ji wê dem û kêlîka ku wê Zerdeşt biavêtan nava êgir. Dayika Zerdeşt Dugdova, aqil û hişê wê tenê li ser kurê wê yê ku weke delalê dilê wê bû. Destê wê ne diçû ti karî ku bike. Hertimî aqil û hişê wê li ser kurê wê bû. Lê ma çi wê bikira. Li ber biryara oldar û rêmildaran, ti kesekî ne dikarê ku bisekinîya. Ku key jî ba, ku wan biryar da, wê li ber biryara wan ne sekinî ya. Hêza wan û bandûra wan, di nava civate de pirr zêee hebû. Gotina wan, pîroz dihat dîtin. Ahûra Mazda, aqil çê dikir. Wî ji wî aqilê ku çê dikir, serê wan dagirtibû.

Poruşaşpa bavê Zerdeşt, di wê demê de, ew jî di rewşeka wusa de bû. Di hiş û mejiyê wî de, tenê Zerdeşt hebû. Zerdeşt jî, weke ku heya wî ji dunyê tûneyî di wê dunya xwe de weke ku dijî. Ew ji xwe, weke ku wê tiştekî wusa nebe, di derûniyekê de bû. De ne, di hat bawer kirin ku her zaroya ku heya, hertimî li ser milê wî yê çape û yê rastê du farîşte(melek) hena. Herdû, karê wan ew a ku zaroyan ji belayan xilas bikin. Zerdeşt jî hê zaro bû. ..

Dem hin bi hin di buhurî. Her kêlîka ku di buhurt, hinekî dîn wan nêzî wê kêlîkê dikir. Dê û bavê Zerdeşt di xwest in ku ew kêlîk newê. Di dilê xwe de, di xwestin ku dem bisekinê û ne herikê. Lê Oldaran jî, dixwestin ku ew kêlîk, kêlîkekê ji ya din zûtir were. Oldaran jî, di nava xwe de bûbûn dubeş. Beşekê, weke ku ne di wê baweriyê de bûn ku divîyabû ku Zerdeşt biavêtan nava êgir. Lê beşek ji wan jî, pirr parazvanê vê hizrê bûn. Wan, pirr dixwest. Wan, hem digotin ku "zerdeşt ji olê derketiya" û hem jî digot ku "wê di demên pêş de belayên pirr mazin bi wî werina serê me." Ancamên ku wan ji wê xewnê derxistibûbûn ev bûn.

Zerdeşt, hê zaroyek bû. Ma wê çi bela hanîba serê wan. Wê di demên pêş de bûba sedema çi belayan ku were serê wan û welatê wan? Rêmildaran, bawerîyek di nava wan de hebû ku bi sadsalan pê hatibû bawer kirin. Ew jî ew bû ku "dema ku mirov bû, pêre baxtê wî jî hatîya kifşkirin û wê di jîyane xwe de dernekeve dervî wê." ..." .. çi di jîyane wan de ku ew bikin û were serê wan, berê hatîya kifş kirin." .. "... Ti kesek, nikarê ji wê rastiyê bi revê." Bi vê rengê bawerî hebû. Bi wê re jî, rêmildar û oldaran, hertimî hewl dabû ku xwe bigihênina wê baxtê û fêr bibin ku wê ew mirov di jîyane xwe ya ku wê bijî de wê çi bike û bibe çi û çawa bibe. Bo vê yekê jî, rêmildar û oldar, weke mirovna ku hatibûbûna hilbijartin û naqandin. Ew, yên ku tenê ku dikarin ku xwe bigihandan wan rastîyan.

Oldar, di wê bawerîyê de bûn ku wê ‘Saoşyant’ ê sêyemin weke ê dawiyê wê were. Ku ew hat, êdî wê dunya û hemû tişt biadilê. hat ku wê gerdûn bixwe jî, bikeve ahangekê de bi wî û hatîna wî re. Jinaka ku wê di nava qansavê de xwe bişoyê wê piştre bi haml bimêne û wê piştre ji wê bi hamlbûna wê ew bibe. ..

Herkesekê ev yek û rastî dizanî. Ev ne tenê weke baweriyeka olî hebû. Ji wê zêdetir, weke rastîyaka ku wê bibe jî bû. Bi wê yekê, mirovatî, hemû li bendê wê hatinê bû. Ku kengî, ew hatin bû jî, wê yazdanê wan ê mazin wê gelek nîşanaka şanî wan bide weke nîşanakên hatina wî.

Dugdova, weke jineka pirr xweşik û sipahî, bandûra wê li ser herkesekê ku ew dîtibûbû bûya. Hinekên ku ew dîtina, wilqasî di bin bandûra wê sipahîtî û xweşikatîya wê de mana, êdî ji bo wê gotina ku "wilqasî xweşika, ti dibe qay di nava ava qansavê de xwe şiştîya." Ev gotin, pirr caran hatîya gotin û yên ku nebihîstina, weke ku nîn in. Di wê demê de, gelek rêmildarên ku diaxiftin û li ser hizra avêtina Zerdeşt nava êgir de ku hizrên xwe de dihanîn ser ziman de jî, di kevîyeka mejiyê wan de, ew bihîstinên ku hatibûbûna guhê wan jî ne ku ne zîndî bûn. Zindî bûn. Lê tenê weke hizreka ku weke çireyekê pêkê, tenê di mejiyê wan de bû. Di mejiyê wan de, ew weke ku rewşîyek hebe û di nava wê rewşîyê de ew çira pêketî bê bû. Bo vê yekê, ew pirr li berçavên wan bû. Lê yekî jî ew hizra xwe ne hanîn ser ziman.

Zerdeşt, di wê demê de, li ber dawa dayika xwe rûniştî bû. Dayika wî jî, bi wî re li hawşa malê bû. Dilê dayika wî dişawitî. Dixwest ku tiştekî bike û kurê xwe xilas bike. Lê wê jî, xwe wusa bêçare didît. berg ji yazdanê mazin re dikir ku çareyekê ji wê re bibîne û wê ji wê êşa dil û kurê wê jî ji wê baxtê wî yê ku hatî nivîsandin xilas bike. Ew rewş, weke baxtê Zerdeşt hat dîtin. ..

Rêmildar û oldarên ku biryar dabûbûn, ew di biryara xwe de weke ku di serê xwe de pirr zelal bûn. Bi wê rengî, gotina xwe li ber key jî û li ber mirovên li civate xwe jî digotin. Di gotin ku "divê ku Zerdeşt, were kuştin."

Dem buhurî û dem hat wê roja ku wê Zerdeşt bi avêjina nava êgir. Agirekî tarî wê rojê pêxistin û herkesek li dora wî agirî bû kom. Rêmildar, ji berê ve li dora êgir bi kom amede bûn. Li wir bûn. Lê Dugdova û poruşaşpa û kurê wan Zerdeşt ne li wir bû. Piştî ku herkesek li wir lev civîya û agir pêket, piştre çend rêmildar û oldar ketina ser rê û çûn ku harina male Poruşaşpa ku ew bixwe jî bawermendê Mîtra bû weke wan. Ku hatina berdevê dêrî, êdî li ber poruşaşpa û jina wî û Zerdeşt bûna rêz û sekin in. Di nava wan de yê pîr kîjan bû, gotin li wî diket û wî mafê gotinê girt û gotina pêşî wî kir li ber Poruşaşpa. Dema ku Axift jî, weke got Poruşaşpa re; "Poruşaşpa, em weke oldar û mazinê vê civatê hatina ber devê derîyê te. Ew roj, ev roj a. Ev roj baxt a. Ti kesek, nikarê ji wê xilas bibe. Kurê tê Zerdeşt, dema ku ji dayikê bû negirîya û piştre weke zaroyekî di nava hevalên xwe de nemaya û neleyistîya. Ev ne nîşanakên baş in. Ku kurê te mazin bû, wê feleketekê bêne ser me û ola me û civate me. .." Ku yê oldar, ev gotinên xwe bi çend gotinên din re jî gotin, piştre gota Poruşaşpa ti bi destê xwe kurê xwe bêne ber cihê. .."

Piştre, ku Zerdeşt di rex bavê xwe de û destê wî di destê wî de, di ketina nava oldaran de û çûna bi ber qada parastgehê ku lê agirê tarî pêketî ya. Dîya Zerdeşt jî, di rex wî de dimeşî. .. Ew jî, dilgirî û çavşilî bû.

Ku hatina ber qada ku lê agir pêketîya, dîtin ku wan gelek mirov li hevdû civîyana. Ti kesek di male xwe de nemaya. Herkesekê li wir, hatîya wir. Ku hatina beragir, êdî oldarê pîr, çû pêşîya xalkê û ev gotin ji dev gotin; " ne win dizanin ku di bawerîya me ya Daeva´ de, farîştayên ku hena. Ahangekê çêkirina di nava qancî û xirabiyê de. Ew, di nava herdû alîyan de na. Lê li herdû alîyan jî na. Vêca, nûha me Zerdeşt avêjina nava agirê pîroz ku ew were paqijkirin û yazdanê mazin jî me ji hemû bela û feleketên ku di dema pêş de ku di baxt de nivîsîya ku were serê me, me ji wan xilas bike. .." Piştî ku oldar, çend gotinên din jî bi ser van gotinên xwe ve kirin, êdî piştre ma sekinî. Bal û heya wî çû ser Zerdeşt. Bi wir ve, bi aliyê Zerdeşt ve nerî. Lê di wê dema ku oldar nerî de, navê wî, bi Poruşaşpa ket. Poruşaşpa, bi hazn û hizir û xamgînî dihat dîtin. Lê ti gotin, di wê demê de ji devê wî derneketin.

Piştre, li ser gotina Oldarê mazin, çend oldarên din hatina ber Zerdeşt û rahiştina destê wî û ew ji cem bavê wî dûrkirin. Zerdeşt, di wê dema ku ji cem bavê wî dûr kirin, negirî. Weke ku ji xwe tiştek tûnayî tevgerîya û li bavê xwe nerî. Heta ku ji bavê xwe û dayika xwe dûrket jî, çavê wî li wan ma. Wê rewşê jî, beybetek li ser hemû mirovên li Dorê çê kir. Zerdeşt, zaroyekî êdî hinekî mazin bû. Lê çend ku hiş dikir û dizanî ku ew diçê mirinê jî, negirî. Zaroyek, ku telîya wî tiştek lê bikeve û biêşihê jî, digrî û ankû dibîje ´ayyy´. Lê Zerdeşt, weke ku ji xwe tiştek tûnayî dimeşê. Weke ku ji xwe naçê mirinê, diçe liyistinê di rê de dimeşê û ji dê û bavê xwe dûr dikeve.

Di wê rewşê de negirîna wî, bû sedemeke heybetekê.Zerdeşt, bitirs nebû. Tirs di wê demê de, li ser wî ne dihat xûyakirin.

Piştî ku Zerdeşt di nava oldaran de hat berdestê oldarên mazin, êdî li wir ma sekinî. Oldarê mazin, gotinên xwe yên ku ji bavê wî re li ber bavê wî gotibûn dubara kir. Got ku "dema ku ev zaro bû, negirî. Piştre jî, weke zaroyekî nekenîya. Ev ne nîşanakên başîyê na." Piştre jî, weke got, "divê ku Zerdeşt bimirê. Lê ku li jîyanê ma, wê feleket werina serê me hemûyan. Bo vê yekê, em nûha berg dikin ji yazdanê mazin re û wî diavêjina nava agirê tarî ê pîroz ku gîyane wî paqij û azad bibe." Piştre Oldar ma sekinî. Êdî piştî ku oldarê mazin gotina xwe bidawî kir, êdî Zerdeşt ku destê wî di destê du oldaran de hanîna ber agirê tarî û pirr şawat û gurr. Li wir, êdî Herdû oldaran rahiştina Zerdeşt avêtina nava

êgir li cihê herî bi şawat ku dikarê bişawitêne. Dema ku wan Zerdeşt avêta nava êgir, agir, weke ku wî li hewa zant bike û hêdîiak dêne ardê rewşek hat li berçav.Piştre agirê li dora wî bêhtirî gurr bû û weke ku qûleka mazin û kûr di nava agir ve vebê bû.Herkesek ma acêbmayî. Agir, Zerdeşt ne şawitand. Agir, Zerdeşt parast.

Herkesek li ber wê rewşê şaşmayî û acêbmayî ma. Agir, hata ku mivirt Zerdeşt di navê de ma. Lê Piştre Zerdeşt bi lingên xwe ji nava agir derket û hat ber wan. Herkesek, ji wê şaş û acêbmayî ma. Nizanîbûn ku çi bibêjin. Gotin, ji devê ti kesekî derneket. Zimanê ti kesekî di wê demê de di devê wan de negerîya ku gotinê bibêjin. ..

Piştre, Zerdeşt, hat û rastarast çû cem dê û bavê xwe û ma sekinî. Dê û bavê wî jî, weke herkesekî bi acêbmayîn û matmayînekê li kurê xwe meyîzendin. Ew jî, pirr şaş û mat mabûn. Nizanîbûn ku çi bibêjin.Zerdeşt avêtibûbûna nava êgir û agirî neşawitandibû.

Ew rewş, bû sedema pirr nîqaşan di nava oldar û rêmildaran de. Hinekan ew weke nîşanaka qanciyê şîrove kirin. Hinekan jî, weke nîşanaka feleketeka mazin şîrove kirin. Yên ku weke nîşanaka feleketê şîrove kirin, gotin ku "feleketê ku were serê me, di hatina xwe isrer dike." Piştre jî, gotin ku "çi dibe bila bibe, divê ku em ji Zerdeşt xilas bibin. divê ku ew were kuştin." Piştî van gotinan re, êdî gelek hizrên din jî hatina ser ziman. Bi rojan, wan nîqaşan bi heybet û şidetekê doman. Herkesekê ku gotina xwe digot, li ber pirsa ku "ji nûha û pêde, em divê ku çawa gava xwe biavêjin û li Zerdeşt nêzîkatiyê bikin digerahan." ..

Lê oldarên ku ew rewş, weke nîşanaka ne baş şîrove kirin, piştre ya xwe serdest kirin. Wan, di xwest ku bi tememî ji Zerdeşt xilas bibin. Lê ew bixwe jî, di serê xwe de û di nava xwe de xwediyê tirsna jî bûn. Hineka jî, digotin "ku ev ne nîşanaka ne başîyê bê, wê piştî Zerdeşt re êdî çi were serê me(?)". Ev pirs jî dikirin. Lê bersiva wê pirsê, di serê wan de jî, bi zelalî tûne bû. Ew jî, li wê dihizirîn.

Piştre, ji wê gelek gotinên ku berê bo dîya Zerdeşt hatina gotin cardin bi lêv bûn û hinek gotinên din jî bi ser wan ve hatina zêdekirin. Di demên berê de, ji bo wê dihat gotin ku "wilqasî xweşika ti dibe qay di ava qansavê de xwe şiştîya." Ev hizir, êdî bêhtirî di serê mirovan de zêdetir bûn. Tenê, jinaka ku wê di ava qansavê xwe de ku xwe bişoyê, wê ji wê piştre bi haml bibe û wê zaroyekê werêne dûnyê. Ew zaro, piştî Hoseng, wê bê ‘Saoşyant’ ê sêyemin. Ma gelo, Zerdeşt, ew zaroya û ankû xilaskerê ku li bendê bûn? Ew, piştî sê hezar salan re ‘Saoşyant’ ê ku li bendê bûn? Ji xwe, oldar, wilqasî, di ya xwe de û di ya serê xwe de kûr û

dûr çûbûbûn, weke ku heya wan ji wê dunya û hizrên wan û bawerîya wan nema bû. Ev alî, weke ku ji bîr kiribûn.

Oldarên ku digotin ku bi çi awayê bê ku divê ku Zerdeşt were kuştin, di nava xwe de digotin ku divê ku em rêyekê bibînin ku ew ti carî jê xilas nebê. Li rêyeka kuştina wî digerehan. Li ser wê, serî di wastandin. ..

Zerdeşt, piştî ku ew hatibû avêtin li nava êgir û ew di nava êgir de ku ne şawitî bû, êdî ew rewş bandûra wê li ser xalkê bandûraka mazin dikir. Pirranîya oldaran digotin ku divê ku ew were kuştin. Lê êdî bawerîyeka di nava xalkê de jî afirîbû ku yazdanê mazin ew parast û nehişt ku ew di nava êgir de bişawitê. Bi wê jî, bawerî afirî, ku di wê yekê de isrer kirin, wê yazdanê mazin bihêrs bike. Ew rewş, weke nîşanakaya mazin ya ji yazdanê mazin hatibû dîtin û wusa hatibû şîrove kirin.

Zerdeşt, navê wî di wê demê de derdikeve. Ew, êdî tê nasîn. Wê rewşa avêtina wî ya nava êgir û neeşawitandin êgir wî, weke rewşeka "nîşanakaya ku ji yazdanê mazin" a.

Lê bi demê re ku demeke zêde wusa dirêj jî bi ser ve naçê, bahse dîya Zerdeşt dihê kirin. Biqasî xweşikatîya wê, wilqasî jî ji bahs dihat kirin. Rewşa ku bahse wê dihat kirin, berê hingî çend gotinên ku bo ku bi wan bahse xweşikatîya wê û sipahîtîya wê bi wan dihat kirin, piştre êdî piştî wê re, di temen û rengê baweriyekê de dihatina ser ziman. Weke "jina ku bi ava qansavê xwe şiştî" hat bahskirin ji wê.

Ma gelo ev rast bû? Gelo, bi rastî wê xwe di ava qansavê de şiştibû? Vê gotinê, di serê mirovan re bawerîyek bi vî rengî afirand. Hîseka bi vî rengî di serê mirov de afirand û piştre ew hîs bi hiş û zanîn kir û derxista li têgihiştinê. ..

Oldar û rêmildar, demeka dirîj piştî rewşê re di nava hevdû de didin û distênin. Gelek civînan bi hevdû re dikin. Di dawiyê de, hizra yên li dijî Zerdeşt in û ku dixwestin ku ew bêsert û merc divê ku were kuştin hatibû pejirendin û herê kirin. Piştî wê rewşê re, êdî biryaraka din hat dayîn. Wê vê carê, Zerdeşt ne avêjina nava êgir. Wê wî, dênina ser rêya qaranak ga û conagayan ku tên. Bi wê hiz û leza ku ew tên, wê êdî ew ga û conaga jî, Zerdeşt di nava lingên xwe de bi perçiqênin û avçîqênin. Piştî ku ew di nava lingên xwe de perçiqandin û avçîqandin, êdî ew jî wê bimirê û wê ew jî ji wî xilas bibin.

Lê wê care dûyemin bi biryaraka bi vî rengî derketina oldar û rêmildaran li ber xalkê, gûman kiribû serê wan de. Heta demê ti carî di derbarê biryar û gotina rêmildar û oldaran de nîqaş û gotin û gûman ne hatîya ser ziman. Lê wê naqlê, weke ku gûmanak di serîyan de hebû.

Gelek mirovan bawer dikir ku yazdanê mazin ew xilas kir. Êdî bawer dikir in ku wê carê jî herina bi ser Zerdeşt de û tiştekî bênina serê wan, wê yazdanê mazin jî tiştekî mazin bêne ser ziman. Bi vî rengî, êdî bawerî afirîbûn. Ji ber vê yekê, tirseka pirr mazin dilê her mirovî de afirî bû. Di nava xalkê de, gotin li ser gotinê dihat gotin. Ti kesekî wêre ne dikir ku li ber rêmildar û oldaran gotina xwe bibêjin li dijî. Lê di guhê hevdû de digotin.

De ne, divê ku mirov bibêje ku ga´, di bawerîya Mîtra de pirr pîroz a. Ga, weke nirxekî pîroz ji yazdanê mazin hatîya dîtin. Êdî di jîyanê de, weke yazdanekê jî hatîya dîtin. Lê ew piştre, weke awayekî ku yazdanê mazin afirandî dihê dîtin û ser ziman. Bawerîya li ga, mazin bû. Di rewşeka wusa de, ku Zerdeşt dênina ber lingê gayan ku ew pêla bikin û wî bi perçiqênin û avçîqênin, wê êdî weke ya yazdanê mazin ba. Wusa, dihat bawer kirin. Sedemeka ku avêtina ber lingê ga, hinekî jî bi vir ve girêdayîya ku bo ku weke ya yazdanê mazin pêk were. Di rewşeka wusa de, ku Zerdeşt, di nav lingên ga´yan û conagayan de hat perçiqandin û avçîqandin û bi wî rengî êdî hat kuştin, êdî wî ti kesek jî di serê wan de gûman nema ba. Hinekî jî, oldar, li vê yekê jî hizirî bûn. Ji ber ku oldaran kiribû serê xwe de ku divê ku bi çi awayê divê ku ji Zerdeşt xwe xilas bikin.

Dîya Zerdeşt û bavê Zerdeşt, di wê demê de di cihê xwe de sekinî bûn. Ne dikarin ku li dijî gotina oldaran derkevin. Bavê Zerdeşt, bixwe jî ew oldarek bû û ya ku ola wan pêwîstî pê didît dizanî. Ku ew ne kurê wî ba ku kurê yekî din ba û ew di cihê wan oldaran de ba, dibîyabû ku wî jî weke wan kiriba. Dibîya bû ku wî jî, wusa biryar bide. Dibîya bû ku weke ku wan oldaran li ber wî weke pêwîstînîyên olê ew dihanîn ser ziman, wî, wê wusa bihanîya ser ziman.

Lê ji wê zêdetir, ew bavek bû. Dilê wî bi zaroya wî ve bû. Zerdeşt, ji piçûkatîya xwe heta ku tê wê temenê xwe, bavê wî ne tenê jê re bûya bav, weke her bavî li gorî kevneşopîyê jê re bûya mamosteyekî ku jîyan jî fêrî wî dikir. ..

Dem, êdî her kêlîk û heyema wê bi êş dibuhurî bo Dugdova û Poruşaşpa. Êdî jîyan ji bo wan harimî bû. ne dikarîn tiştekî bikin û ne jî dikarin herina deverekê. Te digot ku qay ew di wê demê de di jîyanê de najîn. Te digot ku qay ew di xewneka bi xulobat de na. Wan jî, xwe wusa hîs dikir. Tenê yazdanê mazin û Mîtra dikarî wan ji wê rewşê xilas bike. Bo wê yekê, wan jî, di her firsandekê de, hawara xwe digihandina yazdanê mazin û Mîtra.

Zerdeşt, ku di nava agir de jîyane xwe ji dest daba û miriba, dibêt ku dê û bavê wî wilqasî bi êş ne dibûn. Lê di rewşên weha de, weke ku ne carekê her kêlîkê carekê dimirin bo kurê xwe. Ma wê çi bikiran? BIryar hatibû dayîn. Ew jî, êdî wê ji wê xilas nebûba. Zerdeşt, wê hatiba kuştin. Oldaran xilasbûna xwe û ku di pêşarojê de feleket newina serê wan di kuştina Zerdeşt de didîtin.

Dem êdî hem diçû û dibuhurî û hem jî weke ku di derekê de sekinîbû bo dê û bavê wî. Lê Zerdeşt weke ku berî avêtina wî ya diêgir de çawa bû, di wê demê de jî wusa bû. Ji xwe, weke ku ti tiştek nebûyî te digerîya. Ji xwe, weke ku ew rewş di wê demê û heyemê de nebûyî tevdigerîya. Zerdeşt, bêtirs bû. Weke ku bawerîya wî ji tiştna hebû. Ew li xwe bi bawer dihat xûya kirin. Ew, bi wê rengê, ne di rewşeka tirsonek de bû.

Lê piştî ku oldaran birîyar dar ku wê Zerdeşt biavêjina ber lingê ga û conaga´yan, êdî piştre roja ku wê bikin jî kifşkirin. Berî wê kirinê, oldaran ferman de hemû mirovan ku heçîyê ku karê çendî ga û conagayên zaxm û bi hêz bibînin û lev bide kom, bila bike. Bi wê yekê, êdî heta ku roj dihê wê rojê, bi sadan ga û conagayên mazin lev didina li hevdû li qadê û dora wan digrin û tenê rêyekê ji wan re dihêlin ku ew têre herin. ..

Piştî ku amedekarî bûn, êdî ew roj jî hat. Piştre Oldaran, Zerdeşt, hildan û birina qadê li nava xalkê. Li wir, dîsa hemû xalk li hevdû civîya bû. Li qadê, bi sadan ga û conagayên mazin û bizaxm lev dabûbûn li hew. Di wê demê de jî, oldar jî, derketina pêşîya girseyê û xalkê û ji wan re bahse kuştina Zerdeşt kirin. Piştre jî, gotin ku "heta ku Zerdeşt sax bê, emê di jîyane xwe de aramiyê nebînin û xwe ji feletekên ku werina serê me, emê xwe xilas nekin. Wê xwe ji qazaba daevan xilas nekiriba. ..

Piştî ku herkesek li hevdû civîya, piştre jî, oldaran, Zerdeşt hanî û danî li pêşîya garana ga û conagayan. Li pêşîya wan jî, bi sadana ga û conaga hebûn. Li dora wan jî, hemû xalk bo ku lê temaşa bike amede bû. Bi xalkê ku li hevdû bûbûn kom, her sê aliyên ku ga û conaga ku karibin têre herin hatina girtin. Tenê aliyek û rêyek ji wan re hiştin û Zerdeşt jî danîna ser wê rêyê ku dema ku garana ga û conaga ket bazînê de, êdî Zerdeşt di nava lingên wan de bi perçiqê û biavçîqê.

Piştî ku oldaran, her tiştê xwe karkir û amede kir, piştre jî, ferman dane mirovên ku garana ga û conaga bikina meşê û bazînê de. Di wê demê de, êdî ku wan mirovên ku ew karkirin ku dengê xwe kirin û aliyê ku ew wê tê re herin ku vekirin êdî garana ga û conaga ket bazînê de bi

ber aliyê Zerdeşt ve. Lê di wê dema ku garana ga û conagayan ket bazînê de, gayekê ku ji hemûyan maztir, bi lezekê hat pêşîya hemû ga û conagayan û çû û li cem Zerdeşt sekinî û ew parast. Êdî her gayê ku hat di ber wan re buhurtin û çûn. Di dawiyê de, ku hemp ga û conaga buhurtin jî, êdî ew gayê mazin ê ku Zerdeşt parast jî da dû wan weke gayê dawiyê li dûv wan ket rê û çû.

Piştî ku Garana ga û conagayan buhurt, dîtin ku wa Zerdeşt hê weke xwe ya û ti tişt jê ne hatîya. Bi wê rewşê, êdî bêhtirî heybeta Zerdeşt li ser wan çêbû. Lê herî zêde, dema ku dîtin ku gayek ji nava hemû gayan derket û çû û li ber wî li pêşîya gayên din sekinî û Zerdeşt parast, wê rewş herkesek kir heybetê û tirsê de.

Çend ku wê rewşê tirs kira dilê herkesekê de jî, oldar dîsa ji ya xwe ne hatina xwerê û piştre li hevdû civîn û dîsa biryara kuştina Zerdeşt dan. Weke ku êdî inka wan çû bû ser Zerdeşt. Lê di nava wan de jî, pirr nîqaş destpêkiribûn. Ew bixwe jî, di nava xwe de bûbûna duqat. Gelek dengên jevcuda ji nava wan jî derdiket.

Di wê rewşê de, êdî piştî wê rewşê jî, êdî gelek oldaran bixwe jî, yên ku digotin ku "ev nîaşanayaka ji yazdanê mazin a" jî hebûn. Wan jî, hizrên wan bi wî rengî dihanîn ser ziman hebûn. Lê yên ku digotin ku "ev isrer baxtê me ya ku ew wê di pêşarojê de ku wê çi bêne ser me ya" jî hebûn. Bi vî rengî du hizrên hevcûda hebûn. Lê ji bilî van, gelek hizrên din jî ên ku dihatina ser ziman hebûn.

Zerdeşt, piştî ku ji wir jî xilas bû bû, êdî ew bi tememî hatibû nasîn. Êdî, yên ku bawer dikirin ku yazdanê mazin ku wî diparêzê, zêdetir dibûn. Lê Metran(ên ku bawermendên ola Mîtra) û her wusa, oldar, êdî nizanîbûn ku ka wê çi bikin. Êdî ên ku di nava wan de jî ji xwe dipirsîn ku ka "ma ew yekî ku bijartî ya." Yên ku ev pirs dikirin ji oldaran, bixwe jî, ne diwêrîyan ku bersiva pirsa xwe bixwe bidin. Ji ber ku berî hingî, wan biryara mirina wî dabû bû. Li ser wê, êdî ditirsîyan ku ew ne yekî wusa ya. Hizrên ku ew ‘Saoşyant’ê sêyemin a jî, êdî dihatin ser ziman. De ne, dihat bawer kirin ku piştî hatina Hoşeng, divîya ku sê hezar sal bibuhurîyan. Piştî sê hezar salan, wê ew hatiba. Yên ku dem dihijmartin ku ka ewqas sal tişîbûna jî hebûn. Bo vê yekê, oldaran, dixwestin ku xwe rast derxin ku ew ne yekî ku bi wî rengî ku hatîya hilbijartin. Lê di wê demê de, ti bersivên wan jî, ji ne şawitîna wî ya di êgir de û di garana gayan de, ku gayek were li cem wî bisekinê û wî ji garanê xilas bike, heta ku garan bi buhurê re tûna bûn. Ew oldar û rêmildarên ku ji hertiştî re bersiveka wan hebû, li ber vê van herdû rewşan bêbersiv diman. Ne

dikarîn bibersivênin. Lê wan bixwe jî, di xwe de hîs dikirin ku bersivandinek divîya. ..

Oldar, ji ya xwe ne hatina xwerê. Wan di ink û inta xwe xwe de îsrer kir. Bi wê ink û inta ku xwestin ku wî bikujin, çûna bi ser wî de.

De ne, tê zanîn, ku yekî ink û inta yekî hilda, êdî di ya xwe de isrer dike. Hinekî jî, di temenê ink û intê de armanc û hewldane xwe rast derxistin jî heya. Ya ku bi wan re dihat dîtin jî, hinekî ev bû.

Di wê demê de, piştî ku Zerdeşt ji garana gayan jî xilas bû û piştre, oldar li hevdû dirûnihin û bi hevdû diaxivin. Ji hevdû dipirsin ku ka çi bikin. Ji wê rewşê re dixwezin vegotinekê bibêjin. Divê ku bersivek û ankû gotinaka wan ji wê rewşê re hebe.

Zerdeşt jî, di wê demê de êdî hinekî dî mazin bûbû. Ew, zaroyekî mazin bû. Ne piçûk bû. Temenê wî, derdikeve ser 13 salîya wî re.

Oldar, di wê demê de, ji ya xwe nayên xwerê û dixwezin ku Zerdeşt bikujin. Bi wê yekê, biryaraka din didin. Ew biryara wan jî, ew a ku di wê demê de, dêlagûrek hebû ku pirr mazin û bi zaxm bû. Digotin ku wê dêlagûrê bi dehan mirov kuştina. Lê ti mirovî nekarîya ku wê bikujê. Oldar, biryarê didin ku Zerdeşt hildin û bibin li devê şikefta ku dêlagûr lê dimêne dênin û dêlagûr ku ew dît êdî wî bixwe. Piştî vê biryarê didin, êdî piştre ew jî, demê winda nakin û têna cem bavê Zerdeşt, û ji wî Zerdeşt dihildin û dibin û diênina devê wê şikeftê.

Oldaran, Zerdeşt hilda û birin û danîn devê şikeftê. Êdî di wê demê de jî ti kesekî hêvî ne dikir ku wê Zerdeşt ji wê sax bifilitê. Ji ber ku ti kesek, heta wê demê ji wê dêlagûrê sax nefilîtîya. Dêlagûrê, gelek mirovên ku li deverna din jî dtina hêrîşî wan kirîya û ew kuştina. Vêca Zerdeşt li devê şikeftê hatîya danîn li ber wê şikefta wê. Ma wê Zerdeşt êdî çawa xilas bibe.

Dê û bavê wî jî, wê carê hêvîya xwe birrîn. Êdî wan jî, hizir dikir ku wê Zerdeşt êdî nikaribê ku ji wê xilas bibe. Zerdeşt, piştî ku li wir hat danîn bi rojan ew li wir ma. Dêlagûrê, dema ku ew danî li wir, ji dêla ku herê û hêrîşî wî bike, çû û li cem wî sekinî û ew hamand. Piştre Zerdeşt jî, li wir ma û jîya. Zerdeşt, demekê li wir dimêne. Êdî bi ser wê roja danîna Zerdeşt a li devê şikeftê gelek roj di buhurin. Êdî herkesek, bawer kir ku Zerdeşt, ji aliyê dêlagûrê ve hatîya xwarin.

Piştî ku çend rojan deng ji wî derneket, êdî herkesek di serê xwe de gihiştibû wê qanaatê û qinyatê. Lê dayika Zerdeşt, ne di wê qanaat û qinyatê de bû. Ew, xwediyê hîsekê bû. Heta ku çend caran bavê wî bixwe jî ji dayika wî re gotibû, êdî Zerdeşt çû û me ew winda kir.

Dayika Zerdeşt, bi hêstên xwe yên dayiktiyê tevdigerîya. Wê bi wan hîs dikir. Dema ku wê gotina xwe digot jî bi wan digot. BI wan hêstan û hîsê bersiv dide.

Piştî ku çend roj û ankû demeka dirêj bi ser roja danîna Zerdeşt li devê şikeftê re di buhurê, êdî piştre, ku herkesekî bawer kirîya ku Zerdeşt ji aliyê wê dêlagûrê ve hatîya xwarin, piştre, dayika wî, bi wê hêst û ramanê bawer nakê û dibêje bavê Zerdeşt ku "ezê herima wir û li wir hastûyên kûrê bibînim. Poruşaşpa jî, jê re dibêje "neçe! Ku di herê wir, wê dêlagûr te jî bibîne û wê te bixwe." Lê Dayika Zerdeşt dugdova guhdanê wan gotinan û ew dikeve şer rê de û tê devê şikeftê. Dema ku ew tê û digihijê devê şikeftê, êdî li wir dibîne ku wa kurê wê Zerdeşt wê li wir sekinî ya û li ser latekî paqij wê rûniştîya ji xwe re û li wê li hewirdora xwe dinerê û temaşa dike. Lê dema ku Dayika Zerdeşt hat û gihişt wir û êdî ku Zerdeşt jî ew dît êdî Zerdeşt, di cih de da xwe û bi ber wê ve bazî û hat û destê dayika xwe girt bi dilûbîrê.

Zerdeşt, hê sax bû. Dêlagûrê ji dêla wî bixweê ew parastibû û hamandibû. Piştî ku Dayika Zerdeşt hat wir, êdî wê jî, ew yek dît û fahm dikir. Zerdeşt û dayika xwe bi hevdû re li ser wî latê ku ew pêşî li ser rûniştîbû bi hevdû re rûniştin û bi hevdû re danûstandin. Bîra xwe ya li hevdû buhurandin.

Piştî ku Dayika Zerdeşt ketibû ser rê de ku were devê şikeftê ku hastûyên kurê xwe bibîne, piştre Poruşaşpa jî ku çend mirov û oldar jî ketibûbûna rex wî de, dabûbûn ser rê û li dûv wê hatibûbûn. Dema ku ew hatin û gihiştina nêzî şikeftê, dîtin ku wan Dayîka Zerdeşt, wa bi Zerdeşt re li ser lat rûniştîya û wê bi hevdû re na. JI wê rewşê jî, êdî mabûbûn şaş û mat û acêbmayî. Dêlagûra ku dema ku mirovek didît û ew bi dinanên xwe dikir qatqat, di wê demê de dest nedabûbû Zerdeşt. Êdî gotina oldaran jî nemabû ku ka wê çi bibêjin. Piştre, dema ku Zerdeşt û dayika wî, mirovên ku li dûv dayika wî ku hatibûn ku ew dîtin, êdî ew ji cihê xwe rabûn û bi ber wan ve çûn. Piştre jî, êdî wan jî rewş dît û fahm kir. Piştre êdî bi hevdû re ketina rê de û hatina malê. Piştî ku ew hatin û êdî ku hat dîtin ku Zerdeşt jî hê sax a, êdî herkesek acêbmayî û matmayî mabû bû. Êdî herkesekî qinyat pê hanî ku yazdanê mazin wî diparêzê.

Zerdeşt, di wê dema ku ew li wir mabû de, pirr hizirî bû. Ji xwezayê wî gelek tişt dîtibûn û di serê xwe de ew bi hizir kiribûn. Wî pirr pirs ji xwe kiribûn. Ez kî me? Ji kûderê têm û herima kûderê? Kê ev azman çê kiriya? Jîyan çî ya û çima ya? Ew stêr, ji ber çi na û kê ew li azmana bicih kirina.? Ax, hewa, av û agir çima na û ji ber çi na.? qancî û neqancî

çina û çima na? Sedema qancîyê çî ya? Û sedema neqanciyê çi ya? Mirin çi ya û çima mirov dimirê.? Piştî mirinê re jîyanek çawa li bendî mirov a? Bihûşt çî ya? Û Dojeh çî ya? Di xwezayê de, ku dem hat hertişt şîn dibê û piştre hişk dibe, piştre carek din şîn dibe û hişk dibe, sedeme wê çi ya û ji ber çi ya? ...

Weke van pirsan û hê gelek pirsên din Zerdeşt ji xwe dike. Li bersiva digerihê di serê xwe de. Lê piştî ku ew hatina malê, êdî bavê wî jî di nav de, wê ev pirsên xwe ji hemû oldar û rêmildaran kirina. Ew oldar û rêmildarên ku ji hertiştî re bersiva wan heya, li ber pirsên Zerdeşt dikevina zorê de û nikarin bi tememî bersivê bidina pirsên. Ew dikevina zorê de.

Lê ew jî ji xwe pirs dikin ku Zerdeşt di serê xwe çawa gihiştîya wan pirsan û wilqas pirsan. Ew jî, wê pirsê ji hevdû dikin. Lê ew pirs jî di serê wan de bêbersiv a.

Lê Zerdeşt di pirsên xwe de isrer dike. Wan dipirsê. Çi bersivên wan oldaran hena, ji wan digirê. Çi zanîna wan heya fêr dibe. Çi aqilê wan heya dihilde. Çi gotina wan heya, ew jî dibêjin. Lê ew jî ji Zerdeşt re têr nayê.

Zerdeşt, pirsên pirr zor dike ji wan. Li ber pirss pirsîna wî, ew dikevina zorê de. Nikarin bersivê bidina wî. Zanîna wan têr nakê û nagihê. Lê Zerdeşt, ji ya xwe nayê xwerê. Zerdeşt, her pirsa ku dike, di serê wî de zelal de û dixwezê ku bersive ji wan re bêne. Piştre bi demekê re Zerdeşt bixwe jî dibîne ku zane, oldar û rêmildarên wan jî ji hemû pirsên wî re nikarin bersivê bigihênin. Bersivan wan, an jî tûna ya.

Herweha li ser sûriştê weke av, agir, hewa û axê dihizirê. Zerdeşt van herçar tiştan, axê, avê, hewa û êgir, weke bingihîn dibîne ji hemû tiştî re. Ev herçar tişt, berî wî jî, bi wan dihat bawer kirin bi vî rengî. Lê Zerdeşt, wan bi têgihiştin dike û wê çawa bike bersiv, li dûv wê ya. Bi wê re, rastteqîniyê dibîne. Ew dihizirê ku dema ku "mirov van kifş dike, wê nikaribê bi rastteqîniyê pêde herê jî.

Zerdeşt, êdî li ser hizir pêde diçê. Ew zanînê, weke aliyekî giring ê jîyanê û mirov dibîne. Ew mirov dike şê beş. Beşek ji wan hersê beşan ´hiş´ a. Bi wê re jî, ew zanînê kifş dike û dixwezê ku bi wê êdî pêde herê. Lê bo wê jî, ew divê ku bersiva pirsên di serê xwe de bibîne û xse gihijêne wan. Bi vê yekê, ew pêşî, oldarek namêne ku ew pirsên xwe ji wan nakê. Ti kesek namêne ku ew serî lê nadê. Lê ti kesekî ku bersivna ku wî têr bikin, nabîneê. Lê Zerdeşt, ji ya xwe nayê xwerê. Ew li dûv pirsên xwe diçê. Ji bo wî, ew weke destpêkeka giring û mazin a.

Zerdeşt, di wê demê de, hê 15 salî bûya. Ew di wê temenê xwe de, bi wê rengî pirsên weke ku mirovên ku li pirsên dî dihisênin û dibêjin ji xwe maztir dike.

Zerdeşt, êdî piştî wê demê û rewşê re jî, wê weke yekî mazin wê were li berçav. Ew êdî ji aliyê herkesekî ve tê nasîn. Ew, her sê rewşên ku hatina serê wî û di dawîya wan de ku ew hê jî li jîyanê ya û sax a, ev bi serê xwe weke nîşanaka ji yazdanê mazin dihê dîtin. Gelek oldar û rêmildar jî, êdî bi vê hizrê bawer dikin. Lê gelek ên ku bawer nakin jî hena. Oldarên ku li dijî wî bûn, piştre jî, ew ink û inta xwe ya li dijî wî domandin. Lê êdî ti kesekî bahse ji wî ne dikir.

Zerdeşt, piştî wê demê jî, wê demeka dirêj li malê bimêne û wê xwe bide xwandinê. Nivîsarên pîroz ên ku li parastgehê, wî hemû xwandina û fahm kirina. Wî, di wan de jî, gelek bersivên xwe dîtina. Lê ew, hê jî, di serê xwe de, weke ku xwe têr nabînê. Bersivên ku wî ji pirsên di serê xwe de dîtina wan têr nabînê. Zerdeşt, hê jî, dixwezê.

Di wê demê de bi pirsîna ji aliman û bi bersivên ku ew dihilde û bi xwandina nivîsarên kevn û ên heta ku wê demê hatina, hema bêja hemûyan Zerdeşt wê wan bi qûrtênê.

Lê Zerdeşt, êdî wan jî ji xwe re têr nabînê. Ew êdî, ji dema zaroktîya xwe jî buhurîya û ciwanekî bi tevger û zîndî jê derketîya. Di wê demê de Zerdeşt, wê çîya û daristan û bîstanên ku li dorê hena, wê cihekî jî ji wan nehêle û wê herê wan. Wê, wan cihên ku bahse wan dihê kirin, wê ew wan bi çavên serê xwe bibîne.

De ne, tê gotin ku dîtinek, bi hezar gotinên ku mirov biguh his bike ya. Wî jî, hema bêja, hemû der û dever biçavên serê xwe dîtin.

Zerdeşt, ew şikefta ku oldaran ew danîbû wir bo mirinê, ew piştre jî diçê wir û li wir dimêne. Li wir, dirûnihê ji xwe re dihizirê. Di wê demê de jî, çi di serê xwe de gihiştiyê de bi kirina pirs û pirsînê bê, û ankû bi awayekî din bê, wê yan bi pirsê û yan jî bi hizirkî wî parve bike. Wî, dixwest ku di serê xwe de, xwe bigihijêne deverna din ên hê bilind. Wî, wusa di xwe de hîs dikir. Ew hîsa wî ya di wî de, ew li dûv xwe dikişand. Zerdeşt jî, xwe li bayê wê berda û diçû.

Zerdeşt, piştre ku demekê dirêj li male xwe dimêne û bi wî rengî diçûn û hatinê dike, wê piştre ji malê herê. Ew ji wir diçê Çiyayê Sabalanê. Çîyayê Sabalanê, wê ji bo Zerdeşt, bê destpêkek nû. Bo Nebî Mûsa Çîyayê Sîna wate wê çi bû, bo Zerdeşt jî, wate Çîyayê Sabalanê ew a.

Li wir, Zerdeşt, wê demeka dirêj li wir bicih bê. Wê li xwe bihêsêne. De ne, dihê gotin ku mirov hinekî bi xwe re ma û li xwe hisand, mirov wê hinekî din dunyê fahm bike. Lê Zerdeşt, di wê demê de ji wê zêdetir dikir û dixwest ku bigihijiyê de. Zerdeşt, piştî hat çîyayê Sabalanê, wê li wir demeka jîyane xwe ya ne kin wê li wir bi buhurêne. Ev demeka wî, weke demeka ku giring a. Li wir, wê Zerdeşt, dengê yazdanê mazin jî his bike.

Li wir, Zerdeşt, di serê xwe de, li ser pirsên di serê xwe de dihizirê. Di serê wî de gelek pirs hena. Ew di serê xwe de, dikeve hizran de û bi kêlîkan û heta ku carna ku roj li ser hevdû dikir, wê rûnihê bihizirê. Wê di serê xwe de, herê û bigihijê deverna din. Wê laşê xwe li wir bihêle û wê bi gîyane xwe re bikeve rêwîtîyê di gerdûnê de. Wî, bi wî rengî, gerdûn ji xwe re cihekî jîyanî ku ew têde karibê tevger bike.

Li ser ´jîyane çî ya, mirov û jîyanê, xweza û hewirdor, rastî û rastteqînî, Mazin û piçûk, laş û gîyan, hiş û zanîn, û hwd, wê hizir bike. Zerdeşt, hewl dide ku hişkirin û ankû têgihiştina ku xwe di serê me de şaq da, li ser wê dihizirê. Li ser Sedema wê dihizirê. Ji ber çi û çawa hiş bû. Gîyane mirov û laş mirov çina û çawa na, çi têkilîya wan bi hevdû re heya û hwd, li ser wan dihizirê. Zerdeşt, gîyanê, laş û hiş, weke sê beşên giring û bingehîn ên mirov jîyanî dibîne û kifş dike. Weyna hiş di jîyane de bi heyîna wê re dihêne ser ziman. hiş, bi zanîna wê re, ji xwe dema ku hizir dike, dibîne. Bi wê re jî mirov dibîne, mirov ku dît, êdî wê di rêya xwe de karibê bimeşê û herê. Aqil, karekî wê yê herî giring jî ev a. Hiş, bo fahm kirinê ya. Fahmkirin, têgihiştin a. Têgihiştin, rastîya mirov ya ku em têde na. Jîyan bixwe jî rastîyeka. Ew rastî, di nava xwe de û di temenêx we de rastteqîniyekê di hawêne. Ti tişt, ne bê rasttqîniyê.

Zerdeşt, li çîyayê Sabalanê, wê li wir, di serê xwe de, rastîya gîyanê û jîyanê ji xwe re bike mijar û wê li ser wê bihizirê. Bi gîyanê re rastteqîniyekê dibîne. Di jîyanê de, rastîyekê dibîne. Di hiş de fahmkirinê jîyanê dibîne û kifş dike.

Zerdeşt, di dema xwe de, serî pirr mazin li ser têgihiştinê û fahmkirinê wastand. Wî, di xate Mîtra û Ahûra Mazda de dimeşê. Ew, xwe weke rêvanê yazdanê mazin dibîne.

Zerdeşt, di jîyanê de cihê zanîn, heyîna mirov û gîyanê û weyna wan dixwezê ku bibîne. Oldarên olî jî, divê ku çawa bibin, çawa tevbigerihin, têkiliya di nava wan de çawa bê û têkiliya wan ya di nava yazdanê wan de çawa bê, wê dike ku bêne berçav û bide fahm kirin. Bi vê yekê, re hîyererşîyekê jî di nava wan de didêne. Oldarên rada pêşî û yên li bin

wan re kar û erka wan çî ya, wê jî kifş dike. Bi wê re jî, hizirkirinê derdixe li pêş. Ew, bi wê re jî, wê di aslê xwe de demeka aqil ya bi hiş denezêne. Ew aliyê sêyemin ê bi hiş ê ku wî hanîya ser ziman, dike û dixwezê ku wê serdest bike.

Zerdeşt, di dema xwe de, giringiya hiş kifş dike. Ew dîbînê û fahm dike ku divê ku êdî hiş were bikarhanîn û di nava hiş de were ser ziman. Zerdeşt, wê cara pêşî li Çîyayê Sabalanê, di ancama wan hizirkirinên xwe yên kûr û dûr de, wê destpêka avêsta jî bike. Hizrên Avêsta, wî, pêşî di serê xwe de girtîna û pirr zelal kirina û serdestîya xwe li wan kirîya û piştre bidest naqşkirina wan kirîya.

Ev dema Zerdeşt, weke demeka ku divê ku mirov wê bi teybetî fahm bike. Zerdeşt, bi teybetî li ser Mîtra dihizirê û wî fahm bike. Di çavika wî re dinerê. Mîtra, aqil pêşnîyar kiriya û hiş pêşxistîya. Bi wê re jî, di çerçoveya vacake de bûya xwediyê nêzîkatîyekê. Ev nêzîkatîya Mîtra, wê ji li vir giring bê bo me jî û Zerdeşt jî bo fahmkirin.:

Mîtra, di dema xwe de, gayê xwe yê ku wî ji xwe re weke yazdan dîtîya, hemû tiştê ji dilê xwe ku hişkiriya hêvî kiriya. Lê hêvîya wê ne hatîya li cih. Piştre jî bi ser de, gayê wî ji dest ravîya. Mîtra, êdî rabûya û ketîya pey gayê xwe de û ew girtîya û hanîya malê. Piştre jî, wî hizir kiriya û li gayê xwe nerîya û weha gotiya "yekî li ser te re jî heya. Ew yazdanê mazin a." Mîtra bi vaca xwe û hiş gihiştîya wê ancamê. Bi wê re jî, êdî Mîtra gayê xwe li wir gûrandîya. Bi wê re jî, êdî bawerîya xwe ya li gayê xwe gihandiya yazdanê mazin.

Mîtra, piştre bi ev tevger û hizrên xwe yên bi wan re hanî ser ziman. Bi wan re hişek û hizrek da hewirdora xwe. Mirov, bi hiş kir di derbarê navbê yazdanê mazin de. Bi wê re jî, êdî ji wan re got ku "yazdanê wê, ew a ku wîn wî nabînin û ew ser we hemûyan re ya. Wîn wî nabînin lê ew we dibîne. Ew afrînerê hemû tiştî û jîyanê ya. Ji wî hêvî bikin." Mîtra, bi wê re jî, êdî hiş û vac bi hevdû re hunand û hizrên xwe bi wê hunandinê re hanî ser ziman. Wî hizrên xwe li gorî wê hanî ser ziman.

Mîtra, di dema xwe de ku di dema hûrî û mîtannîyan de, wê bi vî rengî êdî dema xwe bide destpêkirin.Wî, hizra xwe hanî ser ziman. Dema aqil pêşxist. Ola xwe, wî afirand û pêşxist. Cihên ´**Laleş**´ê, hê di wê demê de pêşketîna û di wan de berg dihê kirin. Mîtra, weke pêxemberekî weyna xwe hanîya li cih û ola xwe afirandîya. Wî weke ku çawa ku ola xwe afirand, wî kira malê xalkê jî. Bi wê re jî, pêvajoyên wê ên pêşketin û pêşxistinê dane dest pê kirin. Oldarên Mîtra Metranan, wê serdemeka mazin ya wê hizra Mîtra pêşbixin û bidina domandin.

Zerdeşt, heta ku dem hatîya dema wî, êdî wî dîtîya ku çîqasî pêşketinaka mazin bûya. Wî hizrên Mîtra baş û qanc bi hîmê wan re dîtîya û fahm bikirîya. Di wê çavika Mîtra ya bi aqil re wê Zerdeşt jî binerê. Her wusa, bi wê re jî, wê êdî hiş ku weke beşa sêyemin a bo wî, wê derdixe li pêş bi gîyan û laşê mirov û jîyanê re.

Zerdeşt, piştî ku hatibû çîyayê Sabalanê, li wir, êdî wî destpêka xwe ya bi dema xwe re êdî dabûbû dest pê kirin. Wî rastî fahm kiribû. Zerdeşt, têgihiştina wî ya destpêkê ya ku ew digihijiyê de ew ku "hertişt li rastîya xwe divegerihê" ya. Bi vê yekê, şîrove dike. Mirov ku mir, wê goşt û hastûyên wî, herina axê. Ji xwe ji axê na. Wê xwûna wî herê avê. Ji xwe ji avê ya. Wê bêhna wî ya ku ew di dema ku dijî de ku dihilde û distand, piştî ku mir wê wê bêhnê ne stêne û wê ew herê hewayê, ji ber ku ew ji hewayê ya. Gotina Zerdeşt a bingihîn a "hertişt li rastîya xwe divegerihê", bi vî rengî temen hîm digirê.

Li vir, gotina ".. rastiyê" ku di hundurê hevoka ku "hertişt li rastîya xwe divegerihê" de ku dihê bikarhanîn di wateya "hîm(kok)ê heyî ê rast" ya. Bi wê wateyê ya. Zerdeşt, di serê xwe de, di lêgerînekê de ya. Di wê lêgerîna xwe de, dixwezê ku rastiyê û hîmê wê fahm bike. Bi pirs pirsînê dixwezê ku pêde herê. Her ku pirsek pirsî, piştre pirseka din dihê aqilê wî. Ew, wê jî dipirsê. Lê ku ew jî pirsî, wê pirsa din jî were aqilê wî. Wê êdî wê bi pirsê. .. Wusa li dûv hevdû pirs li dûv hevdû ya.

Zerdeşt, rastîyê dibîne. Lê rastîyê û gotina wê, bi hîmê wê re bi rastteqînîyeka ku ew dibîne re dibîne. Ew dike û dixwezê ku xwe bigihêne wir. Ew dixwezê ku wê rastteqînîya di hundurê gotina rastîyê de û heta ku ew rastteqînîya ku ew rastî bixwe jî ku jê ya, wê fahm bike. Di xwezê ku xwe bigihêne. Zerdeşt, di vê temenê de, weke ku di tekoşînekê de ya. Ew, ji ber ku wusa wî kifşkirîya, êdî di ya xwe de, zelal a. Bi wê re jî, êdî dema ku ew dikeve axiftinê bi mirovan re û ankû dipirsê û ankû jî pirs ji wî hatin kirin, ew ne bêbersiv a.

Piştî ku hat çîyayê Sabalanê, li wir êdî wê bi wî re di serê wî de demeka nû dest pê bike. Zerdeşt, rastîyê li wir bi navê yazdanê xwe yê mazin kifş dike. Ew, li wir, pêvajoya nû ya di ola xwe de dide destpê kirin. Bi wê yekê re, divê ku mirov bibêje ku Zerdeşt, rastî û rastteqînî li wir di serê xwe de bi hiş kir û ew bigîyan kir û piştre hanî nava mirovan û xwest ku bi wan bide fahm kirin. "Heyîna Yazdanê mazin, li ser hemû tiştî û kesî re ya." Mirov li dunyê, bi pêdîvî û pêwîstînîyên xwe û ên ku ji mirov dihên xwestin re dikar û divê ku bijî. Jîyane me, bi vê yekê û rengî girêdayî ya. Afirînerê wê heya. Afrînerê wê jî, yazdanê mazin a. Zerdeşt,

van rastîyan û hê gelek rastiyên weke van di serê xwe de zelal dike û dike ku bi mirov bide têgihiştin. Wî, pêvajoyaka têgihiştinî û olzanî a bi serdem bi xwe re û hizirkirina xwe re da dest pê kirin.

Dema ku em hewl bidin ku Zerdeşt fahm bikin, divê ku em hinekî Mîtra Fahm bikin. Lê dema ku em Mîtra Fahm nekin, em divê ku bizanibin ku wê aliyekî fahmkirina me ya bi Zerdeşt re wê kêm bimêne. Her yekê ji wan rastî û rastteqînîya dem û serdemekê ya. Lê Ew rastî û rastteqînî bi demê re afirîna û dem bi xwe re pêşxistina. Rengê demê û têre çûyin dîyar kirina.

Zerdeşt, di wê dema xwe ya ciwanîya xwe de xwe kişand ´înzîwa´yê li Çiyayê Sabalanê. Li Çîyayê Sabalanê, wê li wir têkiliya xwe ji nava mirovan bibirrê û wê tenê bi xwe re bimêne. Wê li xwe bihisêne. Li xweza û hewirdora xwe bihisêne. Weke ku dema ku wî dihisand, wan tiştin ji wî re digotin. Hin tişt ji wî re dihanîn ser ziman. Wî, weke ku dengê wan dikir. Ji xwezayê fêr dibû.

Wî, didît. Wî didît ku hemû tişt ji xwezaya ku yazdanê mazin çêkiriya ya. Bo vê yekê jî, wî kifş kir di serê xwe de ku "wê hertişt ji xwezayê bê û wê piştre di dawîyê de wê vegerihê li xwezayê". Yanî, tiştek, dema ku afirî, ji hîmekî di afirê. Ew tişt, li gorî wî, dema ku em hewl bidin ku fahm dikin, divê ku em wê hîmê ku ew jê jî ya dikarin fahm bikin û divê ku mirov fahm bike. Weke ku çawa ku mirov goşt û hastûyên mrov ji axê na û piştî ku em mir in ew jî wê çina axê û bina ax. Xwûna zîndîyan û heyînan ji avê ya û wê piştî mirinê wê ew jî herina avê. Bêhn, ji hewayê ya, piştî mirinê ew jî wê li wê vegerihê. Her tişt, ji tişta ku jê afirîya vegerîna wê heya. Ev rastîya teqez ku mirov nikarê înkar bike ya. ..

Zerdeşt, dema ku di nava xwezayê de dimêne, dibîne ku mirov zad û xwarina xwe jî ji wê xwezayê digirê. Hemû tişt bi wê re dihê. Ax û ard di afirêne. Ew jî, afrînerîyên hîmî na. Lê yê ku ew jî afirandî heya. Bi wê jî, mirov wê kifş dike.

Lê Zerdeşt, tiştekî din di serê xwe de kifş dike û dibêje. Ew jî her weha ew ku ew dibêje ku "hertişta ku heya li jîyanê bi ya dijberê xwe re heya. Yanî, yek rast û ya din vajî wê ya. Ev jî, destûraka bi wê xwe afirandinê dibe ya. Roj bê şev, jin bê mêr, najîn. Zarok, bê dê û bav nabin. Nikarin jî xwe biafirênin. Di vir de, hertişt hevlingekî wê û ankû rêhevalekî wê heya. Di gerdûnê de jî Ahûra Mazda, dema ku afirî, li ber Ahrîman Afirî. Piştre dema ku mirov afirîn, ew jî di nava xwe de bi wê rengê afirîin. Yek nêr û ya din jî mê ya. Nêr û mê, hevdû temem dikin. Hevdû diafirênin. Ev, ne tenê bi mirovan re, hemû xwezayê re wusa ya.

Bi ajal û sawalan re, bi lebat û benatan re û hwd, bi hemûyan re wusa ya. Ev destûreka û li gorî wê destûrê afirîn dibê. Ev, bi jin û mêr û ankû bi nêr û mê re jê re hevling û ankû heval tê gotin. Di nava ajal û sawalan de, jê re ´coht´ tê gotin. Di dema bi hevdû re bûyînê re jê re ´cêwî´ tê gotin. ..

Duîtîya jîyanê, hinekî jî, cêwîtîya wê dihêne ser ziman. Cêwîtîya wê, bi wê re dihêne ser ziman. Cêwîtî, li gorî zîndîyan rengê destûra wê diguharê. Cêwîtî û ankû duîtî, hîmê afîrîn û bûyîn û pêşketin û pêşveçûna jîyanê ya.

Zerdeşt, di dema ku ew li çîyayê Sabalanê dikeve ´înzîwa´ya xwe de, ew li ser vê yekê pirr dihizirê. Demên dirêj dide vê hizirkirinê. Bi wê re jî, li ser mirin û jîyanê, heyîn û neyînê, gerdûnê û hwd dihizirê. Gerdûna ku em têde na, çawa pêş dikeve û çawa ya. Em li dunyê dijîn. Lê li dervî me jî jîyan heya. Ev bawerî jî heya. ..

Ji ber vê yekê ya ku bi bawerîya daeva, ´gîyane ne qanc´ jî, ji ber ku di ahangekê de ya bi ‘gîyane qanc’ re, rêzêkê distêne. Ew rêz ji wê ahangê re ya. Bi ne qanciyê, qancî xwe nas dike. Mirov, di nava wê duîtîyê de dijî. Bo vê yekê aliyê wî yê xirab û ê qanc jî heya. Di ahangekê de dijî. Dikarê bi herdû aliyan de jî herê. Duiîtîya Zerdeşt, gerdûnê û jîyanê bi destûrekê dihizirê.

Mirov, di nava jîyane de weke zîndîyê ku dihizirê û bihiş bûya. Ev teybetmendîya mirov a. Mirov ku bi hatina dunyê wê bidest dixe. Lê piştî ku mirov wê hiş jî herê. Lê gîyan, nemir a. Laş û ankû goşt û hastû, diçina axê. Lê hertişta ku ji holê rabû, bo afirîna din ya nû ku wê bibe jî hîm a. Yanî, gîyan darêjkê diguharênê di xwezayê de. Ev darêjk guharandina gîyanê, wê dayimî bê. Heta ku dunya hebê, wê ew jî hebe. Gîyan, wê laşê nû ji wê re biafirê. .

Gîyan, dikarê bihizir û bihiş bike. Di dema ku mirov bilaşê xwe heya, mirov xwediyê çi teybetmendiyê ya, wê gîyane jî, xwediyê wê bê. Ew, hişê wê afrînerê mazin a. Gîyane li ser hemûyan re, kifşkarê hemûyan a.

Dema ku em bahse gîyanê bikin, divê ku em bibêjin ku gotina "cin" hinekî jî li vir afirîya û bûya bi teybetmendî. Cin, weke zîndîyekê gîyanî ku dikarê xwe bike hemû awa û wêneyan de ya. Dihat gotin ku dema ku Adam û hewa bûn, û piştre mirov jî ji wan bûn, hingî cin jî ji wan bûn. Lê dema ku ew bûn, ew xoslet û teybetmendiyên wan ji yên mirovan cuda bûn. ..

**Zerdeşt, di înzîwa´** xwe ya li çîyayê Sabalanê de, wê xwe bi jîyanê bi hiş bike. Wê hîmê jîyanê û bûyîna wê ku çi ya, li ser wê serî biwastêne û hewl bide ku fahm bike. bi wê temenê, ew pirsên xwe yên ku wî di

temenê xwe yên piçûk de ku ji oldaran dikirin, di nava jîyane xwezayê de, ew li wan dihizirî û hin bi hin bi wan re digihişt hin bersivna hîmî. ..

---- -----

Zerdeşt, piştî ku oldaran ew danîbû ber devê şikeftê ku ew dêlagûr wî bixwe û piştre, êdî ku ew li jîyanê mabû bû, êdî li welêt li Vaejah jî rewşek nû afirî bû. Ne tenê li Vaejah, li hemû deverên welêt, nav û dengê Zerdeşt hatibû bihîstin. Piştî ku ew ji wir jî xilas bûbû, êdî piştre li malê demeka dirêj dimêne. Di wê demê de, ew xwe dide xwandin û fahmkirinê. Di wê demê de, pirsên ku ew dike, herkesekê şaş û matmayî û acêbmayî dide hiştin. Ew oldarên ji her tiştî re bersiveka wan ya amede hebû, li ber pirsên Zerdeşt, bêbersiv diman. Ya ku êdî ew dikira Zorê de jî ev bû.

Lê piştre Zerdeşt, êdî li malê namêne. Li gelek dever, çîya û bistanan digerihê. Hê ku ew ciwan a, tê çîyayê Sabalanê û li wir êdî demeka xwe ya din dijî. Li wir ew dengê yazdanê xwe dike. Li wir, ew dengan dike.

Zerdeşt, piştî wê serborîya li şîkeftê jî, êdî ew weke yekî ku ji aliyê yazdanê mazin ve dihat parastin jî dihat dîtin. Lê gelek oldarên ku ne di wê baweriyê de jî bûn hebûn. Yên ku ne di wê bawerîyê de jî bûn, digotin ku "ew mayîna wî, isrera belaya ku wê were serê me ya." Bi vî rengî jî şîrove dikirin.

Ew piştî ku hatibû çîyayê Sabalanê, êdî li ê dayika wî dugdova û bavê wî Poruşaşpa bixwe mabûbûn. Lê ew jî, çend ku li dora wan ji malîyên wan gelek mirov hebûn jî, êdî ew dibîra Zerdeşt de bûn. Bîra wî dikirin. Lê deng ne dikirin. Ew jî, wilo di jîyane xwe de di wê asayîya wê de dijîn. Zerdeşt, berê ku ji cem wan herê bi gelek oldaran re ketibûn nîqaş û danûstandinan. Wî gelek pirs ji wan kiribûn. Lê pirranîya wan pirsên wî jî, wî bersiv ji wan re ji wan oldaran ne hilda bû. Ji wan pirs û hizrên wî yên ku ji dema Nîqaşan ku di serê oldaran de mabûn, oldarên ku li dijî wî bûn, êdî li ser wan re digotin ku "Zerdeşt ji olê derketîya". Di gotin ku "Zerdeşt, ne weke ku me û ola me ku heta nûha me hanîya ser ziman ew têne ser ziman." Hizrên wî cuda didîtin. Bi wê re jî, êdî ev gotin digotin. Lê gelek oldaran jî, ev yek red dikirin û herê ne dikirin. Yên ku li dijî wê jî derdiketin, di gotin ku "Ahûra Mazdanê, xwediyê aqilê herî mazin a û wî aqilekî mazin kirîya serê Zerdeşt de." Ahûra Mazda, aqil jî û zanîn jî ji wî dihat pirsîn. Ku wî xwestiba, kî jî ba, wê aqilekî mazin û zanînaka mazin bikira serê wan de. Weke ku oldaran digot "wê wî kiriba ku ew mirovê ku Ahûra Mazda aqil kira serê wî de, dikarê bike ku ew mirov bi aqil bifirê." "Yê ku bi aqil difirand jî Ahûra Mazda bû."

Bavê Zerdeşt û Dayika wî, piştî wî re xwe di rewşa xwe de dijîn. Bavê wî, di rewşa xwe de bû. Lê ew yekî ku oldar û pirr bi zane jî bû. Aqilê wî pirr mazin jî bû. Ew weke oldarek û heta ku rêmildarekî ku pirr bi zane ku bi aqilê wî hertimî dihat şêwîrîn jî bû.

Di wê demê de, wan ne dizanî ku Zerdeşt ku ka li kûderê ya. Piştî ku Zerdeşt ji cem wan çûya, gelek mirovên ku ew dîtina bûna. Di dema ku ew digihiştin cem male wî, ku bahse wî dikirin, bi heybetekê bahse wî dikirin. Bi aqil û rêzeke mazin bahse wî dikirin. Digotin ku "yekî ku mazin a". Di gotin ku "ew yekî ku oldar a." Di gotin ku "ew yekî ku yazdanê mazin aqilekî ku pirr mazin ku heta nûha nedayî ti kesekî daye wî û kirîya serê wî de." Her wusa, gelek gotinên din jî bo wî dihatina gotin. Zerdeşt, herkesekê ku ew dîtîya, di bin bandûra wî û axiftina wî de maya.

Dema ku Zerdeşt diaxift, ku mirov lê dihat, mirov ji dil hema wusa dixwest ku lê bihisêne û ew bixivê. Tenê, di wê demê de mirov ev ji dil dixwest. Gotinên ku ji devê wî derdiketin bi zanebûn. Her wusa, gotinên ku wî digotin jî, bi wî dengê xwe yê tişî û ji kûrahîyekê ku derdixist jî, bi wê bandûraka mazin li ser mirovan diberda. Zerdeşt, di nava xalkê de, li ser rewşa xalkê û xizanî û dewlemeniyê pirr axivîya. Gilihê xwe ji xizaniyê kiriya. Li ser Stêrzanî û jîyan û mirov pirr diaxift. Wî, mirov, weke heyîneka giring, di nava axiftin û têgihiştin û zanîna xwe de bicih kiribû. Li ser zîndî û jîyane jîyanê û rewşa jîyane zîndî, axiftinên wî yên mazin û bizane bûna. Mirovên ku lê hisandina jî, ew gotinên wî, di hişê xwe de girtin û piştî ku cihê ku çûnê de ku li wir ji Zerdeşt bahs kirina, bahse wan gotinên wî û zanîna wî jî kirina. Bi teybetî, li ser Stêran û zanîna wan pirr xwedî fahm bû.

De ne, her oldarek, her wusa hinekî rêmildarîya wî jî hebû. Hinekî rêmildarek jî bû. Di derbarê stêrzanî û azman û hemû heyînên di wê de xwediyê zanînekê bû. Li ser wê dihizirî. Li ser rewşa wê û afirîna wê û pêşveçûna wê dihizirî. Li ser rojê, wî pirr hanîya ser ziman. Roj, hinekî bi dagerîya navê yazdanê mazin jî dihat dîtin û ser ziman. Bo vê yekê, Zerdeşt car bi car bi gotinî bahse wê kirîya û şîrove û salixkirinên nû bi wê re dane kirin.

Mirov, piştî ku hişê wî pêşket û pêde, hertimî hizreke ku ti carî ji serê wî û hişê wî û ji bîra wî derneket hebû. Ew jî, firîna mirov bû. Bo vê yekê afsûn ku bahse wê dihat kirin, dihat gotin ku "mirovê ku telîya xwe hejand û bi wê ya ku hizir kir hanî li cih." .. Lê dervî wê jî, ajal û sawalên ku difirîn hebûn. Minaq, teyrik û hwd. Teyrik difirîn. Pirrên teyrikan

hebûn û bi wan difirîn. Ew jî, heybeteka yazdanê mabû ku afirandibû li jîyanê. Zerdeşt, ev wusa didît. ..

Lê Zerdeşt digot ku "tişta ku mirov bi çavê xwe dît, êdî mirov karê wê bike." Yanî, dema ku mirov li teyrikekê ku difirê ku mirov ew dît, mirov jî wê karibê bifirê? Li gorî wî, ev yek bi derfet bû. Wî, ev rewş, bi xoslet û teybetmendiyan dihanî ser ziman. Mirov bi aqil bûya û bûya xwediyê sehêtê. Lê li gorî Zerdeşt, her zîndîya ku heya, bi hîsî bê û bi awayekî din û hwd bê, awayekî hizirkirina wê heya ku ew dikarê bi wê bijî.

Zerdeşt, di dema ku diaxift, sê tişt pirr giringî dida wan ku di axiftina xwe de weke hîm wan bigrê. Yek xweza ku mirov bû. Ya din mirov ya din jî azman û stêrk û hwd ên têde bûn. Rêmildaran, pirr giringî dide azman, stêrkan û hwd. Ji wan, hewl didan ku baxtê mirov fêr bibin. Her tişt, bi baxt a. Bo ku mirov fêrî baxtê xwe bibe û ku wê di dema pêşaroja mirov de çi derkeve pêşîya mirov, hin nîşanaka hena. Ku mirov ew nîşanak rast kifşkirin, mirov wê êdî zanibê ku baxtê mirov jî çî ya. Ev yek, weke rastîyekê dihat zanîn û pê bawer kirin.

Bavê Zerdeşt bixwe jî, yekê ku di derbarê stêrzanîyê de xwediyê zanînaka mazin bû. .. Bi wê jî, oldarekê ku aqilê wî mazin bû. PIştî Zerdeşt jî, hertimî li dora wî mirov digihiştin li hevdû. Lê ew êdî yekî pîr bû. Qadrê wî yê pîrîtîyê jî hebû.

Lê dema ku wî bixwe jî, dema ku mirovên ku dihatin û li civate wî dirûniştin û digotin ku me li filanderê Zerdeşt dît û ew yekî wusa bi aqil û zanebûn bû, hinekî jî serê wî jî bi wan gotinan bilind dibû. Kêfa wî dihat. Dilxweş dibû, ji wan gotinan.

Lê bîra kurê xwe jî dikir. Gelek tişt û serorî hatibûbûna serê wan û kurê wan. Dema ku bahse Zerdeşt bi xweşî û qancî dihat kirin, êdî ew ne tenê dilxweş dibû, her wusa ew demên ku wan bi nexsweşî jînkiribûn dihatina berbîra wî. Di wê demê de jî, çend ku Zerdeşt ji wir çûbû bû jî, oldarên ku ink û inta xwe dabûbûna wî, hê jî dijberîya xwe li wî dihanîn ser ziman. Di gotin "zerdeşt ji olê derketîya.".

Dema ku bavê wî ev gotin dibihîstin, pirr biw an diêşîha. Dilê wî diêşiha. Xamngîn dibû. Lê tiştek ne dikir. Wî jî, di got "na, ew ji olê derneketiya. Ew hertimî di rêya yazdanê xwe yê mazin de meşîya." Bi vî rengî, wî ew diparast.

Zerdeşt, gelek hizrên nû di serê wî de hebûn. Ew hizrên wî, di dema ku wî dihanîna ser ziman de, bitememî ne dihatina fahm kirin. Bo vê yekê jî, ya hesan ew bû ku li ber wê bibêjin ku ew ji olê derketîya. Lê Zerdeşt, zanînaka mazin di serê wî de hebû. Wî, her gotin û her hevoka

olê bixwe jî, ji nû ve pirr xort û mazin şîrove dikir. Wî, di wê xate de, weke ku bi demê re ji nû ve ola xwe dihanî ser ziman. Wî, aqil derxist li pêş. Ev, weke teybetmendiyeka wî ya sereka jî bû. Aqil, wî hertimî derxistibû li pêş.

Zerdeşt, qadrê mirov û qadrê jîyanê dizanî. Bi wê dihanî ser ziman. Wî, didît ku hiş wê êdî çawa pêş bikeve û serwer bibe li jîyanê û li mirov. Êdî wî, dixwest ku wê bide li berçav. Zerdeşt, hiş weke beşa sêyemin ya heyîna mirov didît. Bo vê yekê, wî ew derxist li pêş. Li ser wê pirr sekinî. Hizirkirina wî, bi vê yekê bi hiş bû. Wî, dixwest ku bi tememî bi hiş û zanînê werêne ser ziman. Û dihanî jî.

Lê yên ku Zerdeşt fahm dikirin jî hebûn. Ew jî, yên ku êdî ew diparastin bûn. Ên ku dibûna aligirên wî bûn. Her wusa, li cem male wî bixwe jî ev yek wusa bû. Di dema ku Zerdeşt li malê, pirsên ku wî dikirin, ên ku ew fahm dikirin, piştre jî maf didina wî û digotin ku "ew rast a". Bi wê yekê, di wê dema ku hinek oldaran digotin ku "ew ji olê derketîya" jî, li cem bavê wî, weke mirovên ku bersiv didane vê gotinê ev jî hebûn û digotin ku "na, ew ji olê derneketiya." Ew diparastin.

Zerdeşt, Piştre çûbû bû. Ew pêşî li gelek deveran gerîya bû. Piştre jî hatibû û li çîyayê Sabalanê mabû bû. Li wir, ketibû nava hizran de. Li wir wî weke ku têkiliya xwe ji jîyane xwe ya berê qûtkiribê lê hatibû. Ew dihizirî û gelek pirsên ku wî bersiv ji bo wan negirtibû ji oldaran, ew li ser wan dihizirî û xwe digihanda bersivan wan di serê xwe de.

Male bav û dîya Zerdeşt, di wê demê de rewşeka wan ya teybet afirî bû. Lê herdûyan jî, ji Zerdeşt bi êmin bûn. Ji wî bi bawer bûn. Zerdeşt, mirovekî ku hê di piçûkatîya xwe de bi aqilî û zanebûna xwe ku dabû bû herê kirin. .. De ne, tê gotin ku di nava xalkê de ku "mirov ji piçûkatîya xwe ve kifş a." Ew jî, yekî wusa bû.

---- ----

Zerdeşt, ew demeka dirêj bû ku hatibû Çîyayê Sabalanê. Li wir, wî sal li ser salê kiribûn. Wî li wir xwe dabûbû hizirkirin û tefkîrkirinê. Wî, xwe dabû bû fahm kirin. Li ser wate û rastiyê disekinî. Wî, di serê xwe de, bi vî rengî, xwe dabû bû hizirkirinê.

Zerdeşt, di wê demê de êdî bi wan salên xwe yên ku li wir maya, weke ku were jibîrkirin li pirr deveran jî bûbû. Lê Wan oldarên ku li dijî wî bûn, ew ti carî ji bîr ne dikirin. Hema bêja her roj, ku navê Zerdeşt ne hildaban ne dibû. Zerdeşt, Li çiyayê Sabalanê, wê li wir, xwe ji rewşekê hildê û bibe û bike rewşeka din de, ku bi aqil, zanebûn û hiş û hwd.

Ew cihane mirov têde dijî, çawa bû û çawa afirî bû? Jîyane ji ber çi ya? Armanca Jîyanê çi ya? yazdanê mazin, bi wê gelo xwestîya ku mirov bike azmûnekê de? ...

Bi vî rengî li dûv hevdû wî bi dehan pirs ji xwe kirina û li ser bersivan hizirîya. Zerdeşt, di ancama hizirkirina xwe de gihiştibû wê hizrê ku "mirov dema ku jîyanê ma û jîya, wê hişê mirov pêş bike. Bi wê re, ne tenê wê laşê me bi hiş bibe. Wê gîyane mirov jî bi hiş bibe." Lê wî bawer dikir ku dema ku mirov mir wê hişê bi laşê mirov re ê mirov wê ew jî winda bibe. Lê Wî, hizir dikir ku gîyan jî, hizirkirinê dike. Ew, ya wê winda nabê. Yanî, du rengê hiş hebûn. Hişê ku rast ku wê mayinda bibe jî ew bû.

Lê wî, ev jî hizir kiribû û têgihiştibû ku "her çendî ku mirov bi hizir bû jî, her hizira ku mirov re çêbû, wê armanca wê ya giştî û yeka ne giştî wê hebe. Ya giştî wê bi gîyane mirov re di temenê rastîya mirov de bê. Yê din jî, wê xizmetî wê bike.

Di nava civatê de gotinak hebû. di hat gotin ku "mirovê ku bi aqilê mazin, mirovê ku ji xwe buhurî ya." Ev gotin, hinekan jî weke ji astekê buhurîna li astekê şîrove kirîya. Zerdeşt, temenê ji xwe buhurîna bi aqil di fahmkirin û naskirinê de dîtîya. Lê wî di berdewame wê de dubara gotiya ku "hertişt wê li rastîya xwe vegerihê." ..

Bi gotinê, dihêne ser ziman ku hertişt, rastîyeka wê heya ku ew jê çêbûya. ew rastî, ku hat fahm kirin û dîtin, hingî, mirov wê karibê bibêje ku mirov xwediyê zanîna bingihînî a hîmî ya.

Li ser vê hîm û bingihî, wî duîtîya jîyanê dihanî ser ziman. Lê wî, yek bi hêzekê dihanî ser ziman. Roj, çendî ku aliyek û hêzeka, şev jî aliyek û hêzek a. Ev hêz bi hevdû re têdikoşîhin. Ew tekoşîna wan, dewrûdayîmtiyê diafirêne di nava roj û şevê de. Şev, reş a. Reş, hêze ne qanc dihêne ser ziman. Roj, rohnîya. rohnî, hêza qanc dihêne ser ziman. Lê herdû jî, baxtê wan bi hevdû re girêdayî ya. Bi wê re jî, jîyan, xwediyê hîm û temenê xwe domandinê ya.

Li gorî Zerdeşt, mirovê ku di naqabîna "aşa" û "drug" de tekoşînê dide, ku evîna Haoma û ava Anahîta xwe şişt û gîyane xwe hînik kir, wê li ser rêya rastîyê bi rastteqînî bimeşê û herê û bi serkeve. Aşa, ´rastiyê´ dihêne ser ziman. ´Drug´ jî, derewînê. Yek dike rêya qanc û ya din jî dike rêya xirab de. Ya rast, di jîyanê de, bi qanciyên mirov re, mirov bi ser dixe. Lê mirov gunahek kir, ew êdî wî dawiye wê newê û wê hertimî êdî xwe bide domandin. Li gorî Zerdeşt, kirina pêşî ku qanc bê û xirab bê, ku ji kîjanê bê, ew wê hinekî kifşkar bê.

Dubendîyeka ku hê berî ku Zerdeşt were çîyayê Sabalanê ku bi oldaran jîya bû, li ser mirov û navê mirov bixwe jî bû. De ne, heta wê demê de jî, mirov jî weke Boraq, hatîya dayîn. Mirov hatîya boraq kirin. Zerdeşt, mirov ´pîroz´ dibîne û rast nabînê ku mirov were boraq kirin. Bi vê yekê re, êdî ew dikeve dijî wan de. Li serê vê yekê, dubendî, ketibû nava wan de. Piştre, di demên piştre de, dema ku Zerdeşt, ji çîyayê Sabalanê tê û rastî wan oldaran tê, wê oldar pêşî hewl bidin ku ka Zerdeşt di wê hizir û bawerîya xwe de û yan jî na. Zerdeşt, mirov weke mazin dikir. Mirov di navaroka hizir û bawerya xwe de weke hîm û xale bingihîn didanî.

Dema ku Zerdeşt ji çîyayê Sabalanê tê, ku ew rastî oldaran tê û ew fahm dike ku oldar bi axiftin, û pirs pirsînên xwe re û gotin gotinên xwe re hewl didin ku wê hizra wî ya di derbarê boraq ne kirina mirov de fêr bibin, hingî Zerdeşt, vê hizrê dubara dike û dihêne ser ziman:

"Mirov pîroz in, divê ku neyêna boraq kirin. Sawalên ku şîr û hirîyê didin divê ku newina boraq kirin. Zaroya ku piçûka divê ku newê boraq kirin. Sawala ku bar dike û sûwarî lê dibê, divê ku newê boraq kirin. Ku dermalê ji ahlê malê re hatibê dermale kirin ew nesibê wan a û nayê boraq kirin. .."

Zerdeşt, piştre jî, li ser Haoma jî, diaxivê û dibêje ku "divê ku ava haoma newê xvexwertin" Ava haoma, şaraba ku dihat çêkirin û dihat vexwertin bûn. Bi wê mirov ji xwe diçû. Zerdeşt, digot ku "bo serxweşbûnê, vexwertina wê ne baş a. Ji ber ku mirov ji xwe dibe û mirov piştre nizanê ku çi dike." Bi wê re Zerdeşt, digot "mirov ku ji xwe çû, mirov wê tiştên xirab û ne qanc jî bike. Ew jî, ahrîman bi me dide kirin."

Bi wê re Zerdeşt digot ku "ma hiş ji ber çi bûya? Ne ji bo ku mirov bixwe bihisêne û bi wê ya rast bike ya? Di her demê de divê ku hişê mirov li mirov bê. Heya mirov, ji mirov û kirinên mirov hebe. Divê ku mirov ji kiryarên xwe yên ku kir ku qanc bî û xirab bê, jê berpirsîyar bê. Divê ku mirov rastiyê ji bîr nekê. .."

Zerdeşt, di van waran de, hê bêhtirî xwe kûr kiribû. Di wê dema xwe ya nû de ku derket ber oldaran, hingî oldaran dît ku wa Ahûra Mazda û Mîtra Aqil û zanîna mazin a bêsînor daye wî. Di wê dema ku rastî Zerdeşt hatin û dema ku li Zerdeşt hisandin, ku Zerdeşt çi gotin digot, wan lê dihisand. Ti gotina Zerdeşt, yekî jî ji wan ne dikarî gotinaka dijberî wê bibêje. Zerdeşt, her gotina xwe bi sedema wê re digot. Çima û ji ber çi got, wî ew jî bi bersivî dihanî ser ziman. Wî, hizrên xwe di

çerçoveyak sedem û ancamê de dihanî ser ziman. her gotina ku wî ya ku wî hanî ser ziman, dema ku oldarek jî lê dihizirî, sedema wê gotinê didît. Dema ku Zerdeşt got divê ku sawala ku şîr dide divê ku newê boraq kirin, sedema wê jî bi wê re dihanî ser ziman. Di wê çerçoveyê de vacaka gotina xwe diafirandin û wî gotina xwe dihanî ser ziman.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku zerdeşt, têkiliya li hevdûbûnê jî dîtîya û kifşkirinê. Bandûra têrkerê a li hevdû, wî dîtîya. Bi gotinê, ankû dema ku têrker(pêze û ankû bûjen) hat cem hevdû, têkiliya wan a li hevdû wî dîtîya.

Di jîyanê de, hiş bi jîyanê re û bi mirov re dema ku jîya û dît û kifşkir, piştî ku mirov mir, wê ew hiş û hişkirina wê, ew tiştên ku di jîyanê de bibîrkirina wê wan di jîyane piştî mirinê de bêne berçavê mirov. Bi vê rengî, ew dihêne ser ziman. Têrkiliya têrkeran a li hevdû heya. Di her tiştî de têrkeya ku heya, yek rast e û yek vajî wê ya rast a. Lê ew hevdû êdî di wî tiştî de temem dikin. Yanî, têrker û têrkera dijber û hwd.

Zerdeşt, dema ku derdikeve ber oldaran, hingî, oldar, bahse sazûmana yazdanê mazin jê dikin. Ew jî, dibêje ku "Sazûmanaka yazdanê mazin ku çêkiriya li azmana heya.Hertişt, di wê de bi hev ve girêdayî ya û di nava dewrûdayîmîtîyekê û gerûguherînê de ya. Mirina stêrkekî, destpêka stêrka dî an jî stêrkên din a.”

Zerdeşt, di zanîn û têgihiştina xwe de, hebûna tiştan ji hevdû dûr nayênê ser ziman. Bi hevdû ve girêdayî dibîne û dihêne ser ziman. Oldar, dema ku li hizrên wî dihizirin, dixwezin ku kêmesîyekê di wan de bibînin ku ji wir bigirin û bi wê herina bi ser wî de. Çend ku bi gotinên aqil û weke ku nû têne ser ziman jî Zerdeşt, lê Zerdeşt, bi zimanekî zelal dihêne ser ziman û di nava gotinên xwe de valahiyê û cihê nakokîyan nahêlê. Bi vê yekê, ew bersivên xwe yên ku dide têr û tîr dide. Her bersiva têr û tîr a.

Zerdeşt, piştî ku çû Çîyayê Sabalanê û piştre ku demeka xwe ya dirêj li wir ma û xwe li wir, da hizirandinê, piştre ku divegerihê, ew êdî weke mirovekî din a. Ew, ji asta oldarekî bi asttira. Ji kalekî, bi zanebûna xwe kaltira. Ji pîrekî, pîrtir bûya di serê xwe de. Ew, bi serê xwe bûya. Ew derketiya ser hemû kes û asta zanînê a ku heya jî.

Zerdeşt, piştî ku vegerîya nava gel, wê hiş zêdetir bi gotinên xwe re derxist li pêş. Wî, gîyan, weke heyîna nemirî ku piştî mirina mirov wê herê û bigihihê Ahûra Mazda didît. Bi wê re jî, wî hiş, wusa didît ku piştî mirinê re wê ew hişê me were û bigihijê me û wê êdî ku em çi jê bixwezin û bibêjin wê bike. .. Wî hiş wusa jî dihanî ser ziman. Yekî ku

başî kiriya, wê hişê wî, wê piştî mirina wî, derxe ber wî. Ku tiştekî baş jî kir, wê piştî mirina wî, wê derxe ber wî. Wê her mirov, ji wê kirina xwe ya ku derketî ber wî, wê berpirsîyar bê.

Kevneşopîya ku di nava olê de ji her tiştî re yazdanek dîtin, Zerdeşt red kir. Dema ku hat gotin ku Mîtra jî yazdan(êzda) e. Zerdeşt, ku "yazdanekî ku wî jî û min jî afirandî heya." Ew afrînerê me hemûyan a. Li ser me hemûyan re ya. Em, di rêya wî de dimeşîn. Bawerîya me li wî bêkêmesî û qûsûr a."

Bi vê rengî Zerdeşt, di aslê xwe de gelek guharandin hê di dema xwe de di destpêkê de da kirin. Lê di wê temenê de fahm kirina hizrên Zerdeşt û têgihîna wan hinekî jî weke ku Zor dihat. Zerdeşt, dema ku mirovekî ji nava wan, ji wî re gotina yazdan, hat bikarhanîn, wî red kir. Wî, got yazdan li ser hemûyan re ya. Wî em hemû afirandina. Bi vê rengî, Zerdeşt, hiş derxist li pêş. Hemû kevneşopî û pîrozîyên bi vî rengî ku weke kevneşopîyên hezar salan jîyane û heta wê demê heyîn û hebûna xwe domandin di jîyane xalkê de, Zerdeşt bi hiş û hişmendiyê û zanînê hanîn ser ziman. Bo vê yekê, wî hiş û zanîn wele aliyekî mirov ê sêyemin derxista li pêş û xwest ku bide têgihiştin.

Zerdeşt, heyîn û hebûna yazdan(xwûdê) weke ku oldaran digot red nekir û înkar ne dikir. Lê wî, navê yazdan, ji nava mirovan derxist ser mirovan re. Weke ku bi navê Ahûra Mazda re dihat ser ziman, navê yazdanê mazin li li azmana dihat dîtin. Oldaran û ankû Metranan(oldarên ola Mîtratiyê) digotin ku "roj yazdanê mazin a." Ev bi bawerî, ew bi hezaran salan bû ku hatibûn pê bawer kirin. Lê Zerdeşt, got ku yazdanekî ku ew jî çêkiriya û ew têhna wê ya germ dayê de jî heya.

Zerdeşt, di çerçoveyaka ku ti kesekî ne dikarî ku bi aqilê xwe li dijî aqil û zanîna wî rabê û besivê bi dijberîya wê biafirêne bû. Lê her wusa di wê çerçoveyê de jî bû ku di çerçoveya kevneşopîya pîroz û nirxên wê ên demê ên ku hena û bi hezaran salan domîyana re jî, ew rast ne dihat dîtin û weke yekî ku "yazdanê mazin înkar dike" dihat dîtin. Zerdeşt, tişta ku ew bû ku wî got ku "tenê yazdanek heya." li ser hemûyan û herkesekî re. Bi wî rengî, wî yên din hemû red kirin. Yanî, wî hêkel û peykelên êl û mergîyan red kir.

Di vê temenê de, dema ku em li Zerdeşt dihizirin, em dibînin ku wî hizirkiriya ku di çerçovaya aqil û zanînê de wê çawa olê bêne ser ziman û bide fahm kirin. Wî, hiş weke aliyê sêyemin ê mirov û jîyane mirov dît. Bi wê aliyê re, wî pêşketin dît û di nava wê de ol hanî ser ziman. Wî,

hemû tişt kir yek. Yekkirina di nava nirx û nirxandinên olê de, wî da çê kirin.
Oldaran, ev yek didîtin jî. Lê herê ne dikirin. Di gotin ku "wê çawa yazdanake afrîner û xwediyê hemûyî bê!" Ya ku fahmkirina wê ji oldaran re zor dihat û dikir ku ew li dijî wî rabin jî ev bû.

Lê Zerdeşt, piştî çûna wî ya çîyayê Sabalanê û dengkirina dengê yazdanê xwe, êdî ew guharî bû. Çend ku ew ne zêde pîr û kal jî bû, riha wî hatibû û mûyên sipî zêde ketibûbûnê de. Yên ku piştre bawerîya xwe pê hanîn, hinekî jî, ev rewş jî, weke nîşanakayê dîtin û hanîn ser ziman.

Lê Ne oldar ji ya xwe dihatina xwerê û ne jî Zerdeşt ji ya xwe dihat xwerê. Bi wê yekê, êdî li ber hevdû sekinî bûn. Zerdeşt jî, ev rewş didît. Vê rewşê jî, wî diêşand. Êş dikira dilê wî de. Heta ku di wê demê de jî, mirovên ku ji ber wan gotinên Zerdeşt ên bi vî rengî ku doza kuştina wî dikirin derdiketin. Yên ku qasta canê wî dikirin derdiketin. Lê tiştekî ew dide sekinandin. Berî hingî, ew avêtina wî ya nava êgir, danîna wî ya ber garana ga û conagayan û birina wî ya li devê şikefta dêlagûrê, di hat bîra wan. Êdî di cihê xwe diman sekinî. Ev rewş, ne hatibûbûna jibîrkirin. Vajî wê, zêdetir, hatibûbûna bihîstin û axiftin. Li ser wan rewşan re jî, pirr aqil hatibûbûna ser ziman. Di nava xalkê de jî, dihat gotin ku "gîyane Ahûra Mazda wî diparast." Ev gotin, hê jî dihatina bilêv kirin. Yekî ku gîyane Ahûra Mazda wî diparast, wê çawa êdî wî bikuştan? Ew, weke pirseka mazin di serê wan de bû.

Lê Zerdeşt, êdî ew dijberîya li dijî xwe ya ku êdî hin bi hin carek din weke dema ciwanîya wî ku bilind dibû didît. Êdî ew li ser wê dihizirî ku çi bike. Di serê xwe de li ser wê li çareyan digerîya. Divîya bû ku wî çareyek ji wê re bidîta. Di wê demê de jî, hinekî mirovên ku bawerîya xwe bi Zerdeşt û yazdanê Zerdeşt û hizrên Zerdeşt hanîbûn afirîbûn. Ku Zirer were Zerdeşt, wê zirer biheta wan jî. Zerdeşt, ev jî didît û hizir dikir. Êdî bo vê yekê, pirr diket nava hizir û haznan de.

Zerdeşt, di wê demê de bi vê rengê ketibû nava hizirkirinê û hazinkirinê. Wî, ne dixwest ku ti tiştek ji ti kesekî were. Bi vê yekê jî, ew dihizirî. Lê wî hizir dikir û pirr baş jî fahm dikir ku ew li wir bimêne, wê an tiştek were serê wî û an jî were serê hin mirovên ku bawerîya xwe bi wî hanîna ên oldar were. Zerdeşt, dema ku ev jî lê dihizirî, êdî di serê xwe de weke ku hinekî nexweş û bêrewş dibû.

Ji piçûkatîya wî ve, oldaran bela xwe ji wî nevekirina. Hertimî hatina bi ser wî de. Di zaroktîya wî de, çûna bi ser wî de. Piştre jî hatina bi ser wî de. Lê wî, tevî wanqas hatinên bi ser wî de jî, karîya ku bi ser ve were

û xwe wusa bigihêne. Zerdeşt, weke ku hêzek û qûdretek ji yazdanê mazin girtibû. Weke ku yazdanê mazin, hêza wî ya mazin ew diparast.

Di wê demê de, Zerdeşt, piştî care pêşî ku çûbû bû çîyayê Sabalanê û piştre ku li wir gelek salana mabû û piştre, êdî hatibû wir, êdî piştre jî çûbû bû bû çîyayê Sabalanê. Li wir, mabû. Li wir, wî, dengê yazdanê xwe dikir. Ji wî şîret û şêwir dihilda. Piştre jî, wî ew şîret û şêwirên wî dihanîn ser ziman. Destûr û zagonên ku wî kifşkirina wî, ew hanîna ser ziman.

Zerdeşt, di asta xwe ya têgihiştinî û hişî û zanînî de, weke ku bi tenê bû. Kêm mirovên ku wî fahm di dikirin hebûn. Mirovên ku hinekî ew fahm kiribûn û bawerîya xwe pê hanîbûn jî, weke ku bi tememî ew fahm ne dikirin. Zerdeşt, gotina xwe bi hiş û raman û zanînaka li ser ya hemûyan re dihanî ser ziman. Bi wê re, wî dixwest ku li gorî wî gotina wî were fahm kirin. Lê wî, bixwe jî, didît ku ne têrî û li gorî wî dixwest ku dihat fahm kirin. Bi vê yekê jî, êdî car bi car hêsteka ku wî xwe bi tenê hîskirîya bi wî re rûdaye û çêbûya.

Zerdeşt, rewşa li pêşîya xwe û ya di dema xwe de baş didît û dixwand. Wî rast, baş û pirr sipahî û xweşik fahm dikir. Hizrên wî ên ku wî hanîna ser ziman, wî bi hiş hanîna ser ziman. Wî giranî daye hiş. Wî xwestiya ku wî aliyê ku weke aliyê sêyemin wî dî dît ku fahm dikir ku wê ew êdî pirr serdest bibe, bide fahm bikirin û di nava wê de mirovan bitêgihiştin bike. Ya rastî, divê ku mirov bibêje ku Zerdeşt ast û radayaka aqil û zanînê û hiş bixwe jî bû. Wî, wusa xwe mazin kiribû.

Zerdeşt, demên berî wê dema xwe pirr baş û qanc fahm kirin. Di wan deman de çi hizir û raman bûna û hebûna, çawa pêşketin çêkirin bi çi rengî pêşketin derxistina li berçav, wî ew dîtîya. Di dema Gûtîyan de, û heta ku dihê demên Hûrî û mîtannîyan û hwd, wî ew pirr baş xwandina. Mîtra li ser hîmî bingihî awaya û bi temen e, wî ew dîtîya û fahm kiriya. Li ser wê re, di aslê xwe de Zerdeşt hevgirtinaka bihiştî û zanînî bi hizirkirina xwe re daye çê kirin û ew hanîya ser ziman.

Zerdeşt, dîrok û mejûya xwe ya berê baş û qanc fahm kiriya û xwandîya. Li ser wê pirr jî rawastaha ya. Fahmaka mazin jî j wê girtîya. Li ser wê re hizrên xwe diafirêne di serê xwe de û dihêne ser ziman.

Bi wî rengî, wî sazûmanaka xwe ya teybet a hizrî afirand. Zerdeşt, ew sazûmana xwe ya hizrî bi mirovên li dora xwe re jî parve kir û bi wan da fahm kirin. Bi vê yekê, gûmana wî ji mirovên li dora wî nebû ku wê wî neşopênin. Lê ew ditirsaha ku wê tiştek were serê wî û an wan.

Zerdeşt, li ser vê yekê demeka dirêj dihizirê. Demeka dirêj dihizirê. Piştî ku ew demeka dirêj dihizirê, êdî piştre di serê xwe de kifş dike ew herê çîyayê Sabalanê. Piştî ku wusa di serê xwe de kifş dike, êdî biryare xwe jî dide ku herê wir.

Zerdeşt, piştî ku biryara xwe da, êdî nahêle ku zêde demek dirêj bi ser ve herê, ew dikeve ser rê de diçê ku herê çîyayê Sabalanê. Ku ew ket rê de, hingî, oldarekî ku êdî li aliyê wî ya, ew jî dixwezê ku bi wî re bê. Piştre jî, çendeke din jî wê dibêjin. Zerdeşt, ku hinekî dihizirê, piştre herê dike û bi hevdû re dikevina rê de diçina çîyay Sabalanê. Ku di kevina rê de, di rêya xwe de li gelek deveran jî disekin in bi xalkê re dirûnihin û hizrên xwe dihênin ser ziman. Zerdeşt, bi axiftinê, gelek mirovan bixwe dide bawer kirin. Ew, yekî ku di axiftinê de û bi baş û xweşik axiftinê de jî xwedî hûner û zanîn bû.

----- -----

Zerdeşt, piştî ku ew bi çend bawermendên wî ên ku bi wî re na, ku tê, êdî digihijina çîyayê Sabalanê. Lê Zerdeşt, li wir, zêde namênê. Zerdeşt, çendekê li wir dimêne. Zerdeşt, hizirkiribû ku li wir bimêne. Lê li wir, yazdanê wî deng lê dike û jê re dibêje ku "herê û bikeva nava xalkê de û tişta ku min ji te re hanîya ser ziman vebêje."

Zerdeşt bi dihizirî. Dibêt ku wî kêlîkeka xwe jî bêhizirkirin ne diberda. Di dema ku karekî dike jî, di ber re ew dihizirê. Ew bi mejiyê xwe, hertimî dihizirkirinê de ya.

Piştî ku hatibû Çîyayê Sabalanê, wî xwe li wir êdî dîsa dabûbû hizirkirinê. Bi rêya hişê xwe, xwe digihanda gelek cih û waran. Lê Yazdanê wî, li wir dengî wî dike û jê re dibêje ku herê baxtîya(buhta) li wir, keyekî bizane heya. Ew jî, navê wî Wîstaspa ya. Li wir, çi were serê te jî, tê bihişê ku min kirî serê te, tê dê biserkeve û bike ku ew jî bawerîya xwe bi te bêne. Tu peyamnêrê min î, ku tê gotina bigihêne xalkan û dîyaran. Nûha raba û bikeve rê de û herê!" Ku Zerdeşt, bi vî rengî deng his dike, pêşî hinekî tirs dikeve dilê wî de û di racifê. Lê piştre, yazdanê bi dengê dengî wî dike û dibêjiyê de ku "netirsa û ne rahra û ne racifa. Tu bi gotina min bi hêzî bê."

Zerdeşt, piştî ku yazdanê wî wusa ji wî re got, êdî wî jî dem winda nekir û di cih de ket rê de. Di wê dema ku ew li cihê ew lê rûniştî bû, li wir, wî dengê yazdanê xwe ji nava agir bihîstibû. Piştre Zerdeşt, dema ku axiftina yazdanê wî bi wî re bi dawî bû, weke ku ji nû ve bibe mirovek lê hatibû. Piştre, ew di cih de bi heybetekê hat cem çend bawermendên ku bi wî re bûn, û ji wan re got ku "xwe amede kin, rêwîtîya me bi navê

yazdanê mazin û fermane wî û bi peyame wî heya." Zerdeşt, bi dengekê ku ji kûrahiya xwe û ku hinekî weke ku dilê wî zû diavêt diaxift. Zerdeşt, piştre jî, di cih de wî jî xwe amede kir. Ku wan xwe amede kir, di cih de êdî dem winda nekirin û ketina rê de û bi ber baxtîya de hatin. ..

Di wê demê de, ew heybet û kelcane Zerdeşt ji rû û tevgerîya wî pirr baş dihat dîtin û xwandin. Di destpêkê de, yekî ji bawermendên wî bi dengekî nimz kiribû ku bipirsê. Zerdeşt jî bi wê heybeta yazdanê wî ya ku hê li ser wî bû, dengê wî jî his nekiribû. Piştre êdî deng ji ti kesekî derneketibû. Lê Zerdeşt, di xwe de bi heybet û dilper bû. Mirov ew yek bi wî re di cih de kifş dikir.

Zerdeşt, piştî ku ket rê de jî, weke ku ne li xwe bû. Çend ku li dora mirov hebûn û bi wê re bi gavên weke yên wî dimeşîn jî, weke ku ew ne di farqê de bê bû. Wusa, rewşa wî dihat li berçav. Zerdeşt, di wê demê de, piştî ku ketina rê de û di rê de dimeşîn jî, dihizirî. Di serê xwe de, hişê wî li devereka din bû. Ew dihizirî. Yên ku li dora wî jî ev yek bi wî re kifşkiribûn. Lê wan jî, ti tiştek ne gotibû. Piştre di rê de jî, hewl ne dabûbûn ku bi wî re biaxivin û wê heya wî ji ser wê hizirkirina wî dûr bikin. Ew, di rewş û halê wî de hiştibûn. Lê bi hevdû re, weke ku hêzekê ew bi hevdû re dide meşandin li wan hatibû.

Zerdeşt, piştî ku demeka dirêj dimeşîn û ji destpêka rêwîtîya xwe ku weke qadarekê dimeşîn piştre weke ku were xwe lê tê. Lê di wê demê de jî, êdî ew jî demekê deynnakê û ne axivê. Mirovên din ên bi wî re jî deynedikirin. Deng ji wan dernedike.

Piştî ku demek têve çû, êdî piştre ku weke qadarekê dimeşîn, êdî digihijina bin dareka ku pirr bilind û li bin siha wê dirûnihin û bêhn distênin. Di wê demê de, di dema ku ew li hevdû dirûnihin de, êdî hinekî bi hevdû re diaxivin. Bawermendên Zerdeşt ên bi wî re, hê jî, weke ku di serê xwe de ne safî û zelal bûn ku wê herina kûderê. Piştre jî, Zerdeşt, ji wan re bidest axiftinê kir. Zerdeşt, dema ku bidest axiftinê kir, bi wî dengê xwe yê ku ji kûrahîya wî dihat ji wan re bahse cihê ku wê herinê kir. Heta ku, ji wan re got ku li wir, wê çi were serê wan.  Zerdeşt, lê di dawiyê de ji wan re got ku ewê derkevina rohniyê û wê bigihijina başîyê.

Zerdeşt, dema ku diaxivê, li dûv hevdû dirêj diaxivê û gotinên xwe yên ku ew li dûv hevdû rêz dike bi hevdû re di ahengekê de dihêne ser ziman. Êdî dema ku ew diaxivê, mirov ku lê dihisêne, hema wusa mirov tenê dixweza ku ew bi wî dengê xwe yê xweşik bi axivê û mirov jî lê bihisêne.

Zerdeşt, ji wan re, di wê demê de ji gelek tişt û deveran diaxivê. Her devera ku ew bi gotina xwe re bahs dike û dihêne ser ziman jî, pirr xweşik weke ku ew li wir bê di wê demê de dihêne ser ziman. Mirovên ku lê dihisandin jî, dihizirîn ku ka wî ewqas çawa dizanî. Çi jê dihat pirsîn û çi gotin wî bikira û an jî kû bibihîsta, wê bersivek wî ji wê re wê heba.

Di dema ku ew dirûnihin de, Zerdeşt, ji wan re bahse şînatî, ava ku li ber wan diherikê û dare ku ew li binê wê na jî dike. Wusa ji wan re bahse dike, êdî ew çend ku ew kêlîka ku ew hatina wir, lê bi vegotina Zerdeşt re xwe li wir êdî weke ku li malê bin hîs dikin.

Li wir li binê wê darê demeka dirêj dirûnihin. Hinek nan û tiştên xwarinê ku di tûrikê wan de bû, derdixin dixwûn. Piştre ku hinekî jî bêhna xwe standin êdî piştre rêya xwe didomênin. Di rê de jî, ku dikevina rê de lingê xw sivik dikin û gavên xwe bi lez dikin û di rê de diçin.

.. Zerdeşt, di wê demê de di dema ku ew dimeşî de bi gavên zû diçû. Her gava ku wî diavêt, weke ku bi wê dixwest ku bi wê weke qavzaka mazin bi avêje û bi wê re dixwest ku dûrahîya du gavan bi yekê re qad bike. Bi wê rengî ew hem zû diçû û hem jî qavzên xwe bi gavên xwe re dirêj diavêt.

Zerdeşt, di wê demê de, çend ku diçû û çend ku dem bi dem gotin bi gotin bi hevdû re diaxiftin jî, dîsa ew di xwe de bi hizir bû. Ew bi wê rewşê, ew di rê de diçû. Zerdeşt, li ser gelek tişt û rewşan di hizirî. Navê wî, derketibû, Devereka ku di wê demê de navê Zerdeşt ne bihîstibû nebû. Yakî zane û ku karê wî biaqil û zanînê re bû, ne bi derfet bû ku navê Zerdeşt ne bihîstibû.

Zerdeşt, bi wî rengî li wê dihizirî. Di wê dema ku ew li wê dihizirê, hingî li malê li cihê ku ew lê dijîn, ew dijberîya ku li dijî wî bûya jî, tê berbîra wî. Li wir, gelekan, qastî canê wî jî kiribû. Lê heta wê demê û kêlîkê jî yazdanê wî yê mazin, ew ji hemû hêrîş û qastên ku li canê wî xilas kiribû.

Zerdeşt, Di wê demê de gelek rewş bi hevdû re derketibûbûna ber wî. Zerdeşt, zanînaka mazin bi demê re di serê xwe de dabû rûnandin. Ew xwediyê bersiva her pirsa ku wê jê hatiba pirsîn bû.

Dem di buhurî. Ew jî di rê de bûn. Bawermendên Zerdeşt, dibêt ku bi tememî ne di hişê wê de bûn, weke Zerdeşt ku diçûn kûderê û wê çi were pêşîya wan û serê wan. Zerdeşt, weke ku di hizirî li ser tiştên ku wê werina serê wan. Astengiyên ku dema ku gihiştina wir, wê derkevina pêşîya wan, li ser wan dihizirî. Zerdeşt, bi wê rengê awayekî de dihizirî.

Zerdeşt, dizanî ku wê herina kûderê. Ji ber vê yekê, weke ku bi mejiyê xwe li wê hatibibina girêdan li wan hatibû. Bi wî rengî, ew di rê de dimeşîn. Ewqas rê qad kiribûn. Lê carekê jî yekî jî ji wan, ne pirsî bû ku wê herina kûderê. Hema wusa di rê de meşîn. Zerdeşt, dizanî ku wê herina kûderê. Bawermendên wî jî ên bi wî re xwe li bayê wî berda bûn. Bawerîya wan pirr mazin li Zerdeşt hebû. Ji berr vê yekê, hewce jî pê ne dîtibûn ku bipirsin.

Zerdeşt, bi keseyetîya xwe û sekna xwe ya ku bi wê heyî, bawerîyek dide û dikira dilê mirov de. Ew, mirovekî gir bû. Bi wê girbûna xwe re li berçav bû. Bi wê girbûna xwe re, dema ku dimeşîn jî, ew kifş bû. Ku li dora wî, bi sadan mirov jî heban, wê ew bi başî bi hata kifşkirin ku ew yekî ku bi aqilê xwe ji xwe bi bawer û bi sekna xwe oldarekê mazin bû. Wê ew, yekê, bêî ku biheta pirsîn wê biheta kifşkirin.

Bi wê lezê û çûyinê, Zerdeşt û yên pêre, wê gelek gir, çîya û tilmanan bibuhurênin û li şûn xwe bihêlin. Lez dikirin ku xwe bigihênina li cihê ku wê herinê de. Çiqasî ku lez kiriban, wê ew çendî jî bi awayekî zû wê xwe bigihandan wir. Wan jî, ev yek dizanî.

Zerdeşt, pirr baş dizanî ku wê çûban kûderê. Lê di nava bawermendên Zerdeşt de, yên ku navê Wîstaspa bihîstibûn û hatibû guhê wan jî hebû. Ku herina wir li wê cihê ku ew lê key a, wê caxê, wê wan jî zanîba ku wê çûban kûderê. Ji xwe rêya ku ew têre diçûn, bi wê yekê, yek diduyan dizanîn ku ew bi ber wir ve diçin. Êdî ew jî bi vê yekê, di serê xwe hizirîbûn ku ew diçina bi wir ve. Yanî diçina bi ber qasra key Wîstaspa. ..

---- ----

Zerdeşt û bawermendên wî ên bi wî re na, ku piştî ku ji çîyayê Sabalanê ketina rê de, êdî demeka dirêj di rê de di buhurênin. Lê di dawiyê de, ew digihijina qasra Wistaspa. Dema ku digihijina nêzî wir jî, dilê mirovên ku bi Zerdeşt re li ser hevdû zû bi zû diavêt. Wan li nava çavên Zerdeşt dimeyîzend. Li nava çavên wî dimeyîzendin ku ka ew di çi rewşê de ya. Zerdeşt, di serê xwe de hê bi hizir bû. Ew ji xwe weke ku bi tememî ne li wir bê bû. Di rewşeka wusa de, dema ku wan bawermendên wî lê nerin ew hat berçav.

Lê hinekî jî ji rewşa wan dihat dîtin û fahm kirin û xûyakirin ku ew hinekî wastîyayî jî bûn. Piştî ku ew nêzî navendê dibin, êdî hin bi hin, dilperî bi bawermendên Zerdeşt re zêdetir dibe. Lê Zerdeşt, di rewşeka xweza de dimeşî. Weke ku wî dizanî ku wê çi were pêşîya wî û serê wan. ..

Piştî ku nêzî navend û bi teybetî qasrê dibin, êdî dihên dikevina nave bajêr de. Ku ew hatin û ketina navê de, dîtin ku wa bajarekî mazin û pirr jî mazin bû. Li wir, di ber re ava mazin diharikî.

Zerdeşt, ji aliyê gelekan ve dihat nasîn. Dema ku ew ketibûbûna nava bajêr de, gelek mirov hatibûbûna li dora wan û li dora wan bûbûna kom. Lê hinek mirovên ku wî naskirina jî derketin li wir. Zerdeşt jî, ew nas dikirin. Lê gelek ji wan ên ku wî naskirina, ne ji wan mirovên ku ji wê xweş û dilxweşbûn. Ji yên ku dijberî wî bûna. Ji xwe, piştî wê nasînê, berî ku ew herina qasrê, navê wî û hatina Zerdeşt bixwe jî gihiştibûbû gihê wistaspa.

Dema ku bahse wê li cem key wistaspa hatîya kirin, wîstaspa jî pirr mereq kiriya û xwestîya ku ew herin û wî mirovê ku wilqasî bahse wê dihê kirin werênina ber wî û ew wî bibîne.

Zerdeşt, di wê demê de, hê ew ne hatibûbûna qasrê. Lê li nêzî qasrê li cihekî mabûn û li reheta xwe dinerîn û bêhn distandin. Lê tevî ku ên ku li dijî wî li wir zêdetir derketibûbûna ber wî, lê çendek ji wan mirovên ku ne dijberî wî na jî li wir hebûn û wan ew li wir bi tenê ne hiştibû. Lê di wê demê de, agahî digihijê guhê hemû oldarên wir ku Zerdeşt hatîya wir. Her oldarê ku navê wî bihîstîya û bihîstîya ku ew hatîya wir, êdî xwestîya ku wî bi çavê serê xwe bibîne. Ew mirovê ku wilqasî bahse wî hatîya kirin, xwestina ku wî bibînin.

Zerdeşt, bi gelek awa û rengan navê wî derketîya. Yên ku navê wî bi oldarî û behîtên ku bi navê wî re dihatin ser ziman re ew bihîstin hebûn. Lê ên ku di temenê dijberîyê de jî navê wî bihîstin hebûn. Lê çend ku ên ku navê wî bi dijberî xwestina ku derxin jî, ku bahse serborîya Zerdeşt kirina bahse wan kirinên ku hatina serê wî ku weke behîtna ku hatina bûna jî kirina. Bi wî rengî, ew weke mirovekî ku navê wî bi behîtan jî hatîya bihîstin a. Li wir, di aslê xwe de, hemû mirovên ku navê wî bihîstibûn di temenê dijberîya wî de navê wî bihîstibûn. Lê dema ku bahse serborîya wî hatîya kirin û bahse avêtina wî ya nava êgir hatîya kirin û ku agir wî ne şawitandîya û dema ku ew danîna pêşîya garana ga û conagayan ku gayekê herî mazin ê ji nava wan derketîya û çûya li cem wî sekinîya û ew parastîya û dema ku ew danîna devê şikefta ku dêlagûr har û ku wê dêlagûra har ku ew ne xwarîya jî, di serê mirovan de, wan rewşan ji dêla dijberîyekê mereq bi wî û navê wî re di serê wan de afirandibû. Piştre jî, dema ku ew rastî Zerdeşt tên û hinekî jî li wî dihisênin, êdî dibin bandûra wî û gotina wî de dimênin. Êdî piştre, ew nasîna wî, ji dêla ku dijberîyekê li dijî Zerdeşt biafirêne, xweşbûneka di

dil de ji bo wî bi wan re diafirêne. Êdî ew bi wê dilî nêzî wî dibin. Zerdeşt, bi gotina xwe re, hem gotin xweş û hem jî gotina wî rast bû. Gotina xwe dema ku digot, dihişt ku mirov bi bawer bikin.

Zerdeşt, bi wê yekê, êdî li wir jî, çend ku ew kêlîka ku ew hatîya wir, dike ku gelek mirov bibina aligirên wî. Li wir, êdî gelek oldar û mirovên zane, weke ku bawermendên wî bin di cih de li dora wî xwe digirin. BI wê re, ew di cih de dikeve çav de. Heya herkesekî diçe ser wî.

Zerdeşt, di wê dem û kêlîka ku ew tê wir jî, hê ku ew ne demeke zêde dirêja jî ku ew li wir a, ew dike ku gelek mirov wî nas bikin. Lê her mirovê ku wî bixwe nas dike, wî ne bi dijberîyê nas dike. Wî weke peymannêrekî yazdanê mazin ku gotina yazdanê mazin ji mirovan re dihêne ser ziman nas dikin. Bi wî rengî wî di wê demê de nas dikin.

Zerdeşt, her gotina xwe ya ku ew dibêje, bi navê yazdanê xwe yê mazin dihêne ser ziman û dibêje. Bi wê re jî, ew navê yazdanê xwe bi wan dide nasîn. Ew, bahse wî dike û dibêje ku ew afrînerî hemû tiştî ya. Bi wê yekê û gotinê ew yazdanê de bi wan dide naskirin û herê kirin. Zerdeşt, di wê demê her gotina xwe ya ku dibêje, di rastiyê de hema bêja hemû oldarên wir jî, en beyenî bûn ji wan gotinên wî re. Wî ji Ahûra Mazda û rastîya û Ahrîman û dijberîya wî ya li Ahûra Mazda hanîya ser ziman. Ev jî, nirxna û navna ku pirr mazin dihatina nasîn.

Zerdeşt, di wê demê de, ku li dora wî mirov kom dibin û bi wî re dikevina axiftinê û nîqaşê de, di wê dema axiftinê û nîqaş de çi pirsê ji Zerdeşt dikin, Zerdeşt bi awayekî vekirî û dicih de bersiva wan dide. Her pirsa ku jê hatîya kirin bi awayekî di cih de wî bi bersiv kiriya. Her bersiva ku wî daye jî, yekî jî ji yên li dora wê li dijî wê gotin negotina. Gotin, ji wan re nemaya ku li dijî wê bibêjin. Bi wê yekê, êdî gotina Zerdeşt li ya wan serdest bûya û li ser ya wan hatîya dîtin. Bi wê yekê, Zerdeşt, xwe bêhtirî daye herê kirin. Ewqas mirovên ku weke oldar ku heta wê demê de di derbarê mirovekê ku ne li wir ku gotin li dijî wî gotina, di dema kue w hatîya wi rû bi wî re bidest axiftinê kirina li ber gotina wî, ji wan re gotin nemaya ku li dijî wî bibêjin.

Zerdeşt, li wir, çend ku ew kêlîk bû ku hatibû wir êdî ew weke ku ew demeka dirêj bê ku ew li wir a, êdî hatibû dîtin û nas kirin. Wî jî, li wir xwe xarîb hîs nekiribû û beyenîtî ne kişandibû. Ew jî, weke ku ew demeka ku li wir bû û herkesekî li wir ew nas dikir hem ji xwe bi êmin diaxift û gotina xwe digot û hem jî bi gotina xwe re hemû dijberîyên ku di serî de bi gotinê hatibûbûna afirandin yek bi yek ji holê dirakir. Bi vê

yekê, êdî di wê demê de, ên ku dijberî wî jî bûn, ne xwestibûn ku di nava gerseyê de dijberîya xwe bênina ser ziman û bidina nîşandin.

Zerdeşt û bawermendên wî ên bi wî re ku hatibûbûna wir, êdî demeka zêde ku bi ser ve neçûbû bû, wan bi xalkê wir re hevnasî bi hevdû re dabû çê kirin. Di wê demê de weke demeka dirêj, Zerdeşt, bi xalkê wir ên ku li dora wan lev civîyabûn, bi wan re ketibûbû danûstandinê de. Ji wan re diaxift û bahse yazdanê xwe dikir û bahse rastîya wî dikir. Zerdeşt, bi wê re jî, bahse dunya, azman, stêrk û rêmildar û karê rêmildaran ên ku ji wan bi hate xwestin dike. Bi wê re jî, oldar, kar û xebata wî çî ya û tişta ku dikeve ser milê wî û ku bike çî ya, wê jî dihêne ser ziman. Bi wê re jî, demeka dirêj diaxivê. Zerdeşt, xweşgotin bû. Wî pirr xweşik dizanî ku bi axifta. Dema ku wê gotina xwe digot jî, di zanî ku wê çawa bibêje.

Di wê demê de, li dora Zerdeşt, gelek mirov hebûn. Jin jî hebûn û mêr jî hebûn. Hemû di nava hevdû re li wî dihisandin. Zerdeşt jî ji wan re diaxift. Ji wan re bahse jîyane, hizir û bawerîyê kir. Zerdeşt, di derbarê mejûya berê de, xwediyê zanîn û têgihiştinaka kûr bû. Ji demên berê jî, wê gotina xwe got. Ji wan demên buhurî jî, pirr hanî ser ziman. Ji dema Tûfanê bahs kir. Ji dema Mahabad bahs kir. Ji dema Hoşeng bahs kir. Her dem û mejûya ku ew li ser sekinê jî, ne hindik, lê dirêj û gelekî li ser sekinî.

Di wê demê de, bi qasî ku mirovên ku bi wê xweşgotina wî mestbûbûn û êdî xwe berda bûn û hema wilo dixwestin ku ki wî bihisênin, mirovên ku li dijî wî jî ku dii bin çavên xwe re lê dinerîn jî hebûn. Ew jî, çend oldar bûn. Wan jî, di wê demê de, çend ku di wê demê de sekinî jî bûn, lê ji rewşa wan dihat dîtin û xwendin ku ew ne rehet bûn.

Di wê heyemê de, Zerdeşt jî, ev yek bi wan oldaran re farq kiribû. Her wusa gelek mirovn din jî kifşkiribû. Zerdeşt, lê guh neda wê yekê û di rastîya xwe çû û meşî û gotina xwe hanî ser ziman.

Bi wê rengî, rewş, weke qadarekê xwe didomêne. Zerdeşt, li cihê ku ew lê sekinî ya, mirovên ku bi wî re hatibûn jî, ew jî li rex wî li kêleka wî sekinîbûn. Çend ji wan li tihêla wî ya çapê û çend jî li tihêla wî ya rastê sekinî bûn. Lê li pêşîya wan jî, gelek mirovên ku li wan dihisandin hebûn. Ew jî, gelek bûn.

Di wê heyemê de, piştî ku Zerdeşt, weke demekê diaxivê, piştre ew disekinê. Lê hê jî, awir li ser wî na. Bi giranî jî, awirên oldarên ku li wir bûn li ser wî bûn. Di wê demê de, piştî ku Zerdeşt gotinên xwe bi dawîkirin ên ku wî gotiba û ma sekinî, oldarek di cih de deng kir û bi Zerdeşt re axift. Wî, xwestibû ku li ber Zerdeşt gotina xwe bibêje. De ne,

Zerdeşt di axiftina xwe de gotibû ku "yazdanê mazin yek a". Bi wê gotinê, wî xwestibû ku gotinekê weke pirsekê ji Zerdeşt bike û bersivê jê bigrê. De ne, heta wê demê de jî, bi kevneşopî, çend ku bawerî û ol, yek jî ba, têde bahse gelek yazdanan û navê wan hatîya kirin. Minaq, Haoma, Anhîta û hwd. ..

Oldarê ku axift, weha pirsek ji Zerdeşt kir û got ku "te got yek yazdanê me yê mazin heya. Êêê, wê çaxê tû yazdanê me yên din hemûyan red dike?" Ku wî wusa got, dibêt ku nîyeta wî hebû ku çend gotinên din jî bi ser van herdû gotinên xwe ve bike. Lê Di wê demê de di cih de, çend dengên din jî hatin û weke ku bal kişandina ser xwe. Lê Zerdeşt rewş fahm bikir. Zerdeşt, hingî, bersiva û wusa got, "ez red nakim. ew jî navê û peyamnêrên me na. Wan peyam ji yazdanê mazin girtin û ji me re hanîn ser ziman, Ew jî pîroz in. Lê li ser wan re jî yazdanek heya. Ew jî, yazdanê me hemûyan a." Piştî ku Zerdeşt, ev got, êdî hinekî weke ku bêdengbûn û mirandin bi hevdû re bû. Yên ku deng dikirin û dimirandin, ji wê mirandina wan ti gotin bi zelalî jî ne dihatina fahm kirin. Lê mirov fahm dikir ku bi hevdû re diaxiftin.

Piştre, dîsa heman oldarî, mafê axiftinê girt û weha ji Zerdeşt re got; " .. tu yazdanê me ên din red nakê, lê tu yazdanê me ên din tu ji wan re nabêje ´yazdan´. Tu dibêje ku yek yazdan heya". Ku wî wusa got, Zerdeşt, ev gotin red nekir û herê kir û got wusa ya. Piştre Zerdeşt ev jî bi ser gotina xwe ve kir. "Ew hemûyên ku win navê wan dihildin jî, pîroz in, lê ew peyamnêrên yazdanê mazin in. Di rêya wî de na." Piştî vê gotinê, Dîsa bêdengî û mirandin bi hevdû re bû. Piştre car din oldar, mafê axiftinê girt û weha got, "tu dibêje ku tenê yazdanek heya ku ev gerdûn û jîyan hemû afirandîya. Ew û em yên din, hemû jî bi wî re girêdayî na. Lê Ma tê Ahûra Mazda, Ahrîman û Zerwan bavê wan bike kûderê de?" Ev pirs, weke pirseka xesas û zîz bû. bersiva wê, dikarî, gelek dijberîya di cih de biafirêne û dikarî ji holê jî rabike.

Piştî ku Oldar kir, bêdeng ma û li bendî bersiva Zerdeşt ma. Herkesekê li dorê jî heya wan bi carekê çûbû bû ser Zerdeşt ku ka ewê çi bersivê bide. Mereq dikirin. Zerdeşt, dema ku kar kir bidest axiftinê bike, pêşî awirê xwe li ser hemû girseya li ber wî ku sekinîya gerand. Li wan û derûnîya wan nerî. Dema ku wî nerî, dît û fahm kir ku herkesek bi derînîya xwe ve bi wî ve hatina girêdan. Wî yek di cih de dît û fahm kir. Lê Zerdeşt, ji aqilê xwe û bersivên xwe yên ku dane bi êmin bû. Ew, hingî, piştî ku awirê xwe gerand, bi tevgerîyaka ji xwe biêmin, hingî êdî bi dest axiftinê kir û weha got; "Na, em red nakin, ew jî pîroz in û cihê wan li cem

yazdanê mazin bûya. Lê hêza mazin û ya afirandinê Ahûra mazda ji bavê xwe girtîya û ew xwediyê wê heybetû qûdretê ya. Yên din jî, bi wî ve girêdayî na. Lê ew jî bikarûbar in di vê jîyanê û gerdûnê de."

Zerdeşt, piştî ku ev gotin hanîn ser ziman û piştre çend gotinên din jî bi ser van gotinên xwe ve kir, piştre ma sekinî. Piştî ku ew ma sekinî, herkesek bi heya awirên wan li ser wî bûn. Lê Zerdeşt, di bin wan awiran de ti bertek û nîşanakên ku ji xwe ne biêmin in ne da nîşandin û wusa tevnegerîya.

Di wê demê de, piştî wê bersiva Zerdeşt, oldar, kar kir ku car din biaxivê û tiştekî li ber wê bibêje û biavêje ber Zerdeşt, Lê di wê demê de, ji nava girseyê Dengê jinekê bilind bû. Ew jî, jineka ku nawserî xwe bû û navê wê jî Zara bû. Ew jî, jineka ku gotina wî weke ya oldar bi bandûr bû. Hingî, dema ku jine deng kir, herkesek ma sekinî û hey çûna ser wê û ew bi carek derket li berçav. Wê jî, dema ku pêşîya wê vebû, gavekê du gavan xwe bipêş de dayê de. ..

Jine, hat û li ber Zerdeşt sekinî û çend gotinên ku wî bipiştgir bikin got. Hingî, li ser gotina wê jinê ti gotin nebûn ku werina gotin. Jinê, Dema ku gotina xwe wusa ji aliyê Zerdeşt got, êdî herkesek ma sekinî. Êdî di wê rewşê rastteqîniyek hat dîtin û li ber wê deng derneketin.

De ne, divê ku mirov bibêje ku gotina jinê di nava civatê de û di nava xalkê de ji ya mêr û oldaran ne kêmtira û di cihna de li ser ya wan re jî bûya. Gotina wê, hertimî lê dihê hisandin. Dema ku di nava du mêrên ku dest li hevdû rakirin jî, ku jinek ket nava wan de ku dengê xwe kir û ji wan re got nekin, wê êdî yek ji wan jî ne ji yê din re gotinê bibêje û ne jî wê xwe bi harifêne li wî. Ev yek, weke kevneşopîyekê ya.

Di wê demê de, êdî dengê jinê hatibû bihîstin. Jin, dengê wê biqadr a. Rêz û hûrmeta li jinê mazin a. Yek nikarê xwe li ser wê re bibînin û wê bin xwe re bibîne. Yê ku wusa dît, ew ji mirov jî dibêt ku ne hatiba dîtin. De ne, ev gotin, weke gotinaka xalkê ya. Dema ku mijar bû mijare gotinê, tê gotin ku "ma wê gotina jinê were şikandin!" .. Şikandina wê û gotina wê jî, weke bêrêzîyekê û bêhûrmetîyekê ya. Wusa jî dihat dîtin.

Bi awayekî, Serdestîya wê di nava civate wê de hebû û mazin jî bû. Wê gotina xcwe digot û weke ku carna mazinên civatê digotin "wê gotina xwe ji nîvê rastiyê gotîya." Ev gotin, yekî ku ne bihîsti nebû. Yekê ku carekê jî li civatekê rûniştiba wê bêgûman bihîstiba.

Di wê demê de, wê Zara, di cih de nîqaşa wan ya ku oldar dikir û dixwest ku bide ber Zerdeşt, pêşî lê girt û bixweşî navend hanî. Bi wê re jî, êdî wê gotina xwe kir. Wê gotina xwe got û di dawîya gotina xwe de jî

ev gotin got, "carê, pêşî hevdû fahm bikin û piştre gotina xwe bidomênin li ber hevdû û bi hevdû re. Winê hingî, rast bikin."

Li ber wê gotinê, ti gotin nebûn ku werina ser ziman. Wê, weke ku carna mazinê me yên civatan digot "ji nîvê rastiyê hanî ser ziman."

De ne, dema ku bahse rastiyê hat kirin hingî, mijar dihê dikeve majare hizrî de. Gotina rastiyê, weke gotinaka ku mirov li ser dimeşê bi ber pêşarojê de ya. Dema ku mirov ew baş fahmkir, mirov wê êdî bi başî û çêtir karibê pêşaroja xwe jî bibînin fahm bike û biafirêne jî. Afirandin hemû jî, weke ku di wê dema ku Zerdeşt axift got "afirandin, rêya wê di fahmkirinê de ya." Dema ku mirov fahm kir, mirov wê karibê hingî çêtir jî gotina xwe bibêje. Her gotin, ku rast û di cih de hat gotin, afirandinaka jî.

Lê di wê demê de, çend ku êdî bi nîqaşê dane berhevdû ne dibû jî, lê dîsa oldar weke ku di bin awirê xwe de li Zerdeşt dinerî. Weke ku di xwe de hinekî nexweş bû ji Zerdeşt. Zerdeşt, heya wî li ser dora wî bû. Bi vê yekê, ne bi derdet bû ku wî ew jî kifşnekiribê. Lê Zerdeşt, ew jina wusa bedew û xweşik û sipahî û ku pova wê vekirî û dirêj ku ji noqa wê dibuhurt û digiha xwerê, mereq dikir ku ew kî bû. Ji rewş û şamale wê dihat dîtin û fahm kirin ku ew jin jineka ji xwe bi bawer û xwanda bû. Gotina wê, bizanebûn bû. Gotina wê, li ser gotina yên li wir re bû. Yên ku li wir jî bûn, hemûyan jî rêz û hûrmeteka bêsînor didayê de. Xiftanekê pirr xweşik ku zendên wê bi şûn ve girêdayî bûn lê bû. Lê wê zendên xwe, ne tenê bi şûn ve girêdabûbûn. Her wusa wê zendên xwe li dahma gûzeka destê xwe dabûbûn girêdan.

Li cem wê jina bi xiftan, jineka din ya bi fîstan jî hebû. Ew jî, hinekî hê ciwan bû. De ne, ku weke kevneşopîyekê ya, ku jinên nawserî xwe xiftan li xwe dikin. Jinên nû zewicî û hinekî bi ser zewîcîna wan re çûya, kiras li xwe dikin. Jinên ku hê ne zewîcîna û ciwan in û di wê dema xwe ya ku bizewîcin de na jî, fîstan li xwe dikin.

Ji ber vê yekê, êdî mirov dema ku hevdû didîtin, êdî rewşa hevdû bi başî didîtin û fahm dikirin. Hevdû nas dikirin. Ev jî, bi kevneşopî bûn. Yekî ku kevneşopî dizanî, wê di cih de mirov binasîyan. Lê divê ku mirov li dûv vê jî bibêje ku yekî ku kevneşopîya xwe nizabû jî nebû. Yekî ku nizabû û ankû heya wî ji hin kevneşopîyna nebû, weke yekî nezan, şevakorî û hwd dihat dîtin û zanîn.

Di wê demê de, heya Zerdeşt, pirr Zêde çû ser wê jinê. Jineka pirr xweşik û sipahî jî bû. Pova wê, pirr dirêj û reş bû. Pova wê, ji noqa wê di buhurî û li xwerê disekinî. Bi wê axiftin, sekn û nerîna xwe bale Zerdeşt,

wê jinê kişandibû ser xwe. Zerdeşt, hinekî pirr mereq kiribû ku ew jinik kî ya. Ew jinik, piştî ku axift, êdî piştre axiftina wan ya di nava wan de ku bi gotin bi gotin domîya bû jî, lê ne weke berê ku gotin bi gotin bidina berhevdû. Wê jinikê, ew yeka fahm kiribû, û dêî ji ber wê yekê wê dengkiribû û ew dabûbûn sekinandin.

Wê demê û rojê, Zerdeşt û rêhevalên wî ên ku bi wî re na, li wê cihê ku mayîna wê kiriban şev û maban. Wusa jî, wan jî hizir kiribû. Lê Zêde dem bi ser ve neçû û piştre di cih de, çend mirovan da devê dêrî û ketina hundur de. Dema ku ew ketina hundur de, Dîtin ku wa şêwîrmendekî key Wîstaspa ê ku bi hişkayî û gotina xwe ya mazin re dihat danîn dîtin. Ku ew hat dîtin, weke ku deng bi carekê bên birrîn bû. Deng ji ti kesekî derneket.

Ku ew ketina hundur de, rastû rast, wan berê xwe da bi ber Zerdeşt ve û bi ber wî ve çûn. Hingî, Zerdeşt, li dora wî gelek mirov hebûn. Ku hatina ber Zerdeşt, êdî jê xwestin ku bi wan re were qasrê ku key Wîstaspa wî xwestîya ku wî bibîne. Ew hê nû hatibûn. Ma gelo, çawa wilqasî zû heya key jê çêbû ku ew di cih de mirovan bişêne pay Zerdeşt. Ev yek û ev rewş bi serê xwe, weke rewşeka ku mirovan bi şaşî matmayî pêşwazîkiribû bû.

Ev rewş bû, sedema nîqaşna ku key, wê hatîya wir, ji ber vê zanîya. Bi vê yekê, êdî hizirkirin bûn. Zerdeşt, dema ku ew hatina ber wî, bi dilekî xweş wan pêşwazî kir û di cih de, bi wan re ket ser rê de bi wan çûn ku hatina çem key Wîstaspa. Key Wîstaspa çawa û ji kûderê, wilqasî zû agahî hilda ku Zerdeşt hatibû wir? Herkesekê, di wê demê de, êdî ev pirs dikir. Bi wê yekê re jî, mirovên ku mereqa wan zêde bû, dixwestin ku bidina dûv wan û herina qasrê. Lê Di wê demê de, wan deng nekiribû. Lê ew oldarê ku bi wî re nîqaş kir û gelek oldarên din jî, bi wan re ketibûbûna Ser rê de û çûn ku herina qasrê.

Zerdeşt, di hizirî. Lê dema ku mirov li rûdêna wî dinerî jî, mirov didît ku weke ku ew di xwe de pirr rehet a. Ya ku mirov bi wî re kifş dikir ew bû. Ew, weke ku di xwe de jî, ne bi tenê bû. Wî, xwe bi tenê hîs nedikir.

Şêwirmendê key Wîstaspa, tê gotin ku navê wê Xwûnasht bû. Ew jî, weke şêwirmendekî pirr bi aqil û jîr jî dihat nasîn. Navê wî derketibû. Lê navê ti kesekî weke yê Wîstaspa derneketibû. Ew yekî, mazin bû. Serokê welatekî bû. Welatê gelek dîyaran bûn. ..

Piştî ku ew ketina ser rê de ku hatin, êdî ew rêhevalên Zerdeşt jî dabûbûn dûv wan û bi wan re ketina rê de. Yekî di nava wan de bû û pirr jî kal bû. Lê ji ciwanekî zêdetir li ser xwe û jîr û bitevger bû. Ew, di cihê

xwe de ne disekinî. Wilqasî, bizû û tevger bû. Lê wilqasî j zanebûnaka wî ya mazin hebû. Wî pirr xwandibû. Wî gelek salên xwe di nava xwandinê de buhurandibûn. Em dikarin bêjin ku wî temenê xwe di nava xwandinê û bi wê ve bi mijulkirinê re buhurandibû. Lê xêveka wî ya pirr xort jî hebû. Dema ku wî tiştek dibihîst û ankû his dikir, di cih de dikarî jiberkê di serê xwe de. Bi wê yekê jî, hinekî navê wî jî di nava mirovên ku wî nas dikirin de derketibû. ..

Zerdeşt, di rê de dimeşî. Lê dema ku mirov li rûdêna wî dinerî, mirov ew pirr rehet didît. Dil rehet û ji xwe bi êmin dihat dîtin. Yên ku ew didîtin û lê diner in jî, ev yekî bi wî re dîtin û kifş dikirin bi wî re. Zerdeşt, di wê demê de, di nava çend mirovên ku bi şêwirmendê key re ku hatibûbûna pay wî û ku w bibina qasrê û ber key de bû. Zerdeşt, lê hertimî di serê xwe de bi hizir bû. Ji aliyekî ve dema ku mirov bi wê hizirkirina wî lê dinerî, mirov digot ku qay ew di wê demê de di serê xwe de ne li wir. Lê ji aliyê din ve jî, dema ku mirov lê dinerî, mirov didît ku ew çend ji xwe bi êmin a. Di rewş û meşîna wî de jî, vê yekê xwe bi wî re dide li der û dîyar kirin.

Piştî ku weke qadarekê meşîn di rê de, êdî hatin û gihiştina berqasrê. Dema ku hatina berqasrê, Zerdeşt, serê xswe rakir û li qasrê ner. Qasr, çendî bilind û çendî xweşik hatibûbû çê kirin. Hêt û anîşkên hêtan weke ku ava zêr bi wan re hatibê rijandin zêr di pariqandin. Ew yek, ji berçavên Zerdeşt ne rewşî. Zerdeşt, dema ku di nava mirov de hat û gihişt ber qasrê, êdî bi çavekî lêkolînêr li hêt û awayê qasrê û çêkirina wê nerî.

De ne, di nava xalkê de dihê gotin ku "key, mirov ji qasre wî nerî, mirov wê wî nas bike. Lê dema ku mirov li gotina wî jî nerî, mirov wî keyîtîya wî bibînê." Dema ku mirov li gotina wî û li rengê gotin hanîna ser ziman ya wî nerî, mirov wê zanibê û fahm bike ku ew çendî keyekî bidadîya û ankû bêdadîya. Ev jî, weke bawerîyeka ji nava xalkê bû. Bi vê yekê, di nava xalkê de, ku em bahse çend rewşan bikin, her rewş gotinaka ku bi wê re bûya dager heya. Yek ji wan gotinên di derbarê key de jî mirov vê yekê dikarê bibêje.

Piştî ku hatina ber qasrê, Zerdeşt pir baş li qasrê û awayîya wê nerî. awadandîya wê ya pirr xweşik ku bi wê hatibû çêkirin hebû. Pirr jî bilind bû. Li ber nêzî çem mazin hatibû çê kirin. Dema ku mirov diçû aliyê herikîna avê, ew hînikayîya avê di cih de li rûyê mirov dixist.

Ku gihiştina ber qasrê û ketina hundurê hawşa wê de, êdî dîtin ku wa gelek mirov wê diçin û tên. Yanî sûxratiyê dikin. Gelek mirov diçûn û

dihatin. Piştî ku ew ketina hawşê de, êdî Zerdeşt di nava çend mirovan de ku ew pirr xweşik dihat kifşkirin ku weke yekê ji xwe bawer û mazina, di bin awirên ku diçûn dihatin de buhurîna hundurê qasrê. Ku ketina hundur de, di hûndûr de jî, weke qadarekê meşîn. Rêwane ku têre di nava mezelan de dimeşîn dirêj bû ji wan re. Piştre ku weke qadarekê meşîn, êdî hatina ber taxtê key û ku ew lê rûniştîya.

Ku Zerdeşt di nava çend mirovan de ket hundur de, di cih de hatin û li ber key li ser lingan sekin in. Lê di wê dema ku çawa ku ketina hundur de, key jî di cih de awirên xwe birina ser wî. Ku ew hatina ber key, êdî key wusa hema demekê li Zerdeşt û bejnaûbale wî nerî. Zerdeşt, dirêj bû û yên ku li rûdêna wî dinerîn weke ku li rûdêna keyekî binerin, ew wusa ji xwe bi bawer û ser bilind didîtin.

Piştre, ku weke bêhnekê key bi bêdengî li Zerdeşt meyîzend, êdî gotina ku ji devê wî derket ev bû ku "ew mirovê ku wilqasî bahse wî hat kirin tu yî." Key Wîstaspa, ev gotin got û ma sekinî. Lê hê jî, pirr zêde heya wî li ser Zerdeşt bû.

Zerdeşt, dema ku key wusa li ber wî û ji ber wî got, êdî wî jî got "herê, ew mirov ez im. Ez vê jî ji te re bibêjim ku yazdanê min ji min re gotîya ku ez werima vir li qasra te. Wî, ev daye kifşkirin." Dema ku ev gotin ji devê Zerdeşt derket, êdî Key Wîstaspa jî, weke ku bi heybû li wî. Vê gotina Zerdeşt, pirr bale key Wîstaspa kişand ser wî. Lê di wê demê de key Wîstaspa ti gotin ne got. Wusa tenê, li nave çavên Zerdeşt nerî û xwest ku wî hinekî din bi awirên xwe bi parzinêne.

Di wê demê de, ne tenê key û Zerdeşt li wir bûn. Her wusa li cem wan gelek şêwirmend, aqilmend û hwd jî hebûn. Ew jî, mirovna zane û ji aqilê xwe bi bawer bûn. Wan jî, heya xwe pirr baş dide Zerdeşt, De ne, gotinên Zerdeşt hatina guhê wan jî, û wan jî mereq dikirin ku ew mirovê ku wan gotinan dibêje kîya bibînin. Nûha jî, ew mirovê ku ew gotinên wus abi aqil digot, li ber wan li ber çavên wan bû.

Zerdeşt, di wê demê de, ku di nava gelek aqilmend û şêwirmendan de li ber key sekinî bû. Lê Zerdeşt, di wê demê de, wusa weke yekî asayî ku ew di xwe de ne di rewşeka awarta de ya bû. Wusa jî, li ber wan disekinî. Zerdeşt jî, weke ku çawa ku wan aqilemend û şêwirmendan ew bi awirên xwe di parzinand, wî jî bi heman rengî li wan dinerî û ew û bi awirên xwe yên ji xwe bi bawer di parzinand. Zerdeşt, yekî ku ji xwe û ji aqilê xwe û ji zanebûna xwe bi bawer bû.

Piştî ku bi vî rengî li ser rewşê re demek buhurî, êdî key pêşî bi dest axiftinê kir û wusa ji Zerdeşt re li ber wî got;

"min navê te bihîst, lê min navê te weke yekî ku yazdanên me red dike min bihîst. Bi vê yekê, dîsa min bihîst ku gelek mirov ji te nexweş in. Nûha, li vir jî, gelek mirovên ku bi vî rengî navê te bihîstina hena."

Dema ku key Wistaspa got ku "nûha, li vir jî, gelek mirovên ku bi vî rengê navê te bihîstina hena", li aqilmend û şêwirmendên xwe nerî." Lê di wê demê de, Zerdeşt, xwest ku di cih de bersivekê bide vê gotinê. Bi vê yekê, tevgerîya û xwe ji axiftinê re amede kir. Bi vê yekê, dema ku wî xwe ji axiftinê re amede kir, key Wîstaspa jî, dît û fahmkir ku wî xwe ji axiftinê re amede kir, êdî wî cihê gotinê ji Zerdeşt re hişt ku ka ew ku axift wê çi bibêje.

Zerdeşt, piştî ku axift, hingî di derbarê yazdanan de û yazdanê mazin de hizrên wî çina bi zimanekî xweşik û zelal hanî ser ziman. Key Wîstaspa, wî bixwe jî, heta ku Zerdeşt, axiftina xwe bixwe bi dawî nekir û ne sekinî, wî axiftina Zerdeşt ne birrî û ne hişt ku ti kesekî li ber wî axiftina Zerdeşt bibirrê. Zerdeşt, weke qadarekê ji rastiyê û yazdanê xwe diaxivê û dihêne ser ziman. Her gotina ku Zerdeşt dibêje, hemû aqilemend û şêwirmendên wî jî lê dihisênin. Lê piştî ku Zerdeşt axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî, wusa di hat xuya kirin ku di serê yekî jî ji wan mirovên li wir de pirsek ne afirîbû ku ji wî bikin. Zerdeşt, axiftinaka pirr xweşik bi gotinên zelal û bi hevdû re ku di ahangekê de kiribû. Bi wê yekê, Zerdeşt, axiftina xwe kiribû.

Li wir jî, piştî ku axiftin di nava wan de germ bû û dirîj bû û piştre ku ser axiftinên key Wîstaspa ku Zerdeşt hinekî din jî axiftibû, heman pirsên ku li deverên din ji Zerdeşt hatibûbûna kirin, li wir jî ji wî hatibûbûna kirin. Ji wî hatibû pirsîn ku ma ka yazdanên em red dike û yan jî nakê. Zerdeşt, li wir jî gotibû ku ew red nakê û ew hebûna yazdanê mazin bi tenê li ser hemûyan re dibîne. Bi wê yekê, êdî danûstandin di nava wan de domîya bû.

Zerdeşt, di wê demê de demeke dirêj diaxivê. Ji pirr aliyan ve bahse rastiyê, rastteqîniyê û mejûyê û yazdanên din hatina dike. bahse kirinên wan dike. Piştre bahse dawîya wan dike. Di dawîyê de, Zerdeşt, pirsekê dike, Dibêje ku "ewqas yazdan hatin û çûn, ma ka kîjan ji wan li holê ma û dunya jê re ma!" Dema ku Zerdeşt, vê gotinê dibêje, dilê herkesekê li wir, êdî bi carekê li ser hevdû bidest avêtinê dike. Li ber wê gotinê, mereq dikin ku ka wê key Wistaspa çi gotinê bibêje. Bi vê yekê bi qasî ku awir li Zerdeşt man, wilqasî awir li ser key Wîstaspa bûn. Li bendî wî gotinekê bûn. Key Wîstaspa jî, di serê xwe de di wê destpêkê de dihizirî ku gotinekê bibînê û bibêje.

Key Wîstaspa, ku weke bêhnekê bi xwe re dimêne û dihizirê, êdî piştre vê gotinê ji Zerdeşt re dike;

"nexwe, du dibêje ku yazdanek heya li ser hemû yazdanê me ya. Ew hêz û mafê afirandinê tenê ji wî ya. Ew yek a û bitenê ya. Bêşêrîk û heval a. Lê kê wî afirand?" ..

Bi vê pirsê key Wîstaspa, axiftina kin birrî û piştre li bendî bersivê ji Zerdeşt bû. Zerdeşt, piştre jî, "hemû tişt, ji destpêkekê ya. Ew destpêk, piştre mazin bû û pêşket û qancî û xirabîya xwe afirand. Piştre jîyan pêşxist. Piştre Aşa ku rastîya, ´Eres´ ku rastîya wê rastiyê ya afirî. Piştre jî, gerdûn kemilî û tekûz bû. Dewrûdayîm bi wê re bû. Ger û guharîn bi wê de dayîm bû. Hemû jîyan, ajal û sawal û mirov, bi wê re dijîn. Lê sazûmane wê dawrûdayimîyê heya û ew hertimî, nahêle ku tevlîhevîya ku di wê de heya serdest bibe. .." Zerdeşt, bi vê gotinê bersiv dabûbû. Lê Zerdeşt, gelek gotinên din di dewama van gotinên xwe de gotin û hanîbû ser ziman. Zerdeşt, piştre di dawîya gotina xwe de, weke gotibû, " em mirov ji çi bûna, em ji axê na. Xwûna me ji avê ya. Aqilê me hişê me ya Û gîyane me jî heya. Dema ku em mirov mirin, wê goşt û hastûyên laşê me weke ku çawa ji axê hatina wê herina axê û bidina ax û wê ji wan tiştek din biafirê. Xwûna wê wê herê avê û wê rengê xwe winda bike. ji xwe piştî ku em mirov mir, wê bêhnê nestêne. Wê ew bêhna wî jî ji ber ku hewayê ya wê herê û tevlî hewayê bibe. Wê hertişt di dawiyê de li rastîya xwe vegerihê. Em jî, ku em mirin, wê tenê gîyane me nemirê. Ew jî, yê xwediyê wê yazdanê mazin a. Ew jî, yanî gîyane me, wê herê destê yazdanê mazin. .."

Zerdeşt wusa got û ma sekinî. Lê weke ku lê li bendê axiftinê bû, şêwirmendekî pirr kal li wir hebû û bêî ku li bendê destûra key Wîstaspa bimêne û destûrê jê bixwêzê ji Zerdeşt weha got, "te di axiftina xwe de bahse hiş kir û te got ku ew beşa sêyemin ya mirov a li jîyanê. Lê ka ew piştre wê çi jê were?" Zerdeşt, dema ku wî wusa jê pirsî, weha bersiva wî da; "wê hişê me jî, bi mirina re ji jiyanê rabê û herê. Lê wê ji gîyane me qût nebê. Piştî ku gîyane me çû cem yazdanê mazin, li wir, êdî ku mirov li jîyane xwe bi qancî bî û bi neqancî bê, ku çi kiribê wê ew hiş wê bibîr bixe û bêne berçav. Ku mirov qancî kiribê, wê di bihûşta yazdanê mazin de cih herî mazin ji mirov hingî were vaqatandin û mirov wê bikeviyê de. Hingî, wê ew hiş hertiştê ku mirov buxwezê wê ji mirov re biafirêne. Lê ew jî bi fermane yazdanê mazin a." Zerdeşt ev gotin ji wî re weke bersiv got û ma sekinî.

Key Wîstaspa, di wê demê de, di dema ku Zerdeşt di axift de, tenê hema wusa bal û heya xwe dabûbû ser wî û lê dihisand. Gotinên Zerdeşt, ên ku wî gotina, wî li ser wan tefkîr dikir. Li ser wan dihizirî. Zerdeşt, gotinên pirr mazin ku ti zanyarî jî dibêt ku ne dikarî bigota, li wir bilêvkiribû û hanîbû ser ziman. Key Wîstaspa, ew gelek sal bûn li ser wî taxtî rûniştîya û ewqas şêwirmend, şîretvan û aqilemendên wî hebûn, lê yekî jî heta wê demê gotinna wusa biaqil û mazin ji wî re ne hanîbûn ser ziman. Vî mirovî evqas gotinên wusa mazin ji kûderê hanîbûn? Ev pirs, diket serî de. ..

Key Wîstaspa, weke demekê wusa hema tenê li Zerdeşt û rewşa wî nerîya. Gotinên Zerdeşt, weke ku bandûr li wî kiribûn. Ev yek, ji wê bêdengîya wû û rêdêna wî dihat fahm kirin. Zerdeşt, piştî ku axiftina xwe kiribû, êdî piştre mabûbû sekinî.

Key Wîstaspa jî, di wê demê de hinekî bêdengî pêre çêbû bû. Key Wîstaspa, bi gotina xwe ya re dihat zanîn. Ew weke keyekî ku hişk jî dihat zanîn. Dema ku wê tiştek ku got ku ne hat li cih, dikarî ku serê mirov jî bide lêxistin. Ew yekî ku wusa bû. Bi vê yekê, ew yekî ku jê pirr dihat tirsîn jî bû. Tirsa ji Key Wîstaspa, di dilê herkesekî de hebû. Dema ku yek derdiket ber wî, hinekî weke ku tirs jî pêre çê dibû. Ev jî, hebû.

Di wê demê de, berî ku Zerdeşt were wir ber key Wîstaspa, şêwirmend û oldaran gelek gotinên li ser Zerdeşt li ber wî bi lêvkiribûn.Di wê demê de, piştî ku wî li Zerdeşt hisandibû, êdî wî hem ew gotin di serê xwe de dibirûdihanîn û hem jî gotinên Zerdeşt di serê xwe de dibir dihanî. Gîranîya gotinên Zerdeşt, bêhtirî weke ku wî didît û hîs dikir. BI wê yekê re, êdî ew mabû bû bêdeng.

Lê piştî ku axiftin bi dawî bû, êdî ku wê ji hevdû belav bûban. Oldar, derketina ber key û axiftin û ji key re gotinên xwe yên ku berê hanîbûn ser ziman dûbara kirin. Keyek, weke key Wîstaspa, çendî ku hişk jî ba, wî nikaribû li dijî gotinên oldaran bisekinîya. Ev yek, weke rêz û destûreka mazin ya ku li ser ne dihat nîqaş kirin jî bû.

Piştî ku wan oldaran gotina xwe dubara hanî ser ziman li ber key, êdî di dawiya gotina xwe de, ji key xwestin ku Zerdeşt zindan bike. Sedema wê jî ku navê yazdanên wan weke yazdan red dike ya. Lê di wê demê de, ku ew jî ne li bendê bûn, key Wîstaspa, weha ji wan re got, "Zerdeşt, nûha li ber we got ku ´yazdanên em hemû pîroz in, lê yek li ser hemûyan re ya." Wî red nekiriya. Dema ku key Wîstaspa wusa got, êdî ew jî mana sekinî. Lê Şêwirmendekî pirr kal li wir hebû. wî xwe gihand ber guhê key û weha jê re got, "keyê min, nûha Zerdeşt bigre û nehêle ku ew derkeve û

herê. Bila bizanibin ku te ew girtîya. Lê ku tu wusa nekê, wê oldar hemû li ber te rabin û wê li welêt tevlîhevî bibe." Li ser wê yekê, key Wîstaspa jî, weke wî şêwirmendê xwe kir û Zerdeşt da girtin. Di demê de, key Zerdeşt da girtin û gota mirovên ku ew girtin, ´wî bibin´. Dema ku ew birin, piştre ew şêwirmendê kal, li dûv wan derket û çû. Şêwirmendê kal, ne hişt ku zerdeşt were xistin ki cihê zor de. Piştre wan Zerdeşt bir û kira zindanê de. Lê Key, ji gotinên Zerdeşt pirr bi bandûr bûbû. Ew yek, bi wî re mabû bû. Ji ber vê yekê, bi gotina w kirina Zerdeşt di zindanê de, wî di serê wî de ne rehet dikir.

Dem hinekî têve çû û gihişt roja din. Piştre, key Wîstaspa, Zerdeşt xwest li ber xwe. Di cih de, çend mirov ji wir ketina rê de û çûna û Zerdeşt hanîna ber key Wîstaspa. Di wê demê de oldar jî li wir amede bûn. Şêwirmend û aqilemendên wî jî li wir li ber wî amede bûn.

Zerdeşt, piştî ew hanîna ber key, êdî key xwest ku bi wî re hinekî din biaxivê û li ser wê êdî pirsên ku di serê wî de di wê şevê de çêbû bûn ji wî kirin. Zerdeşt, hemû pirsên key bêgûman bersivandin. Key, çi hat hişê wî ji wî kir. Key, gotinên ku oldaran li ber wê kiribûn jî ji wîr kir. Her gotin û gûmana ku di serê wî de hebû ji wî kir. Zerdeşt, di bersivandina xwe de pirr jîr û zane bû. Di axiftina xwe de, pirr xweşik levdianî û digot. Di dema ku wî gotina xwe de digot, ne dihişt ku ti gotinên wî bibine sedema pirsan di serê wan de. Zerdeşt, ne dihişt ku pirs di serê key û ne jî di serê oldaran de afirin.

Di aslê wê de, hemû pirs û gûmanên ku di serê oldaran de bûn ku wan ew ji key Wîstaspa re hanibûbûn ser ziman û key Wîstaspa jî ew di wê demê de bi pirsî ji Zerdeşt dikirin. Yanê, bi vê yekê, weke ku Zerdeşt, her bersivandina wî, dibû bersivandinek ji wan oldaran û gûman û pirsên di serê wan de jî.

Zerdeşt, di derbarê wî de, gelek gotinên ne baş û ên li dijî wî hatibûbûna gotin. Ew gotin jî, hatibûbûna gûhê, key Wîstaspa û şêwirmendên wî. Bi teybetî jî ew, şêwirmendê kal, di derbarê Zerdeşt, pirr bihîstibû. Heta ku ew rewşa ku di piçûkatîya Zerdeşt ku ew hatibû avêtin li nava agir û agir ew ne şawitandiya û ku ew hatîbû danîn li pêşîya garana ga û conagayan ku ew ji aliyê gayekî ve ji garanê hatiya parastin ku ew hatîya danîn li devê şikefta dêlagûra har û ku wê dêlagûra har ku ew ne xwarîya û parastîya jî bihîstibû. Wî ew jî, li cem oldar û şêwirmendan ji key re hanibû ser ziman.

Êdî bi vê yekê, hizrek di serê key de hatibû afirandin ku ew ji aliyê yazdanê wî ve dihat parastin. Bi vê yekê jî, êdî dihat gotin ku ew yekî ku

yazdanê wî pîrozî lê kirîya. Piştre jî, di hat gotin ku ew çi jê bikin, wê nikaribin ku zirerê bidinê de. Heta ku, ên ku li ber key Wîstaspa, gotina ku "dema ku zirer bigihijê wî, wê yazdanê wî jî me jî biceza bike û zirerê bide me." Bi vê yekê, êdî di cih de dimana sekinî. Lê hinek oldaran jî, ew gotinên berê ku oldarên berê bi lêv dikirin bi lev kirin û gotin ku "ew baxte ku wî diparezê, bo ku tişta ku were serê me pêk were." Li ser vê yekê, gelek oldaran, dîsa gotina ku divê ku ew were kuştin. Lê Key wîstaspa, di serê xwe de weke ku ketîya gûmanekê de. Ew, ne biêmina ku wê karibê ku biryara kûştina w bide. Lê gotina oldaran jî gotin bû û ti kesek ne dikarî li dijî wê rabê û li dijî wê gotinê bibêje.

Key wîstaspa jî, çend ku bihişkayîya wî, navê wî derketîya jî, wî jî ne dikarî ku li dijî gotina oldaran rabûba. Lê ew keyekê bi serê xwe bû û gotina wî mazin bû û giran bû. Oldar li cem wî bûn. ..

Piştî ku li cem key bahse Zerdeşt û wan demên wî yên berê û gotinên derbarê wî de carek din hatibû kirin êdî yên ku gotibûn ku "em carek din wî biavêjin êgir" jî derketibûn. Lê Key Wîstaspa, ew yek herê nekiribû. ..

Zerdeşt, di wê bawerîyê de bû ku "her zîndîya ku li jîyanê dijî, mafê xwe yê jîyanê ji yazdanê mazin girtîya û êdî tenê heta ew bixwe bimirê û gîyane wî herê cem yazdanê mazin, divê ku bijî". "Yê ku wê mafê jîyanê ji destê bikê, wê xwe bikê cihê yazdanê mazin de." Bo vê yekê, êdî digot ku "mafê ti kesekî nîna ku mafê jîyane zîndîyekê ji destê bigirê."

Zerdeşt, di bawerîya xwe de mafê her zîndîyî diparast û pîroz didît. Bo vê yekê, ew li dijê bû ku yekê mafê yekî û ankû zîndîyekê ê jîyanê ji dest bigrê. Bo vê yekê, ew di wê demê de li dijî boraqkirinê jî derketibû.

Zerdeşt, hizra xwe hemû li ber Key Wîstaspa hanîbû ser ziman. Key Wîstaspa, hizra wî, fahm kiribû. Li ser wê dihizirî. Gotinên Zerdeşt, pirr xweş û xweşik bûn. Mirov, ji cihê mirov di zipland û difirand in.

Di wê demê de, li wir jî, mirovên ku qasta canê Zerdeşt kiribûn hebûn. Yên ku ji key Wîstaspa xwestibûn ku di cih de wî bikujê hebûn. Oldaran, ji key Wîstaspa serê Zerdeşt xwestibûn. Lê key Wîstaspa, hê serê Zerdeşt nedabû bû wan. Heçîyê ku Key Wîstaspa ku nas dikir, digot ku wê serê Zerdeşt bide lêxistin. Ji ber ku wan key Nas dikir. Lê heta wê demê ji aliyê key Wîstaspa jî nedayîna fermane lêxistina Serê Zerdeşt, wan di heyîmayînî û matmayînê de dihişt. Herkesek jî li ser wê dihizirî û di nava xalkê de li ser wê jî piştapist çêdibûn. Ew piştapist dihatina guhê Şêwirmendên key Wîstaspa bixwe jî.

Key Wîstaspa, weke mirovekî ku biaqil bû. Lê ew pirr bizor jî bû. Bi wan herdû aliyên xwe jî dihat zanîn. Yên ku ew nas dikirin, êdî digotin

ku wê Zerdeşt, di cih de serê wî bi fermane key Wîstaspa wê were lêxistin. ..

---- -------

Zerdeşt, di wê demê de, piştî ku ew hatibû wir, êdî rojeva xalkê û civatên wan jî bûbû bû ew. Li ser wî dihizirîn û hizrên xwe dihanîn ser ziman. Zerdeşt, gelek hizrên ku di derbarê wî de û ên bi navê wî jî hatibûbûn gotin hebûn. Ew jî, di nava wan civatan de dihatina axiftin û bahse wan di hat kirin.

Di nava civatên xalkê de, pirr bahse key Wîstaspa jî dihat kirin. Dihat gotin ku wê di dawîyê de wê serê Zerdeşt bide lê xistin. Li gorî wan, ha vê kêlîkê û ha kêlîka piştre, wê agahîya lêxistina serê Zerdeşt wê bihata guhê wan. Li ser wê yekê, bi vî rengî hizir dimeşandin.

Lê ji bilî wê, di nava xalkê de hizrên Zerdeşt jî, pirr dihatina axiftin û bahse wan dihat kirin. Hizrên Zerdeşt, pirr li ser wan axiftin dibûn. Zerdeşt, biqasî ku hizrên dijberî wî, wilqasî jî hizrên wî yên ku ji guh hatina guh hebûn û ew jî bahse wan jî dihat kirin. Bi vê yekê, di dema ku bahse Zerdeşt dihat kirin, li ser herdû aliyan jî dihat axiftin. Di wê demê de, dema ku bahse hizrên Zerdeşt dihat kirin, bi teybetî pîr û kalên ku di nava civate de weke çînaka serdest hebûn û bandûra wan ji yek keyekî ne kêmtir bû li ser mirovan, wan jî hizrên xwe li ser Zerdeşt û hizrên wî dihanîn ser ziman. Di nava wan de jî. hizrên ku ji bo Zerdeşt başbûn jî dihatina ser ziman. Yanî, ên ku bi aqilê xwe re ji bo wî diaxiftin û hizrên xwe dihanîn ser ziman jî hebûn. Hizrên Zerdeşt, dema ku li ser wan diaxiftin, digotin ku " di nava hizrên wî de, tiştên rast jî hena." Bi vê gotinê dest pê dikirin piştre ew tiştên rast çibûn di nava hizrên wî de, êdî ew dihanîn ser ziman. Bahse wan dikirin. Bi vê yekê, êdî hizirna baş ku ti kesekî biaqil û vaca xwe ku ne dikarî red bike dihanîn ser ziman bi navê Zerdeşt.

Di nava xalkê de oldar û pîr û kal, di nava civatan de ên ku herî zêde diaxiftin û hizrên xwe dihanîn ser ziman bûn. Wan hizrên xwe pirr zêde dihanîn ser ziman. Bi hizrên wan re, êdî rewşeka teybet bi axiftinê diafirî. De ne, dema ku bi tememî pîr û kalan di civatên xwe de red kiriba, wê êdî ew di jîyanê de ji aliyê xalkê ve jî bihate red kirin. Ev yek, bi vî rengî, weke rewşeka teybet bû. Di wê demê de, li qasrê ragirtina Zerdeşt jî, weke rewşeka teybet diafirand. Di rastiyê de, pirraniya xalkê, li bendê bûn ku ha vê kêlîkê ha kêlîka piştre ku agahîya lêxistina were wan.

Zerdeşt, piştî ku hatibû wir, zêde dem biser ve neçûbû bû. Lê çawa k hatibû, wî gelek mirov li dora xwe dabûbûn li hevdû. Di wê dema kin de

jî, di dema ku li dora wê gelek mirov li hevdû civîyabûn, wî gelek hizrên xwe ji dev ji wan re hanîbûn ser ziman. Yanî, wan hizrên wî ji devê wî bihîstibûn. Hizrên ku wan bihistibûbûn jî, ji wan re pirr xweş û xweşik hatibûn û wan ew piştre jî di axiftinê xwe de red ne dikirin. Ji xwe re digotin ku "di van hizrên ku me hiskirin de tiştekî ku mirov li dijî derkeve û red bike tûna ya." Bi vê gotinê, hizrên xwe dihanîn ser ziman. Ev gotin, di aslê wê de, wateyeka wê ya giring ji aliyê derûnîya mirov ve hebû. Yanî bi vac û derûnîya xwe re ew herê dikirin.

Mirov, di wê demê de ne dikarî bibêjê ku ev mirov aligêr Zerdeşt a û evê din li dijî Zerdeşt a. Lê di mejiyê her mirovî de ku jin jî ba û mêr jî ba, aliyekî ku Zerdeşt bi hizrîn wî re mafdar didît afirîbû û aliyekî din ê ku di gûmanê de hê mabû hebû. Bi vê yekê, mirov di xwe bixwe de weke ku bûbû bû duqat. Mirov, weke ku di mejiyê xwe de bûbû duqat.

Di dema ku mirov li hevdû civîyan di civatên xwe de, wan ji van herdû aliyên xwe diaxiftin û hizrên xwe dihanîn ser ziman. Bi wan hizrên xwe yên ku ji hevdû re dihanîn ser ziman jî, Zerdeşt û hizrên wî yên ku ji wî bihîstina red ne dikirin. Lê bi tememî ne serdest bûn û bi vê yekê re, êdî hinekî bi wê aliyê nezanîyê re gûmanek diafirî di serê wan de. Ew aliyê ku hê bi tememî ne dizanî jî, dixwest ku fêr bibe. Ew xwest ji dil û mejî bi wan re diafirî. Bo vê yekê, di nava hevdû diaxiftin û didan û standin. Bi wê re dikirin û dixwestin ku bi tememî ji wan aliyên mejiyê wan ê bi gûman ve jî bersivan xwe bixwe bibînin û bi wê êdî bibîna xwediyê nêzîkatiyê. Hinekî jî, civatê, ew cihên ev nîqaş û danûstandin lê dibûn bû.

Mirov, piştî ku hişê wî pêşket, bi keseyetîya wî re êdî aliyên wî ên nû pêşket û mirov êdî li ser wan re bidest hizirkirinê kir. Aliyek ji wan ê ku mirov divê ku bi gotina derûnîyê re bêne ser ziman a. Aliyê dûyemin jî, aliyê mirov bi civaknasiyê û civatnasiyê re bêne ser ziman a.  Lê divê ku mirov pêşî keseyetîyê bi hiş bêne ser ziman û fahm bike. Ev jî, navê wê dibe "xwenaskirin a". Zerdeşt, di axiftina xwe ya ku di wê dema destpêkê ku hatibû wir û ew li dora wî bûbûn kom de, ev hanîbû ser ziman. Wî bahse ´xwenaskirinê´ kiribû. Xwenaskirin, bi fahmkirinê û hiş re rêheval a. Pirsên weke "em kîna", "ji kûderê tên û wê herina bi kûder ve", "jîyan çî ya", "em divê ku çawa bijîn", "hiş ji ber çî ya", "em çawa dikarin bihiş bin", û hwd, çend ji wan pirsên ku Zerdeşt di nava axiftina xwe de ku hanîya ser ziman û di serê wan de mana na. Li ser wê jî, êdî hizir hatina meşandin.

Her mirovê ku hişê wî pêşket, wê her pirsên weke van bin û hineka din bin ku di serê wî de pêşket, wê bersivna ji wan re bixwezê. Pirs pirsîn, destpêka têgihiştin û fahm kirinê ya. Pirsa ´kîna em", pirsa Zerdeşt a. wî pirsîya. Li ser wê re jî, wî kiriya ku xwe bigihêne bersivê û bersivê bide. Pirs û bersivdayîn, her wusa, wî bi hevdû re weke rêbazaka gihiştina rastiyê bi karhanîya. Her pirsa ku mirov gihişt bersiva wê ya rast, ew serkevtinaka mirov a keseyetî jî ya. Ew derûnîya ku mirov gihişt bersiva pirsekê ku bi wê re dijî, hertimî temenê pêşketina mejîyê mirov jî ya.

Dema ku mirov ji xwe pirs pirsî, mirov bersiva wê jî, weke ku hîs bike ya. Ew jî hîskirin, piştre ku mirov bihişkirinê re kir kirdeya gotinekê, wê temenê û ankû heyîna wê bersivê jî bi xwe re êdî biafirêne. Ev jî, di serî de, destpêkeka bi hiş a. Hiş, hertimî, ya ku mirov ketîya farqê de ya. ..

Di wê demê de Zerdeşt, kiribû ku herkesek di serê xwe de pirs bipirsê. Di civvatên wan de, li ser Zerdeşt nîqaş pirr hebûn. Zerdeşt, wê çi hatiba serê wê, biqasî, hizrên wî, di nava civatan de dihat nîqaş kirin.

Lê ev jî hebû, Key Wîstaspa, çendî ku xwediyê zorekê û hişkbûnekê jî bû, ew, hertişta ku wî kir, divîyabû ku ji wê re sedemek bidîta. Bi vê yekê, dema ku hat pirsîn ku ji ber çi ew kir, hing divîyabû ku bersiva wê bihat dayîn. Ev yek, di wê demê de jî, weke aliyekî ku mirov li berçav digrt bû. Dihat gotin ku "kirinaka belesebep, ne kirina yên aqilan a."

Zerdeşt, di wê demê de, li qasrê li cem Key Wîstaspa, weke demekê mabû. Êdî mirov dikarê bêje ku Zerdeşt jî ew nas kiribû û wî jî Zerdeşt nas kiribû. Yazdanê Zerdeşt, jê gotibû, "devera ku tê herîyê de, ne bi zora tê çê, tê bi aqilê xwe herê." Zerdeşt jî bi aqilê xwe hatibû wir. Nûha jî, li wir bû û bi aqilê xwe li wir bû. Lê Ew bi ya ku Yazdanê wî kiribû serê wî û dabû pêşîya wî ku bike li wir bû.

Zerdeşt, di wê demê de jî, ku mirov bi rastî bibêje ku weke ku di nava xalkê de jî digot ku "li ber mirinê bû, haxta agahîya mirina wî bihata." LI qasrê jî, yên ku bo ku key Wîstaspa ku Zerdeşt bikujê tevgerîya û di nava hewldanê de bûn ên weke oldar jî hebûn. Ji ber ku wan bawer dikir ku Zerdeşt ji olê derketîya. Bi vê yekê jî, wan Hizrên Zerdeşt bo xwe û ola xwe telûka didît in. Di gotin ku "wê Zerdeşt ola me ji holê ra bike." ..

Yên ku ev gotin digotin jî oldar bûn. Lê Zerdeşt, dema ku bi wî re dihat axiftin jî, wî di temenekê rastiyekê de rastîya wan jî didanî li berçav ku ew jî bibînin. Zerdeşt, bi aqilê xwe ne li dema xwe dijî. Ew gelekî û gelekî li pêşaroja xwe dijî.

Hêvî û bendewariyên ku di nava xalkê de bi kuştina Zerdeşt re afirîn, bêhtirî êdî mirov dikirina nava libendbûnê de. Yekî weke Zerdeşt, herkesekê digot ku wê bihata serî lêdan. Lê ew, hê ti agahiyên bi vî rengî bi navê wî re ne hatibûn. De vê kêlîkê, de kêlîke piştre, de kêlîka din û hwd, ...

Lê di nava xalkê de, gelek pîr û kalan, ên ku diaxiftin û hizrên xwe digotin, bi aqil meşandina xwe re rast ne didîtin ku Zerdeşt were serîlêdan. Wan, ev yek rast ne dîdît. Pîr û kal, rêber, rêzan û serokên civatê ên xweza ku ew bi rê ve dibirin bûn. Gotina wan, bi kevneşopî, bi rêz û hûrmet bû. Ne dihat nîqaş kirin. Li ser wê û li dijî wê gotin ne dihat gotin. Tenê dihat li cih hanîn. Dema ku pîr û kalan rast ne didît ku ti tişte bibe, wê çaxê, bûyîna wê wê çawa bûba? Ya ku wan pîr û kalan rast ne didît, di civatê de jî rast ne dihat dîtin. Li dijî wê derketin dibû. Bawerîya li pîr û kalan, bawrîya li aqil û hişmendiya wan, pirr mazin bû. Dema ku bahse kalekê dihat kirin û dihat gotin ku "wî ev tişt gotîya?", êdî ku yekî din pirsî ba ku "ka ma ka wî ji kûderê ew hanîya?, Wê bihata bersivandin ku "helbet, tiştekî ku ew dizanê heya ku heta vê gotinê dibêjê."

Di vê demê de, tevî ku Zerdeşt li Qasrê bû û herkesek li bendî agahîya ku serê wî hatîya lêdan jî bû, li derve bi wî re û bi navê wî re û bi hizrên wî yên ku di aqilan de hebûna û hatina bihîstin, di nava gotina pîr û kalan wî cih girtîya û li ser wî dihê axiftin. Ev, bi serê xwe tiştekî giring bû. Ku ew û hizrên wî bûna mijare axiftina pîr û kalên civatê, êdî bêgûman, ew bi serê xwe êdî bi navê wê civatê bê û ankû bi gotina wan pîrên wê civatê bê, ew bûya mejû ji wê civatê re.

Zerdeşt, bixwe êdî ew hişek bû bo civatê û di nava axiftinên civatê de. Ma gelo wan oldarên civatê ev yek ne didîtin.?

Di wê demê de, li qasra Key Wîstaspa, êdî weke ku rewşeka nû afirîbû bi Zerdeşt re. Piştî ku Zerdeşt hatibû wir, êdî her mijare ku dihat axiftin bûbû Zerdeşt. ´Zerdeşt ev got´, ´zerdeşt li cem key Wîstaspa ya´, ´zerdeşt, ev hizir gotibû´, ´zerdeşt, bo yazdanê xwe ev hanî ser ziman´, ´zerdeşt gotiya ê ku mafê jîyane daye her zîndîyî yazdanê mazin a û tenê ew dikarê ji wan hilde´, ´zerdeşt gotîya mafê jîyanê pîroz a´, ´zerdeşt gotiya mirov pîroz a´, ´ zerdeşt gotîya mirov pîroz a nayê boraq kirin´, ´zerdeşt gotîya sawala ku şîr û hirîyê dide nayê boraq kirin´, ´ zerdeşt gotîya tişta ku wa ji xwe re rast dît ji yê li hemberê xwe re jî rast bibînin´, ´ zerdeşt gotîya ya ku ti ji xwe re nexwezê ji ti kesê din re jî nexweza´, û hwd, hê weke van bi sadana gotinên din, li dûv hevdû bi navê wî re ji devan di civatan de tê axiftin. Gotin bi gotin dihatina ser ziman û şîrove

kirin. Her gotinak ji wan gotinan, weke destûrekê dihat nîqaş kirin. Di nava wan gotinan de "mirov", "jîyan", "mafê jîyanê", û hwd, bi hevdû re dihatina nîqaş kirin. Li ser wan jî yên ku aqilê xwe dihanîn ser ziman aqilmendên civatê pîr û kal bûn. Oldar jî hebûn. Şêwirmendên key jî hebûn. ..

---- -----

Piştî ku Zerdeşt ji aliyê Şêwirmendê key Wîstaspa û çend sûwarîyên wî ve hatibû li qasrê, êdî ew li qasrê mabû. Key Wîstaspa, destûr nedabû bû wî ku ew ji qasrê herê. Lê oldaran jî dixwest ku ew bi saxî ji qasrê dernekeve. Bi vî rengî, di wê demê de li ser Zerdeşt re, weke ku çûnûhatinak hebû. Zerdeşt, bixwe êmin di rewşekê de di nava wê rewşê de dijî. Ew bi armancaka ku yazdanê wî dabûbû pêşîya wî hatibû wir.

Lê di wê heyemê de, oldaran û hinek şêwirmendên ku bi oldaran re bûna yek jî, dixwestin ku serê Zerdeşt were lêxistin. Lê key Wîstaspa, heta wê kêlîkê hê ti fermanên wî ên bi vî rengî nebûn. Key Wîstaspa, her gotina ku ji devê oldaran bihîstibû û a ku di wê demê de dihat ser ziman, ji Zerdeşt dipirsî. Dixwest ku bi wê fêr bibê ku ka Zerdeşt çi dihizirê. Zerdeşt jî hizra xwe ya ji wî re dihanî ser ziman, dema ku wî jê dipirsî.

Mirovekê çawa dikarê wilqasî gihandibê hemû bersivan. Çi pirs û sûale ku key Wîstaspa ji Zerdeşt kirîya, Zerdeşt bersiva wê daye. Ya ku hinekî jî, ji bo pirsînê key Wîstaspa bi mereq kiriya û dike ku her car ji wî bipirsê ev a. Lê vê rewşê jî, oldar û şêwirmendên li qasrê bixwe jî hayîmayî û matmayî jî jî hiştîya. Ji dema ku ji Zerdeşt tê pirsîn, tenê carekê jî wî bêbersiv ne hiştîya. Her pirsa ku lê hatîya kirin, wî bersivandîya. Şêwirmendan jî û oldaran di xwestin ku Zerdeşt carekê jî bê, dema ku key Wîstaspa jê pirsî, bi taqinê û bersivê nedê. Nizanibê ku bersiva wê çi ya. Êdî wê karîba ku herina bi ser wî de û ji wir ve wî bikina zorê de. Li bendî tiştekî wusa bûn. Lê heta wê kêlîkê jî, ew bi wê hêvîya xwe ne digihiştina miredê xwe. ..

Key Wîstaspa, piştî ku çend pirs ji Zerdeşt pirsî û wî jî bersivand, êdî xwe ne girt û jê pirsa weha kir, "ev bersiv hemû yazdanê mazin kirina dane te?" Zerdeşt, weke bersiva vê pirsê, got ku "bersiva hemû pirsan li cem wî ya. Wî hiş afirand. Em bi hişê xwe dibersivênin. Ew jî, yê wî ya û bi sayaserê wî ya. Lê her bersiv jî ji wî ya, weke hemû tiştî". Bi vê gotinê weke ku key Wîstaspa, bersiva xwe hilda bû.

Zerdeşt, bi salan hizirîbû. Wî, xwe gihandibû her bersivê. Her bersiva ku wî xwe gihandiyê de, di serê wî de hişekî din jî bi xwe re diafirand.

Dem jî hin bi hin du buhurî. Oldarên ku li dijî Zerdeşt bûn, ew jî li rex key Wîstaspa bûn. Ji wî dixwestin ku Zerdeşt serê wî lê bixe. Lê Key Wîstaspa, ew ne kiribû. Key wîstaspa, dihizirî di serê xwe de. Heta wê kêlîkê, wî çi pirs ji wî kiriya, Zerdeşt bersiva hemûyan di cih de daye. Zerdest, bi vê yekê û rengê, hem bal kişandiya ser xwe û hem jî ya ku key Wîstaspa lê disekinî jî ew bû.

Oldarên li dijî Zerdeşt, êdî dixwestin ku serê Zerdeşt were lêxistin. Di dawiyê de, êdî oldarekê xwe nêzî key Wîstaspa kir û weha jê re got," keyê min, wî hemû nivîsarên me ên pîroz xwandina û bersivên wî hemû ji wan in. Hêka wusa rast a, deka tiştekî di jîyanê de bi rastî bide pêşîya wî ku wî bi behîtî hanî li cih, hingî em jî emê bêjin ku ew rast a." Li ser vê gotinê Key Wîstaspa hizirî, ev gotin, weke ku di serê wî de rûnişt. Hinekî li ser vê key Wîstaspa bide hizirkirinê kir. Ku weke ku oldar ji wî re gotîya şartekî ku zor bê bide pêşîya Zerdeşt. ..

.. Zerdeşt, ew demek bû ku li cem Wîstaspa û li qasra wî bû. Li wir, gelek axiftinên wî bi key Wîstaspa re bûbûn. Axiftinên wî ên ku wî bi key Wîstaspa re dikirin, li xoşa key Wîstaspa diçûn. Key Wîstaspa dixwest ku wî baştir fahm bike.

Key Wîstaspa, piştî ku gelek pirs ji Zerdeşt kirin û ji wî pirsî bû, piştre di dawîyê de, di serî wê de mereqa jîyane piştî vê jîyanê ketibû serê wî de. Êdî li ser vê bidest pirsîna ji Zerdeşt kiribû. Zerdeşt jî bersiva wî dide. Zerdeşt, dema ku Key Wîstaspa jê bidest pirsa dike, pirsa pêşî ya di vî warî de li ser jîyane piştî vê jîyanê ji Zerdeşt kiribû. Zerdeşt gotibû ku "piştî ku mirov mir, ku kirinên mirov bi qancî bin, wê gîyane mirov herê azmana." Ev bersiv, bal û heya key Wîstaspa dikişêne û êdî li ser wê bidest pirsînê dike.

Lê di wê demê de, rewşeka ku ne kurê Awrwataspa(Arjasp) key Wîstaspa û ne jî Zerdeşt di farqê de bû, bi wan re xwe didomand. Care pêşî û kêlîke pêşî, dema ku şêwirmend û çend mirovan Zerdeşt hanîbû qasrê, jina key Wîstaspa Atoşa ew dîtibû. Ew jî, jinaka ku xwenda û pirr biaqil bû. Wê, berî hingî, ji herkesekê zêdetir jî di derbarê Zerdeşt re bihîstibû. Wê, tişta ku bihîstibû ji bîr nekiribû û di serê xwe de hiştibû. Piştre jî, dema ku key Wîstaspa Zerdeşt hildabû hemberê xwe û ji wî pirs pirsî bû, êdî wê jî ew şopandibû. Her pirsên ku ji Zerdeşt hatibûbûna pirsîn û her bersiva ku Zereşt dabû bû jî, di serê wê de xwe girtibû û mayînda bû bû.

Di wê dema ku key Wîstaspa di derbarê jîyane piştî vê jîyanê de ku ji Zerdeşt pirsî û Zerdeşt bersiv dan, wê jî hinekî ji wan wirde li wan

dihisand. Bersivên Zerdeşt, bandûraka mazin li ser banû Atoşa jina key Wîstaspa çê dikir.

Wê rojê jî, Zerdeşt bi rêhevalên xwe re li qasrê bû. Piştî ku key Wîstaspa Zerdeşt ji cem xwe da derxistin û yên ku ew derxistin ku kirin ku wî bibina zindanê, rêya wan ya çûna bi ber zindanê de banû Atoşa rêya wan dibirrê. Piştre ji yên ku Zerdeşt dibin, dixwezê ku wî bibina mezela nêzî ya wê û ku derîyê wê li bistaneka mazin ku dayimî ew têde dima bi gelek jinan re dibû bicih bikin. Wan jî, wusa kir û Zerdeşt li wir bicih kirin. banû Atoşa jineka ku pova wê reş û dirêj û rûdêna wê fireh û geş bû. Bi xweşikatî û sipahîtîyê, pirr zêde hebû. Zerdeşt, dema ku wê dibînê, fahm dike ku ew banû ya. Bo vê yekê, di cih de, rêza xwe ji wê re dide nîşandin. De ne, rêza li jinê, ne dihat li ser axiftin û nîqaşkirin jî, Tenê dihat kirin.

Piştî ku Zerdeşt di wê mezela ku wê gotibû de hatibû bicih kirin, êdî ew jî çûbû bû li cem wî û bi wî re ketibû axiftinê de. Ji axiftin û bersivên Zerdeşt ên berê ku wî kiribûn, bandûraka pirr mazin, wusa dihat xûyakirin ku li ser banû Atoşa berda bûn. Banû Atoşa, dema ku bi Zerdeşt re axift û Zerdeşt gotinên xwe gotin, banû Atoşa bersiv û gotinên wî, ne di temenê nîqaşeka bi wî re dihildana mejiyê xwe de. Wê, bi baweriyekê bersivên wî dihildan di serê xwe de.

Wê rojê, heta demeka pirr dereng Zerdeşt diaxivê û banû Atoşa lê dihisêne. Piştre jî, Banû Atoşa, bawerîya xwe bi Zerdeşt têne û banû Atoşa weke yeka ji wan mirovên ku pêşî bawerîya xwe bi Zerdeşt hanîya dibe. Piştre jî, roja din ku tê, Key Wîstaspa Zerdeşt dixwezê hemberê xwe. Wê rojê jî, oldaran kiribû serê xwe de ku êdî bi key bikin ku ew serê Zerdeşt bide lêxistin. Lê di wê demê de, berî ku Zerdeşt bibina ber key Wîstaspa, banû Atoşa tê cem wî bi wî re axiftinaka dirêj dike bi wî re. Banû Atoşa dibêje Zerdeşt ku "Ezê ji key Wîstaspa bixwezim ku tê di cih de berdê û êzê jê re bibêjim ku tu yê tenê ku xwediyê hizra rastteqinîyê yî". Lê Zerdeşt, vê yekê herê nakê. Zerdeşt, hingî, weha dibêje banû Atoşa, "bila key Wîstaspa, weke te bixwe ya rast û rêya rast kifş bike." Piştî vê gotinê re banû atoşa jî dimêne sekinî. Lê hey û mereqa wê jî li ser Zerdeşt bû. Wê jî, dizanî ku pirranîya Oldaran jî li dijî Zerdeşt bûn.

Di wê demê de, berî ku Zerdeşt were birin ber key Wîstaspa, hingî, oldarek li qasrê, wê kifş bike ku naqabîna banû Atoşa û Zerdeşt pirr xweş a. Bi wê yekê, wê heya xwe bide ser wan û wê rastiyê bide kifş bike. Wê fêr bibe ku banû Atoşa bawerîya xwe bi Zerdeşt û bawerîya wî hanîya.

Piştre bi qadarekê re ku çend mirov hatin û Zerdeşt kirina nava xwe de û birina ber key Wîstaspa, hingî dilê banû Atoşa jî li ser hevdû diavêt. Piştî ku hatina wir, di wê demê de ne bi gelekî re piştî hanîna Zerdeşt a li wir, banû Atoşa jî li wir amede bû. Di wê demê de ew oldar jî, heya wî pirr li ser banû atoşa bû. Wî oldarî, hemû hal û tevgerên banû Atoşa jî, weke yê Zerdeşt dişopand. Piştî ku Zerdeşt hat hanîn li wir, êdî piştre key Wîstaspa bi wî re bidest axiftinê kir û hin pirsên din ên ku di serê wî de afirîbûn ji wî kir.

Key Wîstaspa, hemû pirsên xwe dike. Di wê demê de jina key wîstaspa jî, heya wê li ser hem key Wîstaspa ya û hem jî li ser Zerdeşt a. Lê heya oldar jî, li ser jina key Wîstaspa ya.

Dem dibuhurê. Oldar jî, dixwezin ku key Wîstaspa, fermane Zerdeşt bide. Lê di wê demê de, key Wîstaspa, bi pirs pirsînên xwe re weke ku ketîya nava hizirna de jî di serê xwe de. Di serê xwe de ew, ka çi dihizirê, ew hizrên ku ew ew dihizirê, nahêlin ku key Wîstaspa, di wê demê de fermanekê li gorî xwestina oldaran bide. Lê Bandûra oldaran, ya mazin ew jî, di wê astê de ya ku key Wîstaspa bixwe jî ku nikaribê li dijî wê bisekinê ya.

Dem ku hinekî buhurî, êdî di wê demê de biawayekî vekirî oldaran, fermane serê Zerdeşt xwest ji key Wîstaspa. Di wê demê de, key Wîstaspa, ferman neda lê tenê ew şanda zindanê dîsa. Lê wê carê, rewş hinekî cuda bû. Oldarê ku rewşa di nava banûya key û Zerdeşt dizanî, xwe nêzî key kir û rewş ji key re hanî ser ziman. Di wê demê de, êdî key wîstaspa, bi carekê heya wî çû ser jina wî. Lê wî tişte negot. Lê di wê demê de jî, pirr bi heya bû. Lê tevî wê jî, wî ti tişte negot. ..

Piştre Zerdeşt ji aliyê key ve hat şandin ku wî bişênina zindanê. Lê di wê demê de, dema ku Zerdeşt birin, di cih de banû jî ji wir derket û ne hişt ku Zerdeşt bibina zindanê. Wê xwest ku wî bibina wê mezela wî. Wan jî, dîsa wusa kir. Di wê demê de, rewş, ji bo Zerdeşt nexweş bû. Êdî rewş hatibû wê astê ku herkesekî bawer dikir ku wê serê Zerdeşt di cih de roja din were lêxistin.

Wê rojê ku şev bû dereng û piştre hinekî din jî buhurt, Zerdeşt jî ku hê şîyar bû, wî didît ku çûn û hatin dibin. Wê rojê ku roj ket ardê û hinekî rohnî bû. ..

Roja din, Zerdeşt dîsa weke rojên hat birin li ber key wîstaspa, di wê demê de key Wîstaspa, pirr xamgînî disekinî. Zerdeşt ew yek û rewş bi wî re kifş kir. Lê Zerdeşt, ti tişt negot. Piştre ku Zerdeşt û key bi hevdû re axiftin, êdî piştre rewş hat ser ziman û key Wîstaspa hanî ser ziman ku

haspê wî yên boz ku wî pirr jî hijê dikir, ba lêxistîya û ketîya ardê de. Êdî wê nerabê. Berî ku Zerdeşt bihata hanîn li ber key Wîstaspa, di nava oldaran û key wîstaspa de axiftin bûya û wê alîkarî ji wan xwestîya ku haspê wî baş bikin. Ew jî, êdî bo wê yekê dikevina nava tevgerê de. Êdî bi hasp ve diçin û tên.

Lê di wê rojê de, key Wîstaspa, bi Zerdeşt re zêde neaxivê û wî piştî ku hinekî axiftin êdî dişêne zindanê. Lê di wê demê de, dema ku Zerdeşt dibin, banû li cem Key Wîstaspa dimêne. Piştî ku ew çûn êdî piştre banû tê ber key Wîstaspa û jê dixwezê ku Zerdeşt afû bike. Lê Key Wîstaspa, nêzî wê yekê nabê. Piştre banû Atoşa, tiştekî ji key re dibêje weke pirs. Ew jî, weha ya, "çi bibe û çi heta ku were kirin, tê bi wê Zerdeşt afû bike?" Ev pirs, weke pirseka ku key Wîstaspa weke ku ne li bendê bû. Key Wîstaspa, nizanê ku wê çi bersivê bidiyê de. Dimêne sekinî. Lê hê ku key Wîstaspa bersiv nedayî, banû Atoşa gotina xwe ya din dibêje, "ku Zerdeşt bide nîşandin ku ew li ser rêya rastteqîniyê ya û ew yê rast e, ma tê wî afû bike?". Ev gotina ku di dawîya wê banû Atoşa kira weke pirs, key Wîstaspa wê carê jî li ber wê gotina wê bêdeng ma." Piştre key Wîstaspa, bi pirsekê bersiv da û weha got ku "ka ma ka çawa ..? Wê çawa bide nîşandin?" Ev pirsên key Wîstaspa, ku ew ji banûya xwe dike, wê banûya wî, weha bersivê bidiyê de. "Meyîzêne, ku ka wê oldar karibin haspa baş bikin û yan jî na. Ku nekirin, başkirina wan ji Zerdeşt bixweza. Ku wî kir, wê afû bike û wî weke rastîya mazin ya li ser wan re jî herê bike." ..

Key Wîstaspa, ev yek red nekir. Piştre jî, weke gotina jina xwe kir. Piştre ku çend roj bi ser ve çûn, wî dît ku wa oldaran hasp baş nekirin. Piştre wî, Zerdeşt hilda hemberê xwe ji wî xweşt ku ew haspa baş bike. Piştre jî, Zerdeşt "got bila" û ket hewldanê de ku haspa baş bike. Zerdeşt, hasp di hundurê demeka kin de kir ku ew rabina ser xwe. Wê rewşê key wîstaspa jî û hemû oldarên li cem wî jî hayîmayî hişt.

Wê başkirina haspa, navê Zerdeşt derxist. Piştre Zerdeşt jî, weke rastîya mazin û yê herî rast hat dîtin û herê kirin. Piştre jî, key Wîstaspa, bi gotina jina xwe û Zerdeşt kir. Ew afû kir. Oldaran jî, gelek ji wan weke key Wîstaspa li cem Zerdeşt girt lê gelek ji wan jî li dijî wî rabûn. Piştre Zerdeşt, ji key Wîstaspa xwest ku were ser bawerîya wî. Key Wîstaspa jî ev yek herê kir. Wî jî, piştre weke jina xwe Zerdeşt û bawerîya wî herê kir. Zerdeşt, ji yazdanê xwe xwest û yazdanê wî jî hêza key Wîstaspa mazin kir û derxist ser ya "Arejat-aspa" jî. Artişa key

Wîstaspa ku Spentodhata ku kurê key Wîstaspa li ser bû mazin û bi hêz kir. ..
Piştî ku Key Wîstaspa bawerîya Zerdeşt herê kirin, êdî piştre Zerdeşt li wir hat bicihkirin û li qasrê jê re ji aliyê key ve cihek hat veqatandin. Lê Zerdeşt ew herê nekir. Zerdeşt, çû nava xalkê. Ji wan re bahse ol û bawerîya xwe kir.

Zerdeşt, di wê demê de êdî piştî ku ew hat herê kirin, êdî wî maf girt ku xwe bêne ser ziman. Ew keynaîya pêşî ya ku Zerdeşt û bawerîya wî herê kiribûn. Lê di wê demê de dijminê Zerdeşt û bawermendên wî jî zêde hebûn. Zerdeşt ew jî dizanî. Lê Zerdeşt, di ya serê xwe de safî û zelal bû. Wî dizanî ku wî çi dikir. Bo vê yekê êdî ew di ya xwe de bi rastî dimeşî.

.. Zerdeşt, piştî başkirina haspê key Wîstaspa, êdî xwe bi wî dabûbû herê kirin. Li wir, êdî, navê Zerdeşt dihat bihîstin. Key Wîstaspa, li qasrê cihek ji Zerdeşt re da çê kirin. Lê Zerdeşt re herê nekir. Wî, xwe li wir bicih nekir. Ew çû nava xalkê. Li nava xalkê, wî bawerîya xwe û hizrên xwe hanîna ser ziman. Zerdeşt, piştî ku bawerîya xwe bi Key Wîstaspa da herê kirin, piştre ew herêm bigiştî jî li pişt key Wîstaspa çû ser bawerîya Zerdeşt.

Ya rastî, ew bû ku divê ku mirov bibêje ku bawerîya wan ya berê û ya piştre jî, jev necuda bû. Lê di şîrovekirin û herêkirina navê yadazenekî tenê de, cudabûn hebû. Lê ew rengê pêşketinê, berî hingî, çend ku bi bawerîya pirr-yazdanan dijî jî hebû. Zerdeşt, hemû tişt û rewş gihand qawlan.

Lê Zerdeşt, piştî ku li wir bawerîya wî hat herêkirin û wî da rûnandin, êdî wî xwe li wir nehişt. Wî xwe gihand gelek deverên din jî. Li herêmê, wî rêwîtîyên din ên dirêj kir. Di dema wî de, gelek key û herêm, rastîya yazdanê Zerdeşt fahm kirin û hatina ser rêya wî. Di rêya wî de meşîn. Lê hê jî, ên ku li dijî wî hebûn. Oldarên ku rastîya Zerdeşt herê nedikirin hebûn. Li her devera ku Zerdeşt têre diçû, xafkek didanîn li pêşîya wî. Lê Zerdeşt, ji hemûyan xilas bûya û buhurîya.

Zerdeşt, li herêmê xwe dide naskirin. Lê Zerdeşt, li herêmê pirr dijberîên wî jî afirîbûn. Hizrên zerdeşt belav bûn. Zerdeşt, wê bi salan û deh salan wê li herêmê bigirê û her der û devera ku ew diçiyê de li wir xwe û bawerîya xwe dide nasîn. Zerdeşt bixwe kurdek bû. Lê bawerîya wî di demeka kin de ji nava wan di buhurê û di nava gelek civatên din de jî bicih dibe. ..
---- ---

Zerdeşt, wê gelek salan bigerihê. Wê jîyane xwe bide fahmkirina xalkê. Wê her devera ku diçiyê de wê mirovan li dora xwe bide li hevdû û di nava wan de rûnihê û hizrên xwe ji wan re bêne ser ziman. Wî, ev yek, weke kevneşopîyekê domand. Her gotinên ku wî digotin jî, piştî ku hatina bihîstin êdî ne dihatina ji bîrkirin.

Di temenê xwe de Zerdeşt piştî ku ji Vaejah derketibû, piştre li gelek deveran gerîya bûya. Wî hizrên xwe re ji pirr mirovan re hanî ser ziman. Hê ku ew li jîyanê bû, heta 77 salîya xwe, wê li pirranîya herêmê karibê ku xwe bide herêkirin. Zerdeşt, di wê demê de şîroveya(zend) xwe ya ku wî pêşxistî, wê bina refaransên pêşketina herêmê ên olî, civatî û kevneşopî ên dema nû. Kevneşopîya oldarîya kevn, wê di nava awayê pêşketinê ku piştî Zerdeşt û hizrên wî re pêş dikeve wê hin bi hin werina şîrove(zend)kirin. BI wê yekê, wê bi wan re û hişmendîya wan re wê hizir û zanîn derkeve li pêş. Hizratî, wê zêdetir derkeve li pêş. Zerdeşt, têgihiştina olî ya dema aqil û zanînê bi ramanî pêşxist.

Zerdeşt, temenê ku wî avêt û pêşxist, wê piştî wî re jî pêş bikeve. Lê hê di dema Zerdeşt de, ên ku li dijî wî na, li dijî wî di nava hewldanê xwe de na. Heta dawîya jîyane Zerdeşt jî, wê ew dijberî li dijî wî bidom in.

Zerdeşt, piştî ku demeka dirêj ku ev dem heta 77 salîya wî ya, bigerandinê derbas dike. Ew, piştre divegerihê welatê xwe warê bav û kalan. Li wir, dema ku tê, ew gelek xizmên xwe dibîne. Lê Dê û bavê wî çûna ber dilovaniya. Li wir jî, gelek mirovên ku piştî wî re, weke bawerîya Zerdeşt dijîn hena. Lê ên ku hê jî, xwe qanix ne kirina bi hizrên wî hena. Lê wusa zêde dijberîyeka mazin nadin nîşandin. Di wê demê de, ji warê Zerdeşt, heta ku digijijê war û qasra key Wîstaspa, xateka ku bawerîya Zerdeşt lê pêşketîya û serwer a pêşketîya. Di wê demê de jî, piştre, ku di nava salan de diçê Atoşa jî, xwe daye bawerîyê û weke oldarekê wî pêşengtî ji xalkê re dikir di nava xalkê de.

Piştî ku Hatibû herêmê, wê Zerdeşt, carek din bi banû Atoşa a ku yek ji wan mirovên pêşî bawerîya xwe bi Zerdeşt û yazdanê wî hanîya wê rastî wê were. Zerdeşt, dema ku wê dibîne, pirr kêfxweş dibe. Banû Atoşa, hê ew jina ciwan û bedew a. Xweşikatîya xweşikatî li xwe kirîya. Pova wê ya dirêj ku ji noqa wê di buhurt, hê weke xwe disekinî. De ne, Zerdeşt, jin pîroz didît. "Dayiktîya wê, weke dayika mirovatîyê" pîrozkirîya.

Zerdeşt, ku hatibû herêmê û wan hevdû dîtibû, wê êdî ji hevdû nevaqatihin. Di wê demê de, gelek mirovên weke oldar ku hertimî xwe dikirina rex Zerdeşt de ku bo ku li wî hisandinê bê û ankû ji wî fêr bigirin

û hwd bê, bi wî re digerîyan. Zerdeşt jî, ew li cem xwe digirtin û rêzeka mazin dide wan. Zerdeşt, hertimî mirov dewetî rêya rastîyê dikir. Herkesekê ku qatek nan ku bi Zerdeşt re dixwar, weke ku ji nû ve bibe lê dihat. Di kevneşopîya Zerdeştîyan de, ew hebû ku yekî ku gezek nan bi hevdû re xwar, nabê ku êdî pişta xwe li wê geza nan ku xwarîya bizîvirêne. Ew, weke xîyanetê jî dihat dîtin. Yê ku ji sofreyekê xwe xwar, divîyabû ku qadrê wê sofreyê bizanibê û rêz û hûrmetîya wî, heta ku ew sax a jê re kêm nebê. Qadre wê geza nan, bi nêzîkatîya mirov û rûmetîya mirov re dikarê were ser ziman.

Zerdeşt, êdî ew pîrekî mazin ê kal bû. Ji wî re ´zerdeştê kal´ hatîya gotin. Gotina ´kal´ piştî pîrîtîya wî re êdî bi paşnavê wî ve hatîya kirin û jê re hatîya bikarhanîn.

Banû Atoşa, ti carî ji wî û ji cem wî êdî qûtnedibû. Lê di wê demê de, êdî bi jin û mêran re gelek mirovên ku li hevdû dibûn kom jî hebûn. Bi wê yekê, hertimî civate Zerdeşt li dar bû. Hertimî jî, civate Zerdeşt bo li wî hisandinê tişî bû. Mirovên pîr û kal, oldar û rêmildar, jin û mêr û hwd, herkesekî li cem wî li civatî wê rûniştîya. Yên ku li gotina wî dihisandin û gezek nan ji ser sofra wî dixwarin, êdî ew bi wî re bûn, xîyanet lê ne dikirin. Li civate Zerdeşt, mirovên ku bi bawerîya wî bûn dirûniştin. ..

Lê di wê demê de, dijberên Zerdeşt jî, ên ji ya xwe ne hatibûbûnas xwerê jî hebûn. Ên ku dixwestin ku were kuştin hebûn. Lê êdî Zerdeşt, gelek aligirên wî hebûn û li civate wî û li dora wî gelek mirov hebûn. Ji afsandîya û Medîya û herêma torê, wê li qadaka mazin aligirên Zerdeşt hebin. Ew êdî hinekî zor bû ku ew biheta kuştin. Ji ber vê yekê, di wê demê de, ew dijberên wî, planakê çê bikin û wê mirovekî weke aligirê wî birêxistin bikin û bişênina nava civate wî. Dema ku ew wî dişênin de jî, Jahraka pirr dijwar didina wî ku firsandekê bibîne û bike nava ava ku ew divexwe û ankû xwarina ku ew dixwe. Ew mirovê ku ew dişênin jî, tê nava civate wan di rengê bawermendekî wî de. Ew mirov xwe weke wan dide nîşandin. Ew mirov bixwe jî navê wî Malkûş bû.

Ew tê û dikeve nava wan de bi rojan weke wan tevdigerihê. Weke wan di rûnihê û dirabê. Bi Zerdeşt û aligirên wî re li ser heman sofreyê dirûnihê û xwarinê dixwê û divexwê. Zerdeşt, heya wî li ser Malkûş a. Zerdeşt, weke ku rewşa wî dizanê û fahm dike. Lê Zerdeşt, ti tiştî nabêje û bi lêv nakê. Dibêt ku Zerdeşt, dizanî ku ew ji ber çi li wir a. Dibêt ku bi vê yekê jî, hizir dikir ku dema ku bi wan re li ser sofraya wan bi wan re xwar û vexwart, wê êdî ew qadrê wê sofrê bizanibê û wê armanca xwe ji bîr bike. De ne, qadrê sofrê pirr zêde heya. Qadrê nanê ku mirov bi hevdû

re xwar, pirr heya. Ji xwe bi kevneşopî dihat gotin û zanîn ku "ê ku qadrê nanê sofraya ku jê xwar ku nizanibê, ew ji xwe ji mirov jî ne dihat dîtin û hasibandin. Rastîtî, qancîtî, wijdan û rastteqînî, bi hevdû re hertimî Zerdeşt xwestîya ku bi tevgerîyan were dayîn nîşandin. Wijdan, ya ku mirov dike mirov a. Aqil, rastîya mirov ya bi fahm a. Qancîtî, kirina mirov ya rast a. ..

Piştî ku demeka ne zêde kin û ne zêde dirêj Malkûş, dihiizirê ku herkesekê êdî ew ji xwe û weke yekî ji nava wan herêkirîya û êdî ji wî ti şik û gûman tûna ya. Ew rojekê, wê jahra ku wî hildayî ku bi wê Zerdeşt jahr bike, dike nava xwarina wê Zerdeşt bixwe de. Ew firsandekê dibîne û dike nav de. Piştre jî, weke ku ti tişten bebûya tevdigerihê. Weke ku heya wî ji tiştekî tûnaya dimêne sekinî. Ev mêrê ´tûrî(weke ku avêsta de gotina ´tûr´ di buhurê, navê herêmekê ya û di rengê "tor" de tê xwandin. Bo vê yekê jî, wê gotina di kurmancî de ya bi navê "torê" dihêne berbîra me. Ev gotina di kurmancî de, ji herêma Hezexê, Mahsertê, Strewrê, Nisêbînê û heta ku herêmên weke Afrîn û qamişloyê, ji mirovên ku li colê ku dijîn û bi kurmancî diaxivin re tê gotin.Ji mirovên ji herêma torê re "torî" tê gotin.) û hatî aqil ji rê birin, bi wê nîyeta xwe ya bi armanca kuştin Zerdeşt, di wê demê de wusa tevdigerihê. ..

Piştre, Zerdeşt, xwarina xwe dixwe. Piştî ku xwarina xwe dixwe jî tişt ji wî nayê. Mirovê jahr xistî nava xwarinê de acêbmayî dimêne. Piştre, ku demeka din jî bi ser ve diçê, dîsa tiştek bi Zerdeşt nayê. Piştre bi demekê, dîsa ên ku wî şandina xwe digihijênina wî vê carê jê re dibêjin ku ew wî bi şûr bikujê. Piştre mirov cardin tê nava wan û weke tevdigerihê. Lê di wê demê de ya ku fahm dike ku bi Malkûş re cudabûnek heya Banû Atoşa bixwe ya. Piştre ew, wê hizra xwe ji Jina pîr Zara re dihêne ser ziman. Lê ew jî, dibêjiyê de ku "dibêt ku te şaş dîtîbê." Êdî ew jî, wusa di cihê xwe de dimêne sekinî. Lê hêstek bi wê re çêbûya û ew pirr jî, di xwe de ne rehet a. Ji ber vê yekê, ew jî, êdî heya ji xwe ser Malkûş nabirrê.

Malkûş firsandekê digerihê ku derbeyekê li Zerdeşt bixe û piştre bi ravê û xwe xilas bike. Hertimî jî, Zerdeşt di nava civatê de bû. Lê demên ku ew diçû nava xwezayê û bi tenê di hînikayîyekê de dirûnişt û ji xwe re dihizirî jî dibû. Di wan deman de, wî têkiliya xwe bi yazdanê xwe re didanî. Malkûş jî, ji ber ku ew demek bû ku di nava wan de mabû, wusa ew rewşê Zerdeşt wî dizanî. Piştre li demeka wusa dihizirê. ..

Demek ku li ser wê demê re jî dibuhurê, piştre Zerdeşt, dike ku herê deverekê bi serê xwe bimêne û bihizirê. Lê ne devereka dûrî mal û qasrê ya. Di demê de, Zerdeşt, hinek deverên beravî û hînik hebûn ku

herkesekê dizanî ku Zerdeşt li wanderan dirûnihê ji xwe re û dihizirê. Lê banû Atoşa jî, heta ku jê tê heya wê dide ser malkûş. Di rojakê de Zerdeşt, diçê deverekê wusa ku ji aliyê herkesekî dihê zanîn û hînik a, bo ku ji xwe re di hînikayîya wê de rûnihê. Lê piştî ku Zerdeşt çû, Malkûş jî di wê demê de li dûv çû. Di wê demê de, banû Atoşa jî li dûv wan çû. Lê dema ku Banû Atoşa çû, çend mirovên din jî li dûv wê çûn. ..

Zerdeşt, dema ku diçê bin dareka ku pirr li cihekî hînik û li ber avêya û ku ji xwe re li wir dirûnihê. Malkûş jî tê cem wî. Zerdeşt ku wî dibîne ku wa ew hat cem wî, êdî dibêjiyê re "ma tu jî hatî .." Ew jî, bi dengekî ku bêhna wî weke ku ser dilê wî ketî û bi dilper dibêje "herê pîrê min!" û hwd. Lê Zerdeşt, weke ku di serê xwe de hertiştî bizanibê bêdeng tevdigerihê. Weke ku di serê xwe de heya wî ji hemû plana di serê Malkûş de hebê lê û li nava çavên wî dinerê. Di wê demê de Malkûş, weke yekî ku Serxweş bûyî tevdigerihê. Wusa, dinerê. Piştre di wê demê de, ew diavêje biber Zerdeşt û ew şifa wî ya di berê de di singa Zerdeşt re diçê. Di wê demê de, yê ku pêşî rewşê dibîne Banû Atoşa ya. Banû Atoşa, hingî bi qîrekê dike ku di cih de hemû mirovên li wê dordorê li wir amede bibin. Di cih de. Malkûş tê girtin. Lê banû Atoşa, nahêle ku ew pêşî li wir were kuştin. Dixwezê ku fêr bibe ku bi kê û aqilê kê hatîya wir. Malkûş, ya di serê xwe de, piştî zorê lê dikin ji wan re dihêne ser ziman. Malkûş, navê keyaniyaka ku li dora herêma torê ya dide. Li wir dibêje ku "ji wir, oldaran ez şandim vir ku vê bikim." Zerdeşt, li wir jîyane xwe ji dest nadê. Lê giranî birîndar dibe.

Di cih de, Zerdeşt tê hilgirîn û ew dihê hanîn li hundurê qasrê. Hekîmên bijîşk, bo ku Zerdeşt derman bikin û baş bikin, tiştek namêne ku ew nakin. Lê çi dikin û nakin, Zerdeşt baş nakin. Zerdeşt, piştre ne bi demeka dirêj re, wê weke Pêxemberekî jîyane xwe ji dest bide û herê berdestê yazdanê mazin. Zerdeşt, pêxemberê mirovatiyê û rastîyê bû. Wî dixwest ku mirov bihiş bike û bike rêya rast de. Wî dixwest ku mirovan ji gîyane Ahrîman xilas bike û bike rêya gîyane Ahûra Mazda a rast û qanc de. ..

--

Abdusamet Yigit

,,,,,,,,,,,,,